



NAVÊN HEJMARAN Û HEJMARSAZÎ



1. MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

Peyva "hejmar"¹ û hevwaterên "reqem"² û "nimre"³ dikare hem maneya nîşanên hejmaran (bo nimûne 1, 2, 10, 123, 40 006, $\frac{1}{2}$, 10 %...) û hem jî wateya navên hejmaran (bo nimûne "yek, du, bîstûheft, sed hezar, çarêk") bide.⁴

Bo jihev cudakirina nîşanên hejmaran – ku zêdetir aidî matematîkê ne û navên hejmaran – ku pirtir têkilî zimannasiyê ne – di zimannasiyê de bi maneya "navên hejmaran" peyva **hejmarnav** yan varyanta wê *jimarnav* di zimannasî û rêzimannivîsîna kurmancî de li kar e. Di zimannasiya navneteweyî de, bo nimûne di inglîzî de, hejmar û hejmarnav bi peyvên "number" (hejmar) û "numeral" (hejmarnav) ji hev tînd cudakirin.

Lê bo xatirê dirêjnekirinê, em ê di vê vekolîna xwe de peyva "hejmar" bi mebesta "hejmarnav, navê/navên hejmaran" bi kar bînin.

Hejmar li ser du beşên mezin tînd parvekin:

¹ Li gor devok û zaravayên din yênd kurmancî herwiha "hijmar, jimare, hûmar, amar, şimare, şumare". Forma "jimare" zêdetir di soranî de, varyantên "hûmar, amar" di zazakî de tînd xebitandin. Formên bi Ş (şumare, şimare) ji farisî hatine wergirtin an di bin tesîra farisî de ji J bûne Ş.

² Herwiha carinan bi formên "raqam, reqam, raqem". Ji erebî hatiye wergirtin.

³ Herwiha "nimare, numre, numera, numero". Ji zimanên ewropî hatine wergirtin.

⁴ Ji bilî van herdu maneyan, peyva "hejmar" herwiha wateya "hejmara rêzimanî" jî dide ku jornavê "yekhejmarî" (bi inglîzî "singular"), "pirhejmarî" (plural), "cohejmarî" (dual) û "kêmhêjmar, hinhejmarî" (paucal) jî dide.

- **hejmarên bingehîn** yan *hejmarnavên bingehîn* (cardinal numbers/numerals): bo nimûne "yek, sed, bîstûpênc..."
- **hejmarên rêzî** yan *hejmarnavên rêzî* (ordinal numbers/numerals): bo nimûne "yekem, sedem, bîstûpêncem..."

Hejmar dikarin herwiha li gor komên mezinahiya xwe jî bên parvekirin:

- **tilhejmar** yan *tiljimar* (bi inglîzî "digits"): navê hejmarên 1 heta 9
- **dehgir** (inglîzî "teens"): navê hejmarên 11 – 19
- **dehhejmar** yan *dehjimar* (inglîzî "decads") navê hejmarên 10, 20, 30 heta 90
- **sedhejmar** yan *sedjimar*: navê hejmarên 100, 200, 300 heta 900
- **hezarhejmar** yan *hezarjimar*: navê hejmarên 1000, 2000, 3000...

Ev parvekirina hejmaran di zimannasiyê de giring e ji ber ku di hin zimanan de bo nimûne hejmarên 11 – 19 navên serbixwe hene lê di hin zimanan de jî ew ji navê peyva "deh" û navê hejmara duyem ya wê rêzehejmarê pêk tên. Bo nimûne, mirov dikare li vê derê hejmara "11" bi tirkî û inglîzî bide:

- tirkî "on bir" ji "on" (deh) û "bir" (yek)
- inglîzî "eleven" ne ji "ten" (deh) û "one" (yek)

Tevî ku inglîzî "eleven" ji "ten" û "one" çênake jî, lê ew jî wek tirkî "21" bi "twenty" (bîst) û "one" (yek) ava dike.

Em ê dû re bibînin ka kurdî sîstemên çawa di avakirina rêzehejmaran de dixebitîne.

2. EV VEKOLÎN Û YÊN BERÎ WÊ

Navên hejmaran hinek ji peyvên herî bingehîn û giring yên zimanî ne. Ji kitêbên pêşîn yên li ser ziman û rêzimana kurdî ve hema-hema di her kitêbên rêzimana giştî ya kurdî de behsa hejmarên kurdî jî tê kirin. Di yekem rêzimannameya naskirî ya kurdî de, ku bi îtalî ji aliyê Maurizio Garzoni ve sala hatiye nivîsîn û yekem car sala 1787 hatiye çapkirin, yekser piştî dengnasiyê hejmarên kurdî tên rêzkirin.⁵

⁵ Bo nasandineke li ser vê kitêbê, binêrin vê hejmara *Kanîzarê*.

Di duyem rêzimana kurdî ya naskirî de, ku ji aliyê Samuel A. Rhea ve bi inglîzî hatiye nivîsîn û sala 1869 hatiye çapkirin⁶, bi heman awayî hejmar li destpêka berhemê tên behskirin.

Di piraniya rêzimannameyên bi kurdî bi xwe de jî bi heman awayî hejmar giring tên hesabandin û tên behskirin. Peyva *hejmarnav* bi şiklê *jmarnav* ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatiye afirandin. C. Bedirxan herwiha behsa cins û çemandina hejmaran jî bi kurtî di kitêba xwe *Bingehên Gramera Kurdmancî* de kiriye.

Di çend nivîsar an beşên hin kitêban de ji aliyê rastnivîsînê ve behsa hejmaran hatiye kirin.⁷

Lê dîsa jî navên kurdî, hejmarsaziya (avakirina navên hejmaran) û bikaranîna hejmarnavan û çemandin û ravekirina wan li gor rêzimana kurdî tê nehatine vekolîn û ew li gel zimanên lêzim û cîran nehatine berhevdan.

Ev vekolîn dê bi destnîşankirina wekhevî û cudahiyên hejmarnavan li gel birrên din yê peyvan (bi taybetî li gel navdêran, lê herwiha bi rengdêr û cînavan re jî) dest pê bike.

Paşî vekolîn dê etîmolojiya hejmarên bingehîn (tilhejmar, dehgir, dehhejmar û hejmarên mezintir yê xwedî navên taybet wek "sed, hezar, milyon, milyar" û herwiha "sifir" jî) diyar bike. Diyarkirina etîmolojiya hejmarnavên kurdî dê bi berhevdana hejmarên kurdî li gor devok û zarên kurdî, zimanên din yê îranî û hindûewropî were pêkanîn.

Mijareke din ya serekî ya vê vekolînê **hejmarsazî** anku çêkirina navên hejmarên mezintir (bo nimûne 14, 72, 104, 231...) ji hejmarên biçûktir (0 – 9) e. Em ê hem behsa hejmarsaziya kurmancî bikin û hem jî wê li gel zar û zimanên lêzim û cîran bidin ber hev.⁸

Dûv re em ê behsa bikaranîna hejmaran, cinsê wan yê rêzimanî, çemandina wan û ravekirina wan bikin. Paşî jî em ê berê xwe bidin bikaranîna hejmarnavan wek birrên din yê peyvan, xaseten wek navdêran lê herwiha wek rengdêr û cînavan jî.

⁶ Binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2016/06/03/rezimeke-kurdi-ji-sala-1869/>

⁷ Bo nimûne binêrin: http://www.amidakurd.net/qunciknivis/rast%C3%AE_%C3%BB_tastniv%C3%AEsa_hejmaran

⁸ Çavkaniya me ya serekî ya hejmarnav û hejmarsaziyê di zimanên hindûewropî de *Gvozdanovic, Jadranka (1991), Indo-European Numerals*, Walter de Gruyter, ISBN 3-11-011322-8 e. Ji bilî zimanên hindûewropî, em ê li cihên pêdivî herwiha behsa hejmar û hejmarsaziya erebî û tirkî jî bikin û wekhevî û cudahiyên wan li gel hejmarsaziya kurdî bidin ber hev.

3. HEJMARNAV – BIRREKE SERBIXWE YA PEYVAN AN JÎ BEŞEK JI NAVDÊRAN?

Gelo hejmarnav anku navên hejmaran ji aliyê rêzimanî ve bi rastî birreke serbixwe yan peyvan e yan jî tenê beşek ji navdêran e?

Wek ku ji peyva "hejmarnav" jî diyar e, ji xwe ew navên hin tiştan in wek çawa ku navdêr jî navên tiştan, kesan, bûyeran û diyardeyan in. Herwiha hejmarnav jî dikarin wek navdêran li gor cins û hejmara rêzimanî biçemin:

- yek → yekê (bidin ber "kitêb → kitêbê")
- deh → dehan (bidin ber "kitêb → kitêban")

Lê dîsa jî hejmarnav bi çend awayên bingehîn ji navdêran cuda ne:

Naveroka navdêran bi awayekî giştî serbixwe ye lê ya hejmaran rêjeyî ye. Gava ku em dibêjin "kitêb" an "sêv" an "muzîk", her kes kê-m-zêde fehm dike ka mesele çî ye, lê eger em bibêjin "2" yan "11" yan "1000301", tenê wisa mirov bêyî kontekstê fehm nake ka çî ye, divê em bibêjin "2 filan tişt", "11 bêvan tişt" û hwd.

Di komikên navdêrî (*noun phrase*) de du yan çend navdêr adeten bi ravekê (izafeyê) bi hev ve tên girêdan û di kurdî de adeten raveber berî ravekerê tê. Raveber ravekê digire û raveker jî paşgira çemandinê. Bo nimûne:

- keç → keç-a Fatma-yê
- welat → welat-ê kurdan

Hejmar jî di komikên navdêrî de raveker in lê ew nakevin dûv lê dikevin berî ravebera xwe⁹ û di halê xwerû yê komika navdêrî de ti ji herduyan naçemin:

- du keç
- bîst welat

⁹ Awarteya serekî ji vê "yek" ya wek paşgira "-ek, -yek" e, bo nimûne: welat-ek, rojname-yek.

Ji aliyê peyvسازیê ve hem navdêr û hem jî hejmarnav dikarin bibin rengdêr lê bi piranî bi paşgirên ji hev cuda:

- hejmarnav bi paşgirên "-em" (bn. "dehem"), "-an" ("dehan"), "-ê" ("dehê")
- navdêr bi hejmareke mezin ya paşgiran, bo nimûne: bi-, bê-, -î, -în, -dar, -mend...¹⁰

Ji aliyê ravekirinê ve li aliyekî hejmarnav dişibin rengdêran ji ber ku herdu di komikên navdêrî de navdêran rave dikin:

- du kitêb
- kitêba kevn

Wek ku tê dîtin, rengdêr di kurdî de adeten dikevin dûv navdêran anku raveber berî ravekerê tê ("kitêba kevn", ne "*kevn kitêb" wek di hin zimanên din de, bo nimûne inglîzî "old book" yan tirkî "eski kitap"). Lê hejmara raveker berî navdêra raveber tê ("du kitêb", ne "*kitêb du" – di vê meseleyê de inglîzî û tirkî jî wek kurdî ne: "two books", "iki kitap").

Hejmarên rêzî jî dikarin wek rengdêran bikevin dûv navdêra raveber:

- kitêba duyem (bb. kitêba kevn)

Lê berevajî rengdêran, ew dikarin berî navdêra raveber jî werin bikaranîn:

- duyem kitêb (lê ne "*kevn kitêb")

Rengdêr jî dikarin carinan bikevin berî navdêra raveber lê hingê ew wek peyveke xweser û bi hev ve tîn hesabandin, ne wek du peyvên yek raveber û yek jî raveker:

- kevnakitêb (wek peyveke bi hev ve, ne "kevine kitêb" wek du peyvan an komikeke peyvan)
- xweşmirov (wek peyveke xweser, ne "xweş mirov" wek du peyvan an komikeke peyvan)

Li aliyekî din, mirov dikare hejmarnavan ji aliyê peyvrêzî û bêravekiya wan ve bide ber cînavan jî. Bo nimûne:

- ew kes – du kes
- çend kitêb – pênc kitêb

Di haletên wiha de cînavên kesî û yê destnîşankirinê jî li gel navdêra raveber diçemin:

¹⁰ Bo peyvسازیê, binêrin kovara *Kanîzar* hejmarên 1 – 4: <https://zimannas.wordpress.com/category/peyvسازی/>

- ew kes → wan kesan
- ev kitêb → vê kitêbê

Lê hejmar di rewşên wiha de bi navdêrê re naçemin:

- du kes → du kesan (ne ”*duyan kesan”)
- bîst kitêb → bîst kitêban (ne ”*bîstan kitêban”)

Di vê reftara xwe de ew dişibin cînavên ne-kesî û yên ne-destnîşankirinê, bo nimûne cînavên nediyar:

- çend kitêb → çend kitêban (ne ”*çendan kitêban”)
- bîst kitêb → bîst kitêban (ne ”*bîstan kitêban”)

Lê wek di hin rewşên peyhevdanê (*juxtaposition*) de hejmarnav jî li berî navdêran dikarin biçemin:

- bi dehan kitêban

Lê ev çemîn ji navdêran li pey wan serbixwe ye û hejmarnav dikare çemandî be heta eger navdêr neçemandî jî be:

- Bi sedan kes hatin wir. (Ne ”*bi sedan kesan hatin wir”)

Ji aliyê çemandinê ve jî hejmarnav ji cînavan cuda ne ji ber ku çemandina hejmaran li gor qeyd û bendên giştî yên navdêran û rêzikî yan rêbazî ye lê çemîna cînavan – bi taybetî cînavên kesî – awarte û istisnayî ye. Bo nimûne:

- yek → yekê (bb. ez → min)
- bîst → bîstan (bb. em → me)
- deh → dehan (bb. ew → wan)

Ji aliyê peyvsaziyê ve hejmarnav pir çalak in û hejmarên nû bi hêsanî ji wan tîn çêkirin û herwiha ew bi hin qeydên giştî dibin hejmarên rêzî yan rengdêr jî lê cînav di peyvsaziyê de qels in û kêr peyvên nû ji wan tîn dariştin an pêkanîn.

4. TILHEJMARÊN KURDÎ: VARYANT Û ETÎMOLOJIYA WAN

Tilhejmar (tiljimar) an bi navê xwe yê din "hejmarên yeke" anku 1 – 9 di kurdî û piraniya zimanên din jî yê hindûewropî de pir kevna in û reh û rîşên wan digihin makezimanê proto-hindûewropî. Ew di piraniya zimanan de peyvên xwerû ne anku ne ji ti peyvên din hatine çêkirin.¹¹

Bi gotineke din, hevrehên navên hejmarên 1 – 9 yê kurdî di hemû lehceyên kurdî de, di piraniya zimanên îranî de û di piraniya zimanên hindûewropî de jî di zimanên ji Hindistanê heta Bakur-Rojavaya Ewropayê de peyda dibin.

Bo diyarkirina etîmolojiya navên tilhejmarên 1 – 9 yê kurdî, em ê tabloyeke navên van hejmaran bi zarên kurdî û zimanên din yê hindûewropî pêşkêş bikin. Em ê li destpêka tabloyê formên standard an serdest yê kurmançî, dûv re yê lehceyên din yê kurdî (soranî, başûrî, hewramî, zazakî), paşî jî zimanên îranî yê niha navên van hejmaran bi farisî, pey re jî zimanên îranî yê navîn bi pehlewî û jî zimanên îranî yê kevn jî bi avestayî bidin. Piştî zarên kurdî û zimanên îranî, em ê berê xwe bidin şaxên din yê zimanên hindûewropî û jî van zimanan nimûneyan bidin: sanskrîtî, hindî, rûsî, yûnanî, latînî, îtalî, spanî, fransî, inglîzî û almanî. Em ê isbat bikin ku navên hejmarên 1 – 9 bi hemû van zimanan bi eslê xwe yek in lê bi demê re ji hev cuda bûne û dûr ketine lê dîsa jî yekîtiya eslê piraniya wan berçav e.

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
kurmançî, standard	yek	du	sê	çar	pênc	şeş	heft	heşt	neh

¹¹ Navê hejmara 0 ne wiha ye, bi eslê xwe di piraniya zimanan de peyveke wergirtî yan çêkiriye û bi nisbê nû ye (1000 – 2000 salî ye). Em ê dû bi hûngilî behsa wê û sebebên cudahiya wê bikin. Di hin zimanan de navê hin ji hejmarên 1 – 9 jî dikarin çêkirî bin. Bo nimûne, di zimanê fînlândî de – ku ne zimanekî hindûewropî ye – navê hejmarên 9 (yhdeksän) û 8 (kahdeksan) bi eslê xwe ji "yhde-deksän" (yek [ji] dehê [kêm]) û "kahde-deksan" (du [ji] dehê [kêm]) in. "Yhde-" û "kahde-" rehê peyvên "yksi" (1) û "kaksi" (2) yê xwemalî ne, "deksa-/deksä-" (10) jî zimanekî hindûewropî ye (bidin ber kurmançî "deh", zazakî "des", yûnanî "dêka", sanskrîtî "deksa-"...) Wek hejmareke serbixwe "deksa-/deksä-" di fînlândî de peyda nabe û navê hejmara 10 "kymmenen" e.

kurmancî, varyant	êk, yêk	di, dû, dudu ¹²	sisê	çiwar	pênç	-	-	heyşt	-
soranî	yek	dû	sê	çwar, çar	pênc, penc	şeş	hewt, heft	heşt	no
kurdiya başûrî	yek	dû, di, du	sê, si	çwar	penc	şeş	heft	heşt, heyşt	nû
hewramî	yek	diwê	yerê	çwar	penc	şîş	hewt	heşt	no
zazakî	yew ¹³	di, didi	hîrê	çar, çihar, çehar	panc	şeş	hewt	heşt	new
farisî	yek	do	sê	çehar, çar	penc	şêş, şîş	heft	heşt	noh
pehlewî	yek	do	sê	çehar	penc	şeş	heft	heşt	noh
avestayî	eêwe-	duwe	thrayo	çethvaro	pence	xşuweş	hepte	eşte	newe
sanskritî	êkem	dvê	trîni	çetvarî	pençe	şet	septe	eşte	neve
hindî	êk	do	tîn	çar	pañç	çat	sat	ath	new
rûsî	odin	dva	trî	çêtîrê	pyat	şêsti	sêmi	vosêmi	dêvyati
yûnanî	êna	dhuo	trîa	têththera	pênte	êsî	êpta, êfta	oktû	ennêa
latînî	ūnus	duo	trēs	quattuor	quīn- que	sex	septem	octō	novem
îtalî	uno	due	tre	quattro	cinque	sei	sette	otto	nove
spanî	uno	dos	tres	cuatro	cinco	seis	siete	ocho	nueve
fransî	un	deux	trois	quatre	cinq	six	sept	huit	neuf
inglîzî	one	two	three	four	five	six	seven	eight	nine
almanî	ein	zwei	drei	vier	fünf	sechs	sieben	acht	neun

¹² Herwiha bi şiklê "dido, didu, dudo..."

¹³ Li jor devokan herwiha "jew, jû, zû..."

Hemû ji proto- oi-no- d(u)wo- trei- k^wetwor- penk^we s(w)ek^s septm¹⁷ oktō newn^o
hindûewropî¹⁴ 15 16

Niha jî kerem bikin çend gotinan li ser her navê(n) tilhejmareke kurdî 1 – 9.

Yek

Navê hejmara 1 di piraniya devokên kurmançî, soranî û kurdiya başûrî û hewramî de "yek" e. Di kurmançiya rojhilatî de ew bi piranî "êk" yan "yek" e. Wek paşgir ew di kurmançî de "-ek, -yek" (bo nimûne "kitêb-ek, rojname-yek"), di soranî de "-ek, -yek" yan "-êk, -yêk". Di zazakî de varyantên bi K wek navê navê serbixwe yê hejmara 1 peyda nabe lê forma standard "yew" û varyantên wê jî "jew, jû, zû..." ne. Lê di zazakî de jî forma bi K wek paşgira "-êk, -yêk" li kar e.

Ji zimanên kevn yê îranî û zimanên din yê hindûewropî diyar e ku dengê destpêkê Y paşî li peyvê zêde bûye. Dengê K di navê vê hejmarê yê gelek zimanên hindî-îranî de hene lê di zimanên din yê hindûewropî de peyda nabe û herwiha di gelek zar û zimanên îranî de jî tine ye (bo nimûne peşûtî "yew" û zazakî "yew, jew, jû, zû..." ku di tiyên wan de K nîne.

Wek din jî navê vê hejmarê yê hindî-îranî bi dengên xwe ji navên vê hejmarê yê bi zimanên din dût bûye ji ber ku di zimanên din de bi piranî dengê N heye ku di formên hindî-îranî de peyda nabe. Kîteya pêşîn ya navê vê hejmarê di proto-hindûewropî de *oi- bû ku di piraniya zimanên hindûewropî de bûye u- yan o- lê di zimanên hindî-îranî de veguheriye "ew-", "ye-" yan "ê-".

Du

Navê hejmara 2 di kurmançî de bi piranî wek "du", kêman jî wek "di" yan "dû" tê nivîsîn. Ji bilî van, di kurmançiya navendî û rojavayî de formeke dubarekirî ya heman peyvê wek "dudu" yan jî bi

¹⁴ Binêrin bo nimûne: https://en.wikipedia.org/wiki/Proto-Indo-European_numerals

¹⁵ Dengê *O yê proto-hindûewropî di zimanên îranî de adeten dibe E

¹⁶ Dengê *K yê proto-hindûewropî di zimanên îranî de dibe S, Ş yan Ç.

¹⁷ Dengê *S yê proto-hindûewropî di zimanên îranî de adeten dibe H.

formeke wê ya wek "dido, didu, dudo" bi serbixweyî anku ne wek pêşdiyarker (ne navdêrek bi wê re) tê xebitandin. Heman peyva dubarekirî di hejmara "3" de jî li kar e (binêrin jêrtir). Ev diyarde ne di kurmanciya rojhilatî de û ne jî di soranî de peyda nabe.

Di soranî de navê hejmara 2 "dû" ye ku kêman caran wek "du" (bi "waw"ekê) jî tê nivîsîn. Di kurdiya başûrî de heman hejmar li gor devokan bi formên "dû, di, du" tê bihîstin. Di zazakî de ew bi awayê "di" ye – li hin deran "didi" jî wek di kurmanciya navendî û rojavayî de li kar e. Di hewramî de ev hejmar bi şiklê "diwê" yan "dwê" ye.

Hevrehîtiya navên hejmara 2 di zimanên hindûewropî de bi ihtimaleke mezin ji navên hemû hejmarên din baştir berçav û diyar e. Di piraniya mitleq ya zimanên hindûewropî de navê vê hejmarê bi dengê D dest pê dike û herwiha dengê ji U, Ô, O yan W tê de heye. Di zimanên germenî de D-ya wê bûye T (bo nimûne inglîzî "two", swêdî "två") û ji heman malbatê di almanî de bûye Z jî (zwei) lê dîsa jî hevrehîtiya wan diyar e.

Sê

Navê hejmara 3 di hemû devokên kurmancî û soranî de "sê" ye. Di kurmanciya navendî û rojavayî de herwiha forma "sisê" jî di bikaranîna serbixwe de li kar e. Di kurdiya başûrî de jî forma serdest "sê" ye lê varyanta "si" jî peyda dibe.

Navê hejmara 3 di hewramî (yerê) û zazakî (hîrê) de ji navê wê yê kurmancî, soranî û herwiha farisî û pehlewî "sê" jî dûr dixuyin. Li aliyekî din, forma hewramî "yerê" û bi taybetî jî forma zazakî "hîrê" zêdetir dişibin navên vê hejmarê yên bi piraniya zimanên din yên hindûewropî, bo nimûne avestayî "thrayo" yan inglîzî "three". Wek mînak, di van zimanan de jî R di peyvê de heye lê di peyva "sê" de peyda nabe. Sebeb ew e ku T-ya vê peyvê hê li serdema zimanên kevn yên îranî (bo nimûne avestayî) bûbû "th-" anku S-ya navdidanî yan jî S-ya "fis" wek di inglîzî de jî di navê vê hejmarê de "three" yan jî di erebî de di navê heman hejmarê de "thelathe". Dûv re di kurmancî, soranî, farisî û pehlewî de ev deng bûye S-ya "normal". Herçi zazakî ye, wê S-ya navdidanî kiriye H wek çawa ku hemû zimanên îranî S-ya peyva *septm (7) ya proto-hindûewropî kiriye H-ya peyva "heft" yan S-ya *sem- ya proto-hindûewropî kiriye H-ya "hem, heman, hev, hemû..." Hewramî taliyê H jî xistiye û Y li cihê wê daniye.

Hewramî û zazakî R-ya vê hejmarê jî parastiye, berevajî kurmancî, soranî, farisî û pehlewî.

Çar

Navê hejmara 4 di piraniya zimanên îranî, hindî û slavî de dişibe navê vê hejmarê yê kurmancî tevî ku baş tê dîtîn ku di kurmancî de bi zelalî kurttir û sadetir bûye: kurmancî "çar", soranî û kurdiya başûrî "çîwar, çwar", zazakî "çar, çihar", farisî "çehar, çar", pehlewî "çehar", avestayî "çethvaro", sanskrîtî "çetvari", rûsî "çêtîrê", ukraynî "çotiri", polonî "cztery". Herwiha di zimanê ermenî û zimanên keltî de jî hê dişibe ya kurdî: ermenî "çorş", skotî "ceithir", îrlandî "ceathair" (di van zimanan de C wek Ç-ya kurdî tê gotin, ne wek C-ya kurdî).

Lê gava ku mirov li zimanên romansî (zimanên ji latînî peyda bûyî) dinêre, dibîne ku dengê destpêkê ne Ç lê K ye (Q di van zimanan de wek K-ya kurdî tê gotin, ne wek Q-ya me): latînî "quattuor", îtalî "quattro", portugalî "quatro", spanî "cuatro" (bixwîne [kwatro]).

Di eslê peyva proto-hindûewropî jî di rastiyê de li destpêkê K hebû ku di gelek zimanan de bûye Ç. Ev diyardeyeke berbelav ya dengnasî ye ku K-ya proto-hindûewropî di hin şaxên zimanên hindûewropî de (bi taybetî di zimanên hindûîranî û balto-slavî de) dibe Ç yan S.

Lê gava ku mirov li zimanên germenî dinêre, dibîne ku dengê destpêkê yê navê vê hejmarê ne Ç û ne jî K lê F ye: bo nimûne inglîzî "four", swêdî "fyra", almanî "vier" (bixwîne [fir]). Sebebê peydabûna dengê F li destpêka navê hejmara 4 di zimanên germenî de navê hejmara 5 e ku zimanên germenî bi F ye: bo nimûne almanî "fünf", swêdî "femma", inglîzî "five".¹⁸

Pênc

Navê hejmara 5 di hemû devokên kurmancî de "pênc" e.¹⁹ Di soranî de ew wek "pênc" û "penc" peyda dibe, di zazakî de "panc" e. Di piraniya zimanên din yên îranî de vokala wê E ye/bû: farisî, pehlewî, partî, belûçî "penc" lê peştûyî "pindze", osetî "fonç". Di avestayî de "pençe" bû, di sanskrîtî de peñcen", bi hindî "pañç" e. Wek ku tê dîtîn, ti guman ji hevrehîtiya wan di nav zimanên hindûîranî de nîne. Di yûnanî de jî bi şiklê xwe yê "pênte" pir nêzîkî van zimanan e.

¹⁸ Bo tesîra navên hejmaran li hev di kurdî de, li jêrtir li navê hejmarên 8 û 9 binêrin.

¹⁹ Ew carinan wek "pênç" anku bi Ç tê nivîsîn lê ev awayê nivîsînê di kurmancî de ji tesîra nivîsîna tirkî ye ji ber ku tirkî C li dawîya peyvan adeten dike Ç.

Eger mirov li rûsî binêre, dibîne ku navê vê hejmarê bi şiklê "pyati" ji kurdî dûr ketiye û heta belkî mirov bikeve ber şik û gumana hevrehîya wan jî. Lê eger em li hin zimanên din yê balto-slavî binêrin, em ê bibînin ku di hin zimanan de formên navbera wan hene ku dikarin bi guherînen hêdî-hêdî têkiliya peyva kurdî û ya rûsî biselmînin: lîtwanî "penki" (bixwîne "pênkî"), latviyayî "pieci" (bixwînin "piyêçî"), polonî "pięć", belarûsî "pyaçi", rûsî "pyati".

Eger em berê xwe bidin rojavatir û li zimanên germenî binêrin, em ê bibînin ku navê hejmara 5 ne bi P lê bi F dest pê dike: almanî "fünf", swêdî, danmarkî û norwecî "fem", holendî "vijf" (bixwînin "feyf"), inglîzî "five" (bixwînin "fayv"). Lê wek ku me hê di nav malbata îranî de di zimanê osetî de dît, P dikare bibe F ("fonç"). Wek din jî pevguherîna F/P diyardeyeke berbelav ya dengnasî ye.

Cudahiya din ya serekî di zimanên germenî de peydabûna F yan V li dawîya peyvê ye ku di zimanên îranî de C/Ç heye. Ew ji sebebê guherîna dengê dawiyê bi dengêkî wek dengê destpêkê ye. Ev diyarde di zimannasîyê de bi navê asîmîlasyonê anku wekhevîkirinê tê nasîn. Hê deqîqtir, ev "asîmîlasyonê pêşvero" ye anku dengêkî pêştir tesîrê li dengêkî li dût xwe dike.

Bo diyardeyeke ya asîmîlasyonê lê ber bi paşve anku "asîmîlasyonê paşvero" yanî guherîna dengê destpêkê bi dengê dawiyê di navê heman hejmarê de di zimanên romî de diyar e: latînî "quinque" (bixwînin "kînkê") ku ew jî wek "pênc" a kurdî ji "*pênk" e ya proto-hindûewropî ye lê K-ya destpêka kîteya duyem P-ya destpêka kîteya yekem jî kiriye K.

Paşî heman peyv di zimanên niha yê romî de dîsa ketiye ber dîsîmîlasyonê anku ferqbûnê û di zimanên niha yê romî de dengê destpêkê êdî ne K ye lê venegerîye P-ya eslî jî lê bûye Ç yan S: îtalî "cinque" (bixwîne "çînkwê"), spanî "cinco" (bixwîne "sînk"), portugalî "cinco" (bixwînin "sînk"), fransî "cinque" (bixwînin "senk").

Şeş

Navê hejmara 6 di hemû zarên kurdî de û herwiha di piraniya zimanên din jî yê îranî de "şeş" e lê di kêm ji wan de vokala E bi A (tacikî) yan jî bi Î (farisiya devkî) guheriye. Di pehlêwî de jî navê vê hejmarê "şeş" bû, di avestayî de "xşveş", di sanskrîtî de "şeş", hindî "çeh".

Di zimanên balto-slavî de jî navê vê hejmarê hê niha jî pir dişibe navê wê yê kurdî: lîtwanî "šeši", latviyayî "seši", rûsî "şêsti", bulgarî "şêst", çekî "šest" û hwd.

Navê vê hejmarê yê bi zimanên germenî hinekî ji navê wê yê kurdî dûr ketibe jî, dîsa hevrehîya wan diyar e: danmarkî û norwecî "seks", swêdî "sex" (bixwînin "sêks"), almanî "sechs" (bixwînin "sêks"), holendî "zes", inglîzî "six" (bixwînin "siks") û hwd.

Dîsa di zimanên romî de jî hê hevrehîya wan li gel peyva kurdî berçav e: latînî "sex" (bixwînin "sêks"), spanî û portugalî "seis", fransî "six" (bixwînin "sîs" yan "sî"), îtalî "sei".

Di yûnanî de navê vê hejmarê "hêks" û di ermenî de jî "vêç" bi dengê xwe ji "şeş" ya kurdî pir dûr ketine lê dîsa jî ew jî hevrehên "şeş"ê ne û vedigerin rehê "*swéks" yê makezimanê proto-hindûewropî.

Li aliyekî din, herwiha navê vê hejmarê yê bi zimanên samî jî dişibe navê wê yê bi zimanên hindûewropî. Em çend nimûneyan ji zimanên samî bidin: îbrî/îbranî "şêş", aramî "şita", erebî "sitte", amharî "sidst" ... lê wekheviya wan li gel yê hindûewropî ihtimalen tesadîfî ji ber ku hejmarên din yê sade ne wek hev yan nêzîkî hev in. Li aliyê din, şîbîna "6" ya hindûewropî li gel sekiz (heşt) ya tirkî û zimanên din yê tûranî bi zelalî tesadîfî ye.

Heft

Navê hejmara 7 di hemû piraniya devokên kurmançî de "heft" e lê di hin devokên sinorî yê navbera kurmançî û soranî de dikare wek "hewt" jî were bihîstin.²⁰ Di kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de jî ew bi awayê "heft" e, di soranî de li hin deveran "heft" e lê bi piranî "hewt" e, di zazakî de bi piranî "hewt", carinan jî "hot" e.

Tiştêkî ecêb yê dengnasî di vê peyvê de H-ya wê ye ku ne wek H-ya di peyvên wek "her, heval, hatin, havîn" lê wek H-ya di navên Hesên û Hisên de ye. Ev deng di vê peyvê de di hemû lehceyên serekî

²⁰ Carinan wek "hevt" jî di nivîsînê de tê dîtin lê ev tenê şaşiyê nivîsînê ye, di rastiyê di ti devokên kurdî de dengê V û T li pey hev di axiftinê de nayê.

yên kurdî de wiha ye tevî ku di piraniya zar û devokên kurdî de dengê H di peyvên xwemalî de yan peyda nabe yan jî pir nadir e.²¹

Di zimanên din jî yên îranî de navê vê hejmarê wiha ye/bû: farisî, pehlewî û partî "heft", belûçî "hept", avestayî "hepte-". Herwiha di yûnanî de jî "hêpta" ye.

Wek din li derveyê zimanên îranî, dengê destpêkê ne H lê S ye: sanskrîtî "septan", latînî "septem", lîtwanî "septyni"... Diyardeyeke giştî ya dengnasiya dîrokî ya zimanên îranî ye ku S-ya proto-hindûewropî di zimanên îranî de dibe H. Bo nimûne: inglîzî "same" lê kurdî "hem, heman, hev", inglîzî "summer" lê kurdî "havîn".

Ji hin zimanan P/F ketiye: hindî "sat", spanî "siete". Di fransî de P di nivîsînê de maye lê êdî nayê gotin: sept (bixwînin "sê").

Di inglîzî de P/F bûye V (seven), di almanî de bûye B (sieben). Di rûsî de PT ketiye û wek "sêmi" maye. Di ermenî de ji berê ve S ketiye: bi ermeniya kevn navê vê hejmarê "êawtn", niha "yot".

Navê vê hejmarê bi zimanên hindûewropî herwiha pirr dişibe ya zimanên samî jî: erebî "seb'e", maltayî "sebgħa", aramî "şeb'a", îbrî "şeva" lê nêzîkiya wan ihtimalen tenê tesadîfî ye (lê herwiha binêrin hejmara "şeş" li jortir ku ew jî di zimanên hindûewropî û yên samî de dişibin hev.)

Heşt

Navê hejmara 8 di piraniya devokên kurmançî de "heşt" e lê li gelek deveran jî bi awayê "heyşt" e. Di kurmançiya rojhilatî de û herwiha di zimanê nivîskî de forma serdest "heşt" lê di kurmançiya navendî de û herwiha hin caran di nivîsînê de jî forma "heyşt" li kar e.

Di kurmançiya rojhilatî de dengê destpêkê wê wek H-ya di peyva "heval" de ye lê di kurmançiya navendî de ew deng wek H-ya di peyva "heft" yan di navê "Hesen" de ye.

Di soranî de forma serdest û "heşt" e (bi H-ya wek di peyva "heval" de), di kurdiya başûrî de li hin deveran "heşt" û li hinan jî "heyşt". Bi zazakî û hewramî jî "heşt" e.

²¹ Istisna û awarteyiyek ji vê kurmançiya navendî ye ku di gelek peyvên din jî yên xwemalî de li cihê H-ya wek di peyva "hatin" de, H-ya wek di navê Hesen de dixebitîne: hemû, hirç, hezar... ku di devokên din de bi H-ya wek di peyva "hatin" de tên gotin.

Ji nav zimanên din jî yê îranî yê niha bi farisî û belûçî jî "heşt" e, bi osetî "est" û bi peştûyî jî "eti". Di avestayî û sanskrîtî de "ešte" bû. H-ya niha li destpêka navê hejmara 8 ji tesîra H-ya di peyva "heft" de ye: bi analojîyê anku wekhevbûnê H li navê hejmara 8 jî zêde bûye.

Di hevrehên wê yê bi zimanên din jî yê ewropî de bi piranî H nîne: almanî "acht" (bixwînin "axt"), inglîzî "eight" (bixwînin "êyt"), swêdî "åtta" (bixwînin "otta"), yûnanî "okto", latînî "octo" (bixwînin "okto"), îtalî "otto", spanî "ocho" (bixwînin "oço"). Fransî wek "huit" bi H dinivîse lê bêyî H wek "wît" dibêje. Di ermenî de bûye "uyt".

Di nav zimanên balto-slavî de, di şaxê baltî de hê pir nêzîkî formên bi zimanên îranî maye: lîtwanî "aštuoni", latviyayî "astoņi". Lê di zimanên slavî de ji formên îranî dûr ketiye: rûsî "vosêmi", polonî "osiem". Lê di wan de jî hê dengê S maye ku hevberî dengê Ş yê zimanên îranî ye di vê peyvê de. O-ya wê jî wek ya gelek zimanên din yê hindûewropî ye ku di zimanên îranî de bûye E.

Neh

Navê hejmara 9 di tevahiya kurmancî de "neh" e lê li hin deveran H-ya dawiyê dikare neyê gotin. Hin caran ew dikare wek "nih" jî were gotin.

Di zazakî de navê vê hejmarê "new", di soranî de "no" û di kurdiya başûrî de jî li deveran "nûe" û li hinan jî "nû" ye û li çend deveran jî "nih".

Di nav zimanên din yê îranî de navê vê hejmarê wiha ye/bû: farisî "noh", pehlewî "no", avestayî û hexamenîşî "neve-". Di sanskrîtî de jî "neve" bû, di hindî de "new" e.

Di piraniya şaxên din jî yê hindûewropî de navên vê hejmarê hê jî gelek nêzîkî formên wê yê îranî maye. Di nav zimanên germenî de bi almanî "neun", bi swêdî "nio", bi inglîzî "nine" (bixwînin "nayn"). Di yûnanî de "ennêa" ye. Di zimanên romî de wiha ye: latînî "novem", îtalî û portugalî "nove", spanî "nueve", fransî "neuf" (bixwînin "nöf").

Wek ji zimanên din diyar e, H li dawîya peyvê nîne û di kurmancî û farisî de ew diyardeyeke nû ye. H-ya wê bi ihtimaleke mezin ji H-ya "deh"ê ye bi analojîyê anku wekhevbûnê. Lê wek din jî di zimanên îranî de H û V dikarin bikevin cihên hev, bo nimûne farisî "kohî, kohen" lê kurmancî "kovî, kevn".

Di zimanên balto-slavî de jî tesîra navê hejmara 10 li ser navê hejmara 9 bûye lê ne li dawiyê lê li destpêkê. Ji ber ku li destpêka navê hejmara 10 de di zimanên hindûewropî de D heye, di zimanên balto-slavî de D li destpêka navê hejmara 9 jî cih ji dengê N standiye: lîtwanî "devyni", çekî "devět", rûsî "dêvyati" û hwd.

Deh

Navê hejmara 10 di piraniya devokên kurmancî de "deh" e lê li hin deveran bêyî H-ya dawiyê anku wek "de" tê gotin. Herwiha wek paşgir di hejmarên 11 – 19 de li piraniya deveran wek "-de" anku bêyî H-ya dawiyê tê gotin tevî ku li heman deverê wek navê hejmara 10 bi awayî "deh" jî be.

Di soranî "de" e, di kurdiya başûrî de li gor deveran dikare "dye", "de" yan "deh" be. Di farisî de jî wek di kurmancî de "deh" e lê wek paşgira navên hejmarên 11 – 19 di farisî de jî di zimanê devkî dikare bêyî H-ya dawiyê were bikaranîn. Di pehlewî de jî "deh" bû.

Di zazakî de "des" e, di avestayî û sanskrîtî de "dese-" û di rûsî de "dêsyati" û ermenî de jî "tas" e. Bo guherîna dengên H û S bi hev, bidin ber kurmancî "masî, asin/hesin" lê farisî "mahî, ahen".

Di zimanên din yê hindûewropî de: yûnanî "dêka", latînî "decem" (bixwînin "dêkêm"), portugalî "dez", spanî "diez", îtalî "dieci", fransî "dix" (bixwînin "dîs"), inglîzî "ten", almanî "zehn", swêdî "tio".

Eslê peyvê di makezimanê proto-hindûewropî de wek *déǵm hatiye veavakirin. Hatiye pêşniyazkirin eslê wê jî *de-k̑mt be ku ji maneya "du dest" anku "tiliyên du destan" bide.²²

5. HEJMARÊN DEHGIR

Navên hejmarên dehgir anku 11 – 19 di kurmancî û zazakî de bi du destyên serekî peyda dibin.

²² [E1%B8%B1m%CC%A5">https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/d%C3%A9%E1%B8%B1m%CC%A5](https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/d%C3%A9%<span style=)

Di desteya kevnar, standard û – bi kêmî di kurmancî de – serdest de navê hejmarê ji formeke navê tilhejmarê li destpêkê formeke navê hejmara 10 jî li dûv wê ava bûye. Bo nimûne:

- desteya tilhejmar + -deh: 14 = çardeh (çar-deh, 4 + 10)

Desteya duyem ji formeke navê hejmara 10 li destpêkê, peyvika "û" li navê û navê tilhejmarê jî li dawiyê ava bûye:

- desteya deh + tilhejmar: 14: dehûçar (deh-û-çar, 10 + û + 4)

5.1. Desteya deh + tilhejmar

Desteya deh + tilhejmar ji navê hejmara 10 li destpêkê, peyvika "û" li navê û navê tilhejmarê jî li dawiyê pêk tê.

Di eslê xwe de navê hejmarên 11 – 19 li gor vê desteyê wiha ye:

Hejmarên 11 – 19 li gor desteya deh + -û- + tilhejmar (bi nivîskî)

11	dehûyek
12	dehûdu ²³
13	dehûsê ²⁴
14	dehûçar
15	dehûpênc
16	dehûşeş
17	dehûheft
18	dehûheşt
19	dehûneh

²³ Herwiha "dehûdudu, dehûdido, dehûdudo..."

²⁴ Herwiha "dehûsisê".

Lê di pratîkê de di piraniya devokên kurmanciya rojavayî de formên wisa li kar in ku tê de H-ya peyva "deh" ketiye²⁵ û peyvika Û li pey vokala peyva "de-" bûye W û encameke wiha jê derketiye:

Hejmarên 11 – 19 li gor desteya deh + -û- + tilhejmar (devokên kurmanciya rojavayî)

11	dewyek
12	dewdu ²⁶
13	dewsê ²⁷
14	dewçar
15	dewpênc
16	dewşeş
17	dewheft
18	dewheşt
19	dewneh ²⁸

Desteya deh + tilhejmar di kurmanciya rojavayî de li kar e. Ew herwiha di zazakî de, bi taybetî jî di zazakiya bakurî anku li Dêrsimê û derdorên wê serdest e yan jî niha êdî tekane alternatîv e.

Hejmarên 11 – 19 li gor desteya deh + -û- + tilhejmar (bi zazakiya nivîskî)

11	desûyek
12	desûdi
13	desûhîrê
14	desûçar
15	desûpanc

²⁵ Bo ketina H-ya dawiya "deh"ê herwiha li desteya "tilhejmar + deh" li jêtir binêrin.

²⁶ Herwiha "dewdudu, dewdido, dewdudo..."

²⁷ Herwiha "dewsisê".

²⁸ Herwiha "dewne".

16	desûşeş
17	desûhewt
18	desûheşt
19	desûnew

Ji aliyê dîrokî ve desteya deh + tilhejmar ji desteya tilhejmar + deh nûtir e. Di piraniya reha û mitleq ya zimanên îranî de navê hejmarên 11 – 19 bi desteya navê tilhejmar + deh e (li jêrtir binêrin).

Desteya deh + tilhejmar dikare ji ber tesîra tirkî be ji ber ku di tirkî de jî navê hejmarên 11 – 19 bi navê "deh" (bi tirkî "on") + navê tilhejmarê tê avakirin, bo nimûne:

- 11: onbir (ji "on = deh" + "bir = yek)
- 14: ondört (ji "on = deh" + "dört")

Lê hêjayî gotinê ye ku di tirkî de hevwateriya peyvika "û" ya kurdî (bi tirkî "ve") di navbera "deh"ê û tilhejmarê de nîne. Loma qalibê kurdî û yê tirkî li vê derê ne bi tamamî wek hev in:

- qalibê kurmanciya rojhilatî: deh + û + tilhejmar
- qalibê tirkî: on (deh) + tilhejmar

Qalibê hejmarên 11 – 19 yê kurmanciya rojavayî di rastiye de wek qalibê hejmarên mezintir yê kurdiya giştî, bidin ber hev:

- dehûçar (deh-û-çar)
- bîstûçar (bîst-û-çar)
- heftêûçar (heftê-û-çar)
- ...

Di rastiye de di zimanên kevn yê îranî de hemû hejmarên 11 – 99 bi qalibê tilhejmar + dehhejmar bûn. Bo nimûne:

- avestayî: 25 pença-ce-vîseyti (peyv bi peyv: pênc-û-bîst)

Qalibên wiha hê jî di hin zimanên hindûewropî de hene. Bo nimûne:

- almanî: 25 fünfundzwanzig < fünf und zwanzig (peyv bi peyv: pênc-û-bîst)

- peştûyî: 25 pincê wîşt (pênc-bîst)

Piraniya zimanên hindûewropî di hejmarên ji bîstê mezintir de dest jî vî qalibî berdaye û dehhejmarê li berî tilhejmarê rêz dikin. Bo nimûne navê hejmara 25 bi hin zimanên din (wergera peyv-bi-peyv di kevanokan de):

- inglîzî: twenty-five (bîst-pênc)
- fransî: vingt cinque (bîst pênc)
- rûsî: двадцати pyati (bîst pênc)

Li derveyî zimanên hindûewropî, bo nimûne di erebî de jî peyvrêziya hejmarên 11 – 99 wek di almanî de ye:

- 25: xemse we işrûn (pênc û bîst)

5.2. Desteya tilhejmar + 10

Tevî ku di piraniya zimanên hindûewropî de peyvrêziya navên hejmarên 21 – 99 ji formûlaya "tilhejmar + dehhejmar" veguheriye qalibê "dehhejmar + tilhejmar", dîsa jî di navê hejmarên 11 – 19 de bi piranî formûlaya "tilhejmar + deh" hatiye parastin. Di vê sîstemê de navê hejmara biçûktir berî navê hejmara 10 tê.

Kerem bikin em li navê hejmarên 11 – 19 bi kurmancî binêrin û paşî wan li gel formên zar û zimanên din yê lêzim bidin ber hev û behsa çêbûna wan bikin:

Hejmar	Forma serekî	Formên din	Bidin ber ²⁹
11	yazde(h)	yande(h)	"yek-deh"
12	diwazde(h)	dozde(h), dazde(h), diwanzde(h), donzde(h), danzde(h)	"du-deh"

²⁹ Peyvên di van malikan de wek navên hejmarên 11 – 19 li ti deverê nayên bikaranîn. Ev tenê bo fehmkirina peydabûna navên "yazdeh, diwazdeh, sêzdeh..." hatine nivîsîn.

13	sêzde(h)	-	"sê-deh"
14	çarde(h)	-	"çar-deh"
15	pazde(h)	panzde(h)	"pênc-deh"
16	şazde(h)	şanzde(h)	"şeş-deh"
17	hevde(h)	hivde(h)	"heft-deh"
18	hejde(h)	hijde(h), hîjde(h)	"heşt-deh"
19	nozde(h)	-	"neh-deh"

Çawaniya çêbûna vê desteya hejmaran baş ji navê hejmara 14 "çar-deh" baş diyar dibe. Wek din, di navê hemû hejmarên din yê 11 – 19 de guherîn peyda bûye anku ne yekser ji tilhejmara xwerû û ji peyva "deh" peyda bûne.

Sebebên guherînê yek jê ew e ku gava ev hejmar di zimanê de ji navê tilhejmaran û navê hejmara 10 peyda bûne, navê hejmarên 1 – 9 bi xwe ne wek niha bûn. Sebaba duyem jî ew e ku piştî hingê gelek guherîn jî hem di navên hejmarên 1 – 10 de û hem jî di navên hejmarên 11 – 19 de peyda bûye.

Kerem bikin em pêşî navên van hejmaran li gel navên wan yê bi zar û zimanên din yê lêzim re bidin ber hev. Bo ku cihê wan bike, em ê hejmarên 11 – 15 di tabloyekê de û 11 – 19 jî di xişteyê de din de pêşkêş bikin. Bo dirêjnekirina meseleyê, ji her zar û zimanê tenê forma serdest di tabloyê de hatiye dan. Varyantên devokî yê kurmançî li tabloya jortir de ne. Varyantên zarên din yê kurdî di jêrenotan de ne.

Hejmarên 11 – 15 li gor formûlaya "tilhejmar + 10"

zar/ziman	11	12	13	14	15
kurmançî	yazde(h)	diwazde(h)	sêzde(h)	çarde(h)	pazde(h)
soranî ³⁰	yanze	dwanze	siyanze	çwarde	panze

³⁰ Varyantên din yê soranî wiha ne: 11 yazde, 12 dwanzde, 13 sêzde/sênze, 14 çarde, 15 pazde/pandze.

kurdiya	yanze	dwanze	sêzde	çwarde	panze
başûrî ³¹					
hewramî	yanze	dwanze	sênze	çwarde	panze
farisî	yazde(h)	dwazde(h)	sîzde(h)	çeharde(h)	panzde(h)
pehlewî	yazdeh	dwazdeh	sîzdeh	çehardeh	panzdeh
zazakî ³²	yewendes	duwês	hîrês	çarês	pancês
avestayî	eêwendese	dwendese	thrîdese	çethrudese	pençedese
sanskritî	êkadese	dvadese	treyodese	çeturdese	pançedese
rûsî ³³	odinnadçati	dvênadçati	trinadçati	çêtirnadçati	pyatnadçati
yûnanî ³⁴	êndêka	dhodêka	trîskaydêka		
latînî	undecim	duodecim	tredecim	quattuordecim	quindecim
fransî	onze	douze	treize	quatorze	quinze
inglîzî ³⁵			thirteen	fourteen	fifteen
almanî ³⁶			dreizehn	vierzehn	fünfzehn

³¹ Guhartoyên din yên kurdiya başûrî wiha ne: 11 yazde, 13 sênze/zyade, 14 çorde.

³² Di piraniya devokên zazakî de niha desteya "deh + -û- + tilhejmar" li kar e (li jortir binêrin). Ji desteya "tilhejmar + des" mirov dikare van varyantên devokî bide: 11 yondes/zûyes, 12 duwês/duyês, 15 poncês. Di tabloyê de me zazakî nêzikî avestayî daniye ji ber ku di meseleya hejmaran de zazakî formên kevnar yên nêzikî avestayî parastine.

³³ Hejmarên 11 – 19 di rûsî û zimanên din yên slavî de bi formûlaya "tilhejmar + na (li ser) + formeke navê hejmara 10" pêk tên.

³⁴ Mebesta me li vê derê yûnaniya kevn e. Yûnaniya kevn di binavkirina hejmarên 11 – 13 de (yûnanî 11 – 12) wek kurdî sîstema "tilhejmar + deh" bi kar tîne lê di hejmarên 14 – 19 de pergala "deh + tilhejmar" dixebitîne loma me malikên 14 – 15 li vê derê vala hiştine ji ber ku peyvên yûnanî yên binavkirina van hejmaran ne li gor vê desteya kurdî ne û ji wan re ne hevreh in.

³⁵ Navê hejmarên 11 û 12 (eleven, twelve) di inglîzî de ne li gor vê sîstemê hatine avakirin û loma nikarin li gel navên wan yên kurdî werin berhevdan lê ji navê 13 û pê ve bi heman avaniya kurdî ne.

³⁶ Navê hejmarên 11 û 12 (elf, zwölf) di almanî de ne li gor vê sîstemê hatine avakirin û loma nikarin li gel navên wan yên kurdî werin berhevdan lê ji navê 13 û pê ve bi heman avaniya kurdî ne.

Hejmarên 16 – 19 li gor formûlaya "tilhejmar + 10"

zar/ziman	16	17	18	19
kurmancî	şazde(h)	hevde(h)	hejde(h)	nozde(h)
soranî ³⁷	şanze	hevde	hejde	nozde
kurdiya başûrî	şanze	hevde	hejde	nûzde
hewramî	şanze	hewde	hejde	noze
farisî	şanzde(h)	hifde(h)	hijde(h)	nûzde(h)
pehlewî	şazdeh	heftdeh	heştdeh	nozdeh
zazakî ³⁸	şîyês	hewtês	heştês	newês
avestayî	xşûeşdese	heptedese	eştadese	newedese
sanskritî	sodedese	septedese	eştadese	nevedese
latînî ³⁹	sēdecim	septendecim		
fransî ⁴⁰	seize			
inglîzî	sixteen	seventeen	eighteen	nineteen
almanî	sechzehn	siebzehn	achtzehn	neunzehn

³⁷ Varyantên din yên soranî wiha ne: 16 şanzde/şazde, 17 hivde, 18 hijde/hîjde.

³⁸ Ji bilî desteya "des + û + tilhejmar", varyantên din yên desteya "tilhejmar + 10" di zazakî de wiha ne: 16 sêyês, 17 hotês.

³⁹ Latînî navê hejmarên 18 û 19 ne li gor formûlaya "tilhejmar + 10" lê bi awayê "du ji bîst" (duodēvigintī < duo dē vigintī) û "yek ji bîst" (ūndēvigintī < ūnus dē vigintī) bi kar dianîn.

⁴⁰ Fransî ji hejmeta 17 û pê ve derbazî sîstema "10 + tilhejmar" dibe, bo nimûne 17 = dix-sept ("deh-heft"), 18 = dix-huit ("deh-heşt"), 19 = dix-neuf ("deh-neh").

5.3. Varyant û taybetmendiye giştî yê 11 – 19

Navên hejmarên 11 – 19 yê desteya "tilhejmar + 10" bi çendîn varyantan bi taybetî di kurmançî de lê herwiha bi rêjeyeke belkî hinekî kêmtir di zarên din jî yê kurdî de û heta di zimanên din yê îranî de jî peyda dibin.

Li vê derê em ê van taybetmendiye varyantan rêz bikin:

Cudahiyên denga di navbera 1 – 9 û 11 – 19 de

Hejmarên 11 – 19 bi eslê xwe ji navên hejmarên 1 – 9 + navê hejmara 10 hatine çêkirin û dişibin wan. Lê dîsa jî çendîn cudahî di navbera wan de hene:

1 û 11: Di navê hejmara 1 anku "yek" (yan "êk") de E û K hene ku di navê hejmara 11 (yazde[h]) de peyda nabin. Li aliyekî din, di hejmara 11 de dengên A û Z hene ku di "yek"ê yan "êk"ê de nînin.

Herwiha di navê 11 de N jî mimkin e (ya-n-zdeh) ku di navê hejmara 1 de ne gengaz e.

Di zarakî de di navê hejmara 11 de navgira –en- heye ku navê hejmara 1 de peyda nabe.

2 û 12: Di navê hejmara 12 anku "diwazde[h]" de A û Z hene ku di navê hejmara "du" de peyda nabin. Di navê 12 de herwiha N jî dikare hebe (diwa-n-zdeh) ku di navê 2 de peyda nabe. Hejmara 12 bi dengê –iw- (carinan "-uw-" yan jî tenê "-w-") tê nivîsîn û hejmara 2 bi dengê U lê bi eslê xwe ew eynî deng in.

3 û 13: Herdu dengên navê hejmara 13 bi kurmançî wek dengên hejmara 3 ne. Lê di navê hejmara 13 de dengê Z jî heye ku di navê hejmara 3 de peyda nabe. Herwiha di soranî, başûrî, hewramî û farisî de destpêka navê hejmara 13 "siyanz-" e ku hem N û Z tê de hene ku di navê hejmara 3 de tine ne. Herwiha li cihê vokala Ê ya navê hejmara 3, di navê hejmara 13 de dengên -iya- hene. Di zarakî de di navê hejmara 13 (hîrês) de Ê-ya navê hejmara 3 (hîrê) û Ê-ya paşgira "-ês" bi hev re bûne tenê Ê-yek.

4 û 14: Di navê hejmara 14 de hemû dengên navê hejmara 4 wek xwe hatine parastin, tenê paşgira "-de" yan "-deh" lê hatiye pêvekirin bêyî zêdekirina ti dengekî din (bo nimûne Z yan N). Di lehceyên din yên kurdî de jî rewş wisa ye, bo nimûne: çwar > çwar-de, zazakî çar > çarês.

5 û 15: Di navbera navên hejmara 5 û hejmara 15 de çend cudahî hene. Vokala navê hejmara 5 di kurmancî de Ê (pênc) û di soranî de Ê yan E (pênc, penc) ye lê li cihê wê di navê hejmara 15 de di herdu lehceyan de A heye. Lê di zazakî de di navê herdu hejmaran de A heye: 5 panc, 15 pancês.

Di hemû kurmancî, soranî, başûrî û hewramî de û herwiha di farisî de jî di navê hejmara 5 de dengê C (bi kurmancî "pênc", soranî "pênc, penc", farisî "penc") lê li cihê wê di navê hejmara 15 de Z hene: kurmancî "pazde(h)", soranî "panze" û farisî "panzdeh". Lê di zazakî de herdu bi C ne: 5 panc, 15 pancês.

Herwiha di navê hejmara 5 de di hemû lehceyên kurdî de dengê N heye lê di navê hejmara 15 de di piraniya devokên kurmancî û di hin devokên soranî û başûrî de N nîne: 5 pênc, 15 pazde(h).

6 û 16: Di hemû lehceyên kurdî navê hejmara 6 "şeş" e anku vokala wê E ye. Di farisî de jî berê "şeş" bû lê niha bi devkî bûye "şîş". Lê di navê hejmara 16 (şazde[h], şanzde[h], şanze...) de li cihê E-ya navê hejmara 6 ne E lê A ye (ji bilî zazakî ku vokala navê 16 "-î" ye).

Herwiha li hevberî dengê Ş yê dawiya navê hejmara 6, di navê hejmara 16 de ne Ş lê Z heye: şazde[h], şanzde[h], şanze... Dîsa zazakî ji lehceyên din yên kurdî û herwiha ji zimanê farisî jî di vê meseleyê de cuda ye: bi zazakî 16 "şîyês" e.

7 û 17: Di navê hejmara 7 de dengê T heye ku di navê hejmara 17 de peyda nabe. Herwiha di navê hejmara 7 de dengê F heye (di soranî, zazakî û hewramî de W) ku li cihê wê di navê hejmara 17 de dengê V li kar e. Vokala navê hejmara 7 di hemû lehceyên kurdî de E ye (heft) lê di navê hejmara 17 de di hin devokan de I ye (hivde[h]).

Cudahiyêke din jî awayê gotina herfa H ya van herdu hejmaran e: Di hemû kurmancî, zazakî, soranî û hewramî de û herwiha di piraniya devokên kurdiya başûrî de jî H-ya hejmara 7 wek H-ya di navê Hesên yan Hisên de ye (bi alfabe ya kurdî-erebî heft = هفت). Lê H-ya navê hejmara 17 di gelek ji van lehce û devokan de jî ne H-ya wek di peyva "heval" de ye (bi alfabe ya kurdî-erebî hevde = هه‌فده).

8 û 18: Di navê hejmara 18 de T heye ku di navê hejmara 18 de peyda nabe. Herwiha li cihê Ş-ya di navê hejmara 8 de, di navê hejmara 18 de J li kar e. Vokala herdu hejmaran di gelek devokan de eynî E ye (heşt, hejde) lê di hinan de li cihê E yan EY-a navê hejmara 8 (heşt, heşt), di navê hejmara 18 de I (hijde) heye.

9 û 19: Navê hejmarên 9 (neh) û 19 (nozde[h]) di kurmancî de bi çendîn awayan ji hev cuda ne. Ne E-ya navê hejmara 9 û ne jî H-ya wê di navê hejmara 19 de peyda nabin. Li aliyekî din, di navê hejmara 19 de O û Z hene ku ti ji wan di navê hejmara 9 de ne li kar in.

Niha jî em ê yek bi yek sebebê varyantên di hejmarên 11 – 19 de û herwiha herwiha sebebên cudahiyên navbera hejmarên 1 – 9 li aliyekî û hevberên wan 11 – 19 li aliyê din bikin.

Bi paşgira –deh yan -de

Hemû hejmarên 11 – 19 dikarin di kurmanciya nivîskî de bi paşgira –deh an –de peyda dibin:

- yazdeh, diwazdeh, sêzdeh, çardeh, pazdeh, şazdeh, hevdeh, hejdeh, nozdeh
- yazde, diwazde, sêzde, çarde, pazde, şazde, hevde, hejde, nozde

Li gor devokan di kurmanciya rojhilatî de tenê forma bi "-de" (ne bi "-deh") li kar e. Di kurmanciya navendî de li hin deveran forma "-deh" heye lê dîsa di piraniya devokên navendî de jî varyantên bi paşgira "-de" tên gotin. Di kurmanciya rojavayî de bi piranî tenê formên wek "dewyek, dewdu, dewsê..." (deh û yek, deh û du, deh û sê) tên xebitandin.

Di soranî de tenê varyantên bi paşgira "-de" hene ji ber ku navê xwerû yê hejmara 10 bi xwe jî di soranî bêyî H tê bikaranîn. Di kurdiya başûrî û di hewramî de jî forma serdest an tekane, desteya bi paşgira "-de" ye. Di zazakî de li gel navê hejmara 11 paşgira "-des" (11 = yewendes) yan jî paşgira –ês (12 duwês, 13 hîrês, 14 çarês...) tê xebitandin gava ku desteya "des û yew, des û di, des û sê..." neyê emilandin.

Di farisî de di zimanê nivîskî de formên bi paşgira "-deh" standard in lê di zimanê devkî de "-de" dîsa serdesttir e.

Li gel yan bêyî dengê N

Di navê hejmarên 11, 12, 15 û 16 de di hin devokên de dengê N heye lê di hinan de nîne:

- yazde(h), diwazde(h), pazde(h), şazde(h)
- yanzde(h), diwanzde(h), panzde(h), şanzde(h)

Di kurmancî de adeten formên bêyî N û di soranî de jî formên bi N zêdetir tên bikaranîn. Di soranî de herwiha mimkin e ku di navê hejmarê 13 de jî N hebe lê haya me jê nîne ku tiştekî wisa di ti devokeke kurmancî de hebe:

- kurmancî: sêzde(h)
- soranî: siyanze, sênze, sêzde

Gelo kîjan ji herdu forman orijînaltir û kîjan jî nûtir e?

Bersiveke yekcarî nikare were dan ji ber ku tarîxiyên N di hin ji van hejmaran de hebû lê di hemûyan de tine bû. Lê hin devokan ew li van hemûyan zêde kiriye û hinan jî ew ji hemûyan avêtiye.

Dengê N di navê hejmarên 11 û 15 de orijînal e. Bo dîtina vê rastiyê, kerem bikin em li navê van hejmaran bi çend zimanan binêrin:

- 11: zazakî "yewendes", avestayî "eêwendese", yûnanî "êndêka", latînî "undecim", fransî "onze", rûsî odînnadçati...
- 15: bidin ber navê hejmarê 5 anku "pênc" ku N tê de heye. Herwiha bidin ber navê 15 bi hin zar û zimanên din: zazakî "pancês", avestayî "pençedese", sanskrîtî "pençadese", latînî "quindecim", fransî "quinze", almanî "fünfzehn"...

Lê berevajî wan, gava ku mirov li navên hejmarên 12, 13 û 16 yên bi zimanên din dinêre, bi zelalî dibîne ku N di piraniya wan de li nava peyvê nîne:

- 12: zazakî "duwês", sanskrîtî "dvadese", yûnanî "dhodêka", latînî "duodecim", fransî "douze"...
- 13: zazakî "hîrês", avestayî "thrîdese", sanskrîtî "treyodese", yûnanî "trîskaydêka", latînî "tredecim", fransî "treize"...
- 16: zazakî "şîyês", avestayî "xşûşdese", sanskrîtî "sodese", latînî "sēdecim", fransî "seize"...

Lê zêdebûna N li navê hejmarên 12, 13 û 16 de ne tenê di kurdî de lê xaseten di farisî de peyda bûye. Wek ku ji navê hejmara 12 bi avestayî anku ji "dwendese" diyar e, N hê ji serdema avestayî ve dest bi belavbûna di hin hejmaran de kiriye.

Di farisî de jî navê gelek ji hejmarên 11 – 19 bi çendîn varyantan peyda dibin lê di farisî de N adeten di navê hejmarên 11, 12, 13, 15 û 16 de tê nivîsîn. Di soranî de jî bi piranî wisa tê kirin.

Lê di rastiyê de N-ya navên 12, 13 ji tesîra N-ya di navê 11 de bûye û N-ya di navê 16 de jî ji tesîra N-ya di navê 15 de ye.

Lê gelo çima N di piraniya devokên kurmançî de kurmançî de heta ji cihê bi xwe lê heyî jî anku ji navê hejmarên 11 û 15 jî ketiye?

Helbet mimkin e ku ev diyarde dikare ji ber sivikbûna dengan be:

- yande(h) > yazde(h)
- panzde(h) > pazde.

Lê eger em li peyvên "yek" û "pênc" (bi piraniya zimanên îranî "penc" yan "penç-") li aliyekî û peyvên "yazde(h)" û "pazde(h)" li aliyekî din binêrin, em ê bibînin ku di navê hejmarên 11 û 15 de dengê A heye lê di navê hejmarên 1 û 5 de E yan Ê heye. Sebebê guherîna E-ya tilhejmaran (1, 5) bi A-ya dehgiran (11, 15) bi ihtimaleke mezin bi bişaftina anku helîna E û N ye. Bi gotineke din, E û N bi hev re bûne A ji ber ku N dengê bêvilî ye û dikare vokala berî xwe bike bêvilî. Di pratîkê de ev bo nimûne dibe sebebê wê yekê ku dengê E nêzîkî dengê A dibe û dikare bi demê re bi temamî bibe A.⁴¹

Di zazakî û avestayî de, ku E-ya di navên hejmara 11 de ne A ye, N jî hatiye parastin:

- zazakî: yewendes
- avestayî: eêwendese

Bi heman awayî dengê E yê hejmara 6 di navê hejmara 16 de bûye A:

- şeş > şazde(h)

⁴¹ Sebebê A-ya di peyva "penc" (pênc) ya zazakî de ihtimalen tesîreke paşvero (paşvekî) ya navê hejmara "pancês" (pazdeh) e. Eger mirov li navê hejmara 5 bi zar û zimanên din binêre, mirov dê bi hêsanî bibîne ku dengê A di "penc"ê de tiştekî bi rêjeyî nû ye.

Bi heman egerê mirov dikare herwiha navê hejmara 12 jî di kurdî (ji bilî zazakî) û farisî de şirove bike. Navê vê hejmarê bi kurmancî "diwazde(h)" e (li gel varyantên "diwanzde(h), dozde(h), dazde(h)") anku tê de A heye.

Em dizanin ku "diw-" wek "du" (2) ye, Z wek Z-ya di gelek hejmarên din jî yê dehgir de ye (yazdeh, sêzdeh, pazdeh, şazdeh) lê gelo A ji kû hatiye nav "diwazdeh"ê?

Eger em li navê heman hejmarê bi avestayî "dwendese" yan sanskrîtî "dvedese binêrin, em ê bibînin ku li cihê A-ya kurdî û farisî, di wan de E heye: dwe-, dve-. Peyva kurdî "diwazdeh" jî destpêka xwe ji navê hejmara 2 digire ji serdemekê ku hê E di navê vê hejmarê de hebû anku ew "dwe-/due-" bû. Lê dîsa E li gel N bûye A wek çawa ku EN di navê hejmara 11 de jî bûye A.

Wek encam, di rastiyê de diviya ku N li nava ti ji hejmarên 11 – 19 tine bûya ji ber ku N-ya di navê 11 û 15 de heyî jî li gel dengê E heliyaye û bi hev re bûne A. Lê berî ku E bi N re bibiştir û bi hev re bibin A, N di hin zar û zimanên îranî de belav bûye nav yek yan çend hejmarên din jî yê ku tê de bi eslê xwe N tine bû (bo nimûne avestayî *dwedese > dwedese).

Dengê Z di hejmarên dehgir de

Di navê hejmarên 11, 12, 13, 15, 16 û 19 de di zarên kurdî (ji bilî zazakî), farisî, belûçî û pehlewî û hin zimanên din jî yê niha û yê navîn yê îranî de dengê Z dikeve sinorê navbera navê tilhejmarê û paşgira "-de(h)". Bi kurmancî bo nimûne:

- yazdeh, diwazdeh, sêzdeh, pazdeh, şazdeh, nozdeh.

Lê di navê dehgirên 14, 17 û 18 Z peyda nabe:

- çardeh, hevdeh, hejdeh

Lê ev Z ne di zimanên îranî yê kevn de di navê van hejmaran de heye û ne jî di piraniya zimanên din yê hindûewropî de di navê van hejmaran de. Loma divê mirov bipirse, gelo ev Z ji kû hatiye û çawa niha peyda bûye?

Wek ku tê zanîn, Z di navê hejmarên 15 û 16 de jî heye. Hêsan e mirov fehm bike ku Z di peyvên "paz-deh/panz-deh" de varyanteke dengê C di peyva "pênc" de be ji ber ku dengê C û yê Z ne gelek ji hev dûr in. Herwiha hêsan e mirov fehm bike ku Z-ya di peyva "şazdeh" de jî varyanteke dengê Ş yê li dawiya peyva "şeş" be ji ber ku dengên Z û Ş jî nêzîk in.

Lê gelo Z-ya navê hejmarên 11, 12 û 13 ji kû hatiye ji ber ku li dawiya navên hejmarên 1, 2 û 3 ti dengêkî nêzîkî Z peyda nabe ku bi Z guherîbe? Mirov nikare bibêje ku belkî serdemekê Z yan dengêkî di yê nêzîkî wî di navên hejmarên 1, 2 û 3 de hebûbe ji ber ku di zimanên kevn yên îranî de (bo nimûne di avestayî de) ti dengêkî wisa di van hejmaran de tine bû û di zimanên din jî yên kevnar yên hindûewropî de dengêkî wisa di van hejmaran de peyda nabe.⁴²

Di rastiyê de Z-ya hejmarên 11, 12 û 13 bi nisbî nû ye. Bi esehî sebebê peydabûna wê nayê zanîn lê ihtimalen ew ji navên hejmarên 15 û 16 belavî navên hejmarên 11, 12 û 13 jî bûbe. Lê li aliyekî din, ev heman Z li navên hejmarên 14, 17 û 18 zêde nebûye tevî ku 14 û 17 ji 11, 12, 13 zêdetir nêzîkî 15 û 16 ne.

Li gel an bêyî dengê D

Di tevahiya kurmancî de di navê hemû hejmarên 11 – 19 de dengê D li destpêka beşa duyem heye. Beşa duyem dikare "-deh" an jî "-de" be lê her D tê de di kurmancî de heye.

Dengê D herwiha di farisiya nivîskî, pehlewî, avestayî, sanskrîtî û gelek zimanên din jî yên hindûewropî de li kar e. Paşgira "-deh /-de" ji navê hejmara 10 anku "deh" e û dengê D tê de orijînal e.

Lê rewşa hemû zarên din yên serekî yên kurdî cuda ye.

Di soranî de bi di piraniyan devokan de û herwiha bi awayekî giştî di zimanê nivîskî de jî D di navê hejmarên 11, 12, 13, 15 û 16 nayê bikaranîn:

- yanze, dwanze, siyanze, panze, şanze

Lê di soranî de jî D di navê hejmarên 14, 17, 18 û adeten di navê hejmara 19 de jî li kar e:

- çwarde, hevde, hejde, nozde

⁴² Di fransî û gelek zimanên din yên ji latînî peyda bûyî (zimanên romî) de dengê Z di navê hin hejmarên 11 – 19 de peyda dibe, bo nimûne fransî: "11 onze, 12 douze, 13 treize" lê Z-ya van zimanan ne hevrehê Z-ya di hejmarên zimanên îranî de ye. Z-ya zimanên romî kurttirina peyva latînî "decim" (10) e. Anku di zimanên romî de Z li cihê navê hejmara 10 tê bikaranîn lê di zimanên îranî de Z hevdem li gel paşgira "-de(h)" tê xebitandin. Herwiha di almanî de jî di navê hejmarên 13 – 19 de paşgira "-zehn" heye lê ev Z jî ne hevrehê Z-ya di dehgirên kurdî de ye lê veguherîna ji peyva "zehn" (10, deh) e.

Di kurdiya başûrî û hewramî de rewş bi piranî wek di soranî de ye.

Di zazakî de navê hejmarê 10 "des" e. Ew bi şiklekî neguherandî di navê hejmarê 11 de li kar e:

- yewen-des

Lê di navê hejmarên 12 – 19 de D di nemaye:

- duwês, hîrês, çarês, pancês, şîyês, hewtês, heştês, newês

Tarîxiyên "-des" di zazakî de bûye "*-yes" û taliyê jî bûye "-ês".

Dengê D ne tenê ji zimanên îranî beşa duyem ya navên hejmarên 11 – 19 ketiye. Bo nimûne, di zimanên romî de jî D-ya di peyva "-decim" ya latînî de nemaye: Bo nimûne:

- latînî "duodecim" û îtalî "dodici" lê spanî "doce", fransî "douze", portugalî "doze".

Sivikbûna dengên di 11 – 19 de

Wek ku li jor diyar bûye, navê hejmarên 11 – 19 di bingeh de ji navê hejmarên 1 – 9 û paşgira "-de(h)" pêk hatine lê çendîn guherîn tê de peyda bûne. Yek ji van guherînan jî sivikbûna dengên e, bi taybetî sivikbûna komên konsonantî lê herwiha diftongên "-ew-" û "-ey-" jî. Lê herwiha hin dengên tek jî ketine.

Di piraniya devokan de paşgira "-deh" bûye "-de":

- çar + deh → çarde

Dengê T di navê hejmarên 17 û 18 de ji komdengên -FTD- û -ŞTD- ketiye:

- heft + -de(h) → *heftdeh → hevde(h)
- heşt + -deh → *heştdeh → hejde(h) / hijde(h)

Komdengên -EY- di peyva devokî "heyşt" de di navê hejmarê 18 de bûye I yan Î:

- heyşt + deh → *heyştdeh → hijde(h) / hîjde(h)

Guherîna dengê E bi I

Di navê hejmarên 17 û 18 de di hin devokan de dengê E yê navê hejmarên 7 û 8 bûye I:

- heft → hivde
- heşt → hijde

Guherîna E bi I diyardeyeke giştî ya kurmancî ye. Bo nimûne farisî "kerden" û zazakî "kerdene" lê kurmancî "kirin" û soranî "kirdin". Guherîna E bi I dikare herwiha wek awayekî kurtbûnê yan sivikbûnê were hesibandin ji ber ku dengê E hinekî ji I dirêjtir an girantir e.

Lerzdarbûna dengên bêlerz

Di navê hejmara 7 de dengê F heye ku di navê hejmara beramberî wî dengê V heye. Di navê hejmara 8 de jî dengê Ş heye lê beramberî wî di navê hejmara 18 de J li kar e.

- heft → hevde (ne *hefde)
- heşt → hejde (ne *heşde)

Sebebê van guherînan dengê D yê bilerz anku lerzdar e. Ji ku D dengê bilerz e, ew herwiha dengên berê xwe dike bilerz. Loma F bûye V û Ş jî bûye J.⁴³

Yek ji tiştên balkêş ew e ku heta di soranî û hewramî de jî di navê hejmara 17 de V heye (hevde) tevî ku di navê hejmara 7 de di hewramî û piraniya devokên soranî de ne F lê W li kar e (hewt). Tarîxiyên navê hejmara 17 di van devokan de ne ji forma "hewt" lê ji serdemekê ye ku navê hejmara 7 di wan lehceyan de jî "heft" bû.

Di navê hejmara 16 (şazde[h]) de jî dengê Ş yê bêlerz yê dawiya navê hejmara 6 bûye Z ku dengê bilerz e. Lê bi ne mimkin e mirov bi esehî biryarê bide ka Ş-ya dawiya "şeş"ê bûye Z yan jî di bi awayekî din li wê hejmarê zêde bûye (bidin ber "sê > sê-z-de[h]") û ew Z bûye sebebê ketina Ş-ya dawiya "şêş"ê di peyva "şazde[h]" de.

Eger ji ber lertzê bûya, adeten Ş dê bûba J (*şajde[h]) lê ev form ne di kurdî û ne jî di ti zimanên din yê îranî de peyda nabe. Di zarên kurdî de bi awayên "şazde(h), şanzde(h), şanze" (ji bilî zazakî ku tê de "şîyês" e) û di farisî de jî "şanzdeh" e (bi devkî "şanzê").

⁴³ Binêrin: Tesîra lertzê li ser guherîna dangan: <https://zimannas.wordpress.com/2016/01/08/tesira-lerze-li-ser-guherina-dangan/>

6. DEHHEJMAR

Mebesta me ji peyva "dehhejmar" (dekad, bi inglîzî *decad*) navê hejmarên 20, 30, 40, 50, 60, 70, 80 û 90 e.

Li vê derê em ê navên van dehhejmaran bi zarên kurdî û hin zimanên din yên îranî û hindûewropî pêşkêş bikin. Dûv re em ê behsa çêbûna wan û taybetmendiyan wan bikin-

6.1. Dehhejmar di kurdî û zimanên lêzim de

Li vê derê em ê navên dehhejmaran di kurdî û hin zimanên lêzim de pêşkêş bikin û paşî behsa varyantên kurdî û herwiha awayê çêbûna navên van hejmaran bikin.

Bo dirêjnebûna tabloyê, ji varyantên devokî tenê yên kurmancî hatine rêzkirin û ji her zar û zimanên din tenê forma serdest hatiye dan.

zar/ziman	20	30	40	50	60	70	80	90
kurm. standard	bîst	sî	çil	pêncî	şêst	heftê	heştê	not
kurm. formên din	bîs	sih, sîh, si	çel, çal	pênca, pênci, pêncih, pêncêh, pîncî	-	-	heyştê	nod, newed, nehwêd, newhêd, nehwêt newhêd nehwêrt
soranî	bîs(t)	sî	çil	penca	şest	hefta	heştta	newe(t)
kurdiya başûrî	bîs	sî	çil	penca	şes(t)	hefta	heştta	newed
farisî	bîst	sî	çihil, çil	pencah	şest	heftad	heştad	neved
zazakî	vîst	hîris	çewres	pancas	şestî	heftay	heştay	neway
pehlewî	wîst	sîh	çihil	pençah	şest	heftad	heştad	newed
avestayî	vîseiti-	thrisete	çeth-verisete-	pença-seti-	xşû-esti-	hep-teyti	eş-teyti	neweyti
sanskritî	vimseti	trimset	çetvar-imset	pença-sat	sesti	septeti	esîti	neveti

rûsî ⁴⁴	dvad- sati	trîd- sati	sorok	pyati- dêsat	şêsti- dêsat	sêmi- dêsat	vosêmi- dêsat	dêvya- nosto
yûnanî ⁴⁵	êîkosî	triá- konta	tessará- konta	penté- konta	heksé- konta	hebdomé- konta	ogdoé- konta	enené- konta
latînî ⁴⁶	vîgintî	trîgintā	quadrā- gintā	quīnquā- gintā	sexā- gintā	septuā- gintā	octō- gintā	nōnā- gintā
fransî ⁴⁷	vingt	trente	qua- rante	cin- quante	soi- xante	septante	huit- ante	non- ante
îtalî	venta	trenta	quaran- ta	cinquan- ta	ses- santa	settanta	ottanta	novan- ta
spanî	veinte	treinte	cuaren- ta	cinquen- ta	sesen- ta	setenta	ochen- ta	noven- ta
inglîzî	twen- ty	thirty	forty	fifty	sixty	seventy	eighty	ninety
almanî	zwan- zig	dressig	vierzig	fünfzig	sech- zig	siebzig	achtzig	neun-zig

6.2. Varyantên dehhejmaran di kurdî de⁴⁸

Hemû dehhejmaran di kurdî de du yan zêdetir varyant hene. Di di nav kurmançî bi xwe de ne hemûyan lê hin dehhejmaran varyant hene. Em ê pêşî varyantan rêz bikin û paşî behsa belavbûna wan bikin. Dûv re jî em ê li zarên din yên kurdî binêrin.

Varyantên dehhejmaran di kurmançî de di tabloya li jor de hatine rêzkirin. Li vê derê em ê li ser belavbûna bikaranîna varyantan di devokên kurdî de û herwiha di zimanê nivîskî de rawestin.

20: Wek peyveke serbixwe, di kurmançî de tenê forma "bîst" wek navê vê hejmarê heye. Lê di axiftinê de, gava ku peyva li pey wê bi konsonantekê dest pê bike, hingê navê hejmara 20 wek "bîs" tê kurtkirin:

- bîst + kes > bîs(t) kes

⁴⁴ Hejmarnavên rûsî: https://en.wiktionary.org/wiki/Category:Russian_numerals

⁴⁵ Hejmarnavên yûnaniya kevn: https://en.wiktionary.org/wiki/Category:Ancient_Greek_numerals

⁴⁶ Hejmarnavên latînî: https://en.wiktionary.org/wiki/Appendix:Latin_cardinal_numerals

⁴⁷ Hejmarên fransî: Navê hejmarên 70 – 19 yên li vê derê tenê li hin deverên fransîaxiv li kar in. Li piraniya deveran navên din ji van hejmaran re hene ku li gor sîstemeke din hatine avakirin.

⁴⁸ Bo varyantên dehhejmaran li deverên cuda, binêrin vê suhbetê di koma "Zimanê Kurdî" de li ser Facebookê: https://www.facebook.com/groups/zimaneKurdi/1143502899040384/?notif_t=like¬if_id=1472367453916566

Di nivîsînê de herdem T-ya dawîya "bîst"ê di kurmancî de tê parastin.

Di soranî de hem forma "bîst" û hem jî ya "bîs" di axiftin û herwiha di nivîsînê de jî tên dîtin. Di kurdiya başûrî û di hewramî de bi piranî tenê forma "bîs" (ne "bîst") tê gotin.

Di zazakî de navê hejmara 20 "vîst" e ku V-ya kevnar parastiye ku di zarên din yên kurdî û di farisî de paşî bûye B (li jêrtir binêrin).

30: Navê hejmara 30 di piraniya devokên kurmanciya rojhilatî de "sih" e, di piraniya devokên kurmanciya navendî û rojavayî de jî "sî" ye. Herdu jî di zimanê nivîskî de tên bikaranîn lê forma "sî" zêdetir. Herwiha forma "sîh" jî carinan di nivîsan de tên dîtin lê bi esehî nayê zanîn ka ew bi rastî jî di nav xelkê de li hin deveran heye yan jî tenê hîperkorektî ye.⁴⁹

Di soranî, kurdiya başûrî û hewramî de forma serdest û belkî tekane "sî" ye. Di farisî de jî "sî" li kar e. Zazakî forma xwe ya kevnar "hîris" bi kar tîne (bo kevniya wê li jêrtir binêrin).

40: Navê hejmara 40 di piraniya devokên kurmancî de "çil" e û di zimanê nivîskî de jî bi piranî ev form tên xebitandin lê li hin deran forma "çel" jî jî tên bihîstin. Di hin devokên kurmanciya rojavayî de, ku E-ya kurmanciya giştî wek din jî dikin A, mirov dikare navê wê hejmarê bi awayê "çal" jî bibihîze.

Di soranî, kurdiya başûrî û hewramî de forma serdest û belkî tekane "çil" ye. Zazakî dîsa formeke cuda û kevnar ya bi awayê "çewres" dixebitîne.

50: Navê hejmara 50 di piraniya devokên kurmancî de "pêncî" ye û ev form di zimanê nivîskî de jî serdest e lê li hin deran herwiha formên wek "pênçe, pêncî, pêncih, pêncêh, pîncî" jî tên gotin.

Heta di kurmanciya rojhilatî de jî, ku ji hejmara 30 re dibêje "sih" anku li dawîya wê "-ih" heye, dîsa jî ji hejmara 50 "pêncî" tên gotin anku li dawiyê ne "-ih" lê "-î" li kar e. Bi gotineke din, devera bikaranîna forma "pêncih" ne wek ya forma "sih" berfireh e.

Di soranî, kurdiya başûrî û hewramî de forma serdest û belkî tekane "penca" ye. Di zazakî "pancas" e.

60: Di tevahiya kurmancî de navê hejmara 60 "şêst" e. Di soranî de ew bi awayê "şest" e (bi S-ya qelew wek "sed", berevajî kurmancî ku bi S-ya zirav wek "ser" e) lê herwiha forma bêyî T anku "şes"

⁴⁹ Bo hîperkorektiyê binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/hiperkorekti-anku-zede-rasti/>

(dîsa bi S-ya qelew) jî berbelav e. Di kurdiya başûrî û hewramî de bi piranî "şes" e: bi S-ya qelew û bêyî dengê T.

Di zazakî de li gor deveran dikare "şestî" yan jî "şestay" be. Bi ihtimaleke mezin "şestî" forma kevntir e û forma "şestay" li ber modela "heftay, heştay" paşgira "-ay" wergirtiye.

70: Di kurmancî de tek forma navê hejmara 70 "heftê" ye⁵⁰ (bi H-ya wek di navê "Hesen" de) lê belkî di hin devokên nêzîkî soranî de mirov dikare wê bi away "hewtê" bibihîze. Di soranî de forma serdest "hefta" ye lê formên "hewta" û pir hindik "hewe" jî peyda dibin. Di kurdiya başûrî û hewramî de jî "hefta" ye, bi zazakî jî "hewtay".

80: Di kurmancî de forma serdets û standard ya navê hejmara 80 "heştê" ye. Ew herwiha tek forma kurmanciya rojhilatî ye. Di kurmanciya navendî de li hin cihan forma "heyştê" peyda dibe li wan deveran ku navê hejmara 8 "heyşt" e. Di kurmanciya rojhilatî de H-ya peyva "heştê" wek H-ya di navê Hesen de ye lê di kurmanciya navendî de bi H-ya wek di peyva "heval" de ye.

Di soranî û hewramî de navê hejmara 80 "heştay" ye, di kurdiya başûrî de li hin deveran "heştay" û li hinan jî "heyştay" ye. Di zazakî de navê wê "heştay" e.

90: Hejmara 90 di kurmancî de ji hemû dehhejmaran û belkî ji hemû hejmarên din jî zêdetir xwedî varyantên cuda ye. Forma serdest û standard "not" e lê herwiha varyanta "nod" jî bi berfirehî di nivîsînê de tê dîtin. "Not" an "nod" li hemû deverên kurmanciya navendî û rojavayî li kar in. Di kurmanciya rojhilatî de jî li Behdînan "not" tê gotin. Lê bakur-rojhilatê deverên kurmancîaxiv (Urmiye, Agirî, Wan, Hekarî, Erzirom...) yek an çend ji van forman li kar in: nehwêt/nehwê, newhêt/newhêd, newêt/newêd. Li hin deverên Hekariyan heta formeke bi R jî heye: nehwêrt/nehwêrd. Ev R di ti zarên din yê kurdî yan zimanên din yê îranî de di navê vê hejmarê de nîne û peydabûna vî dengî di navê hejmara 90 de bi temamî tiştekî nepayî û surprîz e.

Di soranî de forma "newet" tê bikaranîn lê li hin deran T-ya dawiyê nayê gotin anku dibe "newe". Di kurdiya başûrî de forma serdest û belkî tekane jî "newed" e. Di zazakî de peyva "neway" wek navê vê hejmarê tê gotin.

⁵⁰ Carinan ew bi forma "hevtê" were nivîsîn jî, ew tenê şaşiya nivîsînê ye ji ber ku V-ya bilerz û T-ya bêlerz nakevin pey hev.

6.3. Çêbûna dehhejmarên kurdî

Di hin zimanan de navê dehhejmaran bi aşkerekî ji navê hejmarên 1 – 9 + navê hejmara 10 tên çêkirin. Bo nimûne, bi zimanê fîlandî anku fînî:

- kaksi (2) + kymmenen (10) > 20 kaksikymmentä (peyva "kymmentä" formeke çemandî ji peyva "kymmenen" anku 10 e)
- kolme (3) + kymmenen (10) > 30 kolmekymmentä
- neljä (4) + kymmenen > 40 neljäkymmentä
- viisi (5) + kymmenen > 50 viisikymmentä

Mirov dikare dehhejmarên fîlandî wisa heta 90ê bidomîne.

Di hin zimanên din de, wisa dixuye ku ti têkiliya navê dehhejmaran (10, 20, 30...) bi tilhejmaran ve nîne. Bo nimûne, bi tirkî:

- 2 "iki" ye lê 20 "yirmi" ye
- 3 "üç" e lê 30 "otuz" e
- 4 "dört" e lê 40 "kırk" e
- 5 "beş" e lê 50 "elli" ye

Kurdî û piraniya zimanên din yê hindûewropî di vê meseleyê de ne bi tamamî wek fîlandî û ne jî wek tirkî ne: ji piraniya dehhejmaran diyar e ku ew bi awayekî têkilî tilhejmaran in⁵¹ lê herdem ne zelal e ka çawa dehhejmar ji tilhejmaran hatine çêkirin.

Bo nimûne, mirov dikare bibîne ku ji bilî navên hejmarên 10 û 20, navên hemû dehhejmarên din bi eynî dengê tilhejmara beramber dest pê dikin:

Tilhejmar	Dehhejmar
sê	sî
çar	çil
pênc	pêncî

⁵¹ Di tirkî de jî gava ku mirov digihe dehhejmara 60 û dehhejmarên mezintir, mirov dibîne ku ew têkilî tilhejmarên beramberî xwe ne lê ew jî wek kurdî ne bi ti paşgireke herdem wek hev tên çêkirin: 6/60 altı/ altmış, 7/70 yedi/ yetmiş, 8/80 sekiz/seksen, 9/90 dokuz/doksan.

şêş	şêst
heft	heftê
heşt	heştê
neh	not

Wek ku tê dîtîn, dengê wan yê destpêkê eynî ye lê ti paşgireke diyar nîne ku herdem dehhejmar pê ji tilhejmarê were çêkirin. Heta carinan di tilhejmar û dehhejmara beramberî wê de hejmara deng eynî ye tevî ku deng bi xwe ne heman deng bin jî:

- sê / sî
- çar / çil
- neh / not

Mirov dikare dengê î yê di peyva "pêncî" de wek paşgirekê bihesibîne ku pê "pêncî" ji "pênc"ê hatiye saz kirin lê ew heman deng nakeve pey hejmarên din û pê ti dehhejmarên din ji tilhejmaran çênake. Lê belkî mirov wisa bikare hesab bike ku heman deng di peyva "sî" de jî hebe ku ji "*sê-î" kurt bûbe û tenê wek "sî" mabe.

Paşgira "-ê" dehhejmarên "heftê, heştê" ji tilhejmarên "heft, heşt" çêdike lê ew jî di saz kirina dehhejmarên din de beşdar nabe.

Sebebê tinebûna ti paşgireke aşkera ya avakirina dehhejmaran di kurdî de ew e ku dehhejmarên kurdî pir kevn in û bi demê re kurt bûne û ti paşgireke zelal ya giştgir (komprehensîv) ji wan re nemaye. Eger mirov li navê dehhejmarên kurmançî û hevwateriyên wan yê bi zimanên kevn yê îranî û hindûewropî binêre, mirov dê bi hêsanî bibîne ku ew di kurdî de pir hatine sivikkirin û kurt kirin.

Bo nimûne, em dehhejmarên kurmançî bidin ber yê avestayî, sanskrîtî û latînî:

- kurmançî: bîst, sî, çil, pêncî, şêst, heftê, heştê, not
- avestayî: vîseiti, thrisete, çethverisete, pençaseti, xşûesti, hepteyti, eşteyti neweyti
- sanskrîtî: vimseti, trimset, çetvarimset, pençasat, sestî, septeti, esîtî, neveti
- latînî: vîgintî, trîgintâ, quadrâgintâ, quînuâgintâ, sexâgintâ, septuâgintâ, octôgintâ, nônâgintâ

Kurtbûna dehhejmaran di kurmançî de berçav dibe heta eger mirov wê bide ber zar û zimanên nêzîk jî. Bo nimûne:

- kurmançî: bîst, sî, çil, pêncî, şeşt, heftê, heştê, not
- zazakî: vîst, hîris, çewres, pancas, şeştî, hewtay, heştay, neway
- farisî: bîst, sî, çehel, pencah, şest, heftad, heştad, newed

Li vê derê em ê hewl bidin yek bi yek dehdehjarên kurdî bi hevrehên wan yên zimanên din yên hindûewropî ve girê bidin û diyar bikin ku tevî guherînên pir mezin jî di navbera wan de (bo nimûn kurmançî "bîst" û inglîzî "twenty"), ew di rastiyê de ji eynî navên makezimanê proto-hindûewropî û ji navê hejmarên 2 – 9 peyda bûne:

20: Navê hejmarê 20 di kurmançî û farisî de "bîst" e. Di soranî de dikare "bîst" an jî "bîs" be, di kurdiya başûrî "bîs" e. Lê di navê vê hejmarê de dengê destpêkî di piraniya zimanên hindûewropî de ne B ye lê V yan W ye: zazakî "vîst", pehlewî "wîst", avestayî "vîseyti", sanskrîtî "vimseti", latînî "vîgintî", fransî "vingt"... Em ji dengnasiya dîrokî ya kurdî û farisî baş dibînin ku V di gelek peyvan de bûye B. Bo nimûne, kurmançî "ba, baran, berf/befr" û farisî "bad, baran, berf" lê zazakî "va, varan, vewre", avestayî "vate-, vare-, vefre-" û sanskrîtî "vate-, var, gebhre-".

Gava ku mirov li navê hejmarê 20 bi rûsî "dvadsati", bi inglîzî "twenty" yan bi almanî "zwanzig" dinêre, dibîne ku dengê hê berî dengê V/W jî di navê vê hejmarê de heye. Gava ku mirov navê hejmarê 20 bi van zimanan bide ber navê hejmarê 2 bi heman zimanan, mirov bi hêsanî dibîne ku eynî deng di herduyan de hene:

- rûsî "dva" (2) û "dvadsati" (20)
- inglîzî "two" (2) û "twenty" (20)
- almanî "zwei" (2) û "zwanzig" (20)

Lê ev dengê destpêkê – ku di makezimanê hindûewropî de DW- bû – di piraniya zimanên hindûewropî de di navê hejmarê 20 de tenê V jê maye û V jî paşî di kurdî û farisî de bûye B.⁵²

Anku têkiliya hejmarê "bîst" jî bi hejmarê "du" re heye tevî ku niha ew wisa ji hev dûr ketine ku êdî ti dengên wan naşibin hev. Li aliyekî din, pêşgira navneteweyî ya ji latînî "bî-, bi-" ya bi wateya "du" pir dişibe navê hejmarê "bîst": "bisiklêt" (duçerxe), "biskiwît", "biyena" (pêşangeha ku her du salan carekê tê sazkirin), "bîlateral" (peymanên dualî), "bîseksuel" (kesa/ê ku hem ji jinan û hem jî ji mêran

⁵² [https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/dwi\(h%E2%82%81\)d%E1%B8%B1m%CC%A5ti](https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/dwi(h%E2%82%81)d%E1%B8%B1m%CC%A5ti)

hez dike)... Di devokên kurdî de ew dikare herwiha wek "pi-" (piskêt, pisiqlêt) yan "bay-, pay-" (baysikil, paysikil) were gotin.

30: Navê hejmarê 30 di kurdî (sî, sih – ji bilî zazakî), farisî (sî) û pehlewî (sîh) de ji navê heman hejmarê bi zimanên din yê lêzim dûr dixuye, bo nimûne zazakî "hîris", avestayî "thrisete", sanskrîtî "trimset", inglîzî "thirty" yan fransî "trente". Lê çawa ku navê hejmarê 30 bi kurdî pir dişibe navê hejmarê 3, wisa di van zimanên din de jî navê hejmarê 30 dişibe navê hejmarê 3 bi wan zimanan.

Sebebê guherînên mezin yê navbera "sî, sih" ya kurmançî li gel "thrisete" ya avestayî yan "thirty" ya inglîzî ew e ku TH di nav zimanan de nîşana S-ya "fis" anku S-ya navdidanî ye, wek dengê ث yê zimanê erebî ku di peyvên ji erebî hatî de di kurdî û farisî de adeten jî dibe S (carinan dibe T). Cudahiyêke din jî ew e ku R ji navê hejmarê 30 di kurdî û farisî de ketiye, wek çawa ku ew di navê hejmarê 3 de jî ketiye. Herwiha S-ya wek di "thriSete" ya avestayî de jî bûye H, wek çawa ku di navê hejmarê 10 de jî di avestayî û zazakî de S heye (avestayî "dese-", zazakî "des") lê di kurmançî, pehlewî û farisî de bûye H (sîh, sih)⁵³ û taliyê bi temamî ketiye "sî".

Di zazakî de rêbazeke din di navê vê hejmarê de hatiye bijartin. TH nebûne S lê T ketiye û H maye: avestayî "thristete", zazakî "hîris".

40: Navê hejmarê 40 li gel navê hejmarê 4 di kurdî û zimanên din jî yê îranî bi heman herfa Ç dest pê dike: bi kurmançî "çar" û "çil" (li gel varyanta devokî "çel" û ya pir devokî "çal"). Tevî ku di gelek zimanên din yê hindûewropî de navê hejmarê 40 ne bi Ç dest pê dike lê di piraniya wan de navê hejmarê 4 û ya 40 bi heman dengî dest pê dikin: bo nimûne 4/40 bi inglîzî "four/forty", almanî "vier/vierzig", fransî "quatre/quatante"...

Gava ku mirov "çil" ya kurmançî dide ber "çethverisete-" ya avestayî yan jî "çetvarimset" ya sanskrîtî, bi zelalî tê dîtîn ku di kurdî de kurtbûneke pir mezin peyda bûye. Bo ku mirov bibîne ku çawa "çil" ya kurmançî ji tişteke kevnar ya wek "çethverisete-" ya avestayî yan "çetvarimset" ya sanskrîtî peyda bûye, mirov dikare ji bi xeyalî ji avestayî dest pê bike, paşî were forma zazakî, paşî ya farisî û dawiyê jî ya kurmançî û soranî:

⁵³ Bi heman awayî di farisî de "masî" bûye "mahî" û "asin/hesin" bûye "ahen". Ev diyardeya guherîna S bi H zêdetir taybetmendiyêke zimanê farisî ye û di kurdî de tenê di navê hejmaran de wisa lê hatiye.

- avestayî "çethverisete-" > zazakî "çewres" > pehlewî "çihil" > farisî "çihil / çil" > kurdî "çil / çel".

50: Navê hejmara 50 bi kurmancî "pêncî" (li gel varyantên xwe) bi zelalî bi navê hejmara 5 "pênc" ve têkildar e. Ew herwiha pir dişibe navê hejmara 50 bi zarên din yên kurdî û zimanên din yên îranî jî: soranî û kurdiya başûrî "penca", farisî "pencah", pehlewî "pençah", zazakî "pancas", avestayî "pençaseti", Li derveyî zimanên îranî, di sanskrîtî de "pençasat", di rûsî de "pyatidêsat" û di yûnaniya kevn de "pêntêkonta" jî dişibin navê hejmara 50 bi kurdî. Di inglîzî de "fifty" yan di almanî de "fünfzig" êdî kêrmanî dişibin kurdî "pêncî" lê dîsa jî gava ku mirov jihevdirketina navê hejmarên 5 di van zimanan de wek ku li jor behs kirî bîne bîra xwe, mirov dê zû pê bihesse ku peyvên ji heman rehî ne. Bi heman awayî "cinquante" ya fransî gelek ji "pêncî" ya kurdî dûr dixuye û belkî wisa were texmînkirin ku ti têkiliya etîmolojî di navbera wan de nîne. Lê dîsa eger em li jortir li navê hejmara 5 di van herdu zimanan de binêrin û li etîmolojiya wan ya li jor behs kirî vegerin, em ê bibînin ku ew peyvên ji eynî rehî ne.

60: Navê hejmara 60 di kurmancî û zimanên din jî yên hindûewropî de bi zelalî têkilî navê hejmara 6 e. Di heman demê de, di piraniya zimanên hindûewropî de navê hejmara 60 pir nêzîkî hev maye: kurmancî "şêst", soranî û kurdiya başûrî "şes(t)", farisî û pehlewî "şest", zazakî "şestî", sanskrîtî "sesti", spanî "sesenta", inglîzî "sixty"...

70: Navê hejmara 70 jî di hemû zimanên hindûewropî de têkilî navê hejmara 7 e. Di zimanên îranî de destpêka wê wek hev e lê dawîya wê li gor zar û zimanan diguhere: kurmancî "heftê", soranî û kurdiya başûrî "hefta", zazakî "heftay", farisî û pehlewî "heftad", avestayî "hepteyti-". Di piraniya zimanên din yên hindûewropî de navê vê hejmarê ne bi H lê bi S dest pê dike: sanskrîtî "septeti", latînî "septuāgintā", fransî "septante", inglîzî "seventy"... Di makezimanê proto-hindûewropî de li destpêkê bi rastî jî S hebû ku di zimanên îranî de di vê û di gelek peyvên din de jî bûye H (bo vê meseleyê li jortir li etîmolojiya peyva "heft" binêrin).

Wek ku ji navê vê hejmarê bi avestayî, sanskrîtî, latînî û fransî diyar dibe, di navê hejmara 70 de du T hebûne ku di hin zimanên îranî de ya dūvretir bûye D (farisî û pehlewî "heftad") lê di kurdî de bi tamamî ketiye (kurmancî "heftê", soranî "hefta") yan jî nerm bûye û bûye Y (zazakî "heftay"). Ketina T/D ya paşvokalî (li pey vokalekê) di kurdî de diyardeyeke berbelav e. Bo nimûne, farisî "bad, bûden, daden" lê kurdî "ba, bûn/bûyîn, dan/dayîn".

80: Navê hejmara 80 jî dîsa di kurmancî (heştê, heyştê) û piraniya zar û zimanên din yê hindûewropî de bi zelalî dişibe navê hejmara 8 (heşt, heyşt). Di zimanên îranî de navê hejmara 80 bi zelalî ji eynî rehî ye: kurmancî "heştê, heyştê", soranî û kurdiya başûrî "heştâ", zazakî "heştay", farisî û pehlewî "heştad", avestayî "eşteyti" (H li destpêka vê hejmarê tine bû, paşî di bin tesîra peyva "heft" de li peyva "heşt" zêde bûye û wisa li navê hejmara 80 jî di gelek zimanên îranî de zêde bûye).

Di sanskrîtî de jî hê bi şiklê xwe nêzîkî zimanên îranî maye "estîti". Di zimanên din yê hindûewropî de ji navê hejmara 80 bi kurdî dûr dixuyin, bo nimûne latînî "octōgintā" yan inglîzî "eighty" (bixwînin: êytî) lê dîsa jî ji eynî rehî ne (bo zêdetir agahiyan li etîmolojiya navê hejmara 8 binêrin).

90: Navê hejmara 90 wek navê hejmara 9 jî di piraniya zimanên hindûewropî de bi N dest pê dike. Wek din jî navê wê di piraniya zimanên ewropî de kêm-zêde dişibe hev tevî ku bi taybetî di kurmancî de, bi formên xwe yê serdest "not" û "nod" navê wê pir kurt bûye: kurmancî "not, nod, nehwet..." (li jortir binêrin), soranî "newe(t), kurdiya başûrî "newed", zazakî "neway", farisî "neved", pehlewî "newed", zazakî "neweyti", sanskrîtî "neveti", spanî "noventa", latînî "nōnāgintā", fransî "nonante", inglîzî "ninety"...

6.4. Dehhejmar li gel tilhejmaran

Di kurdî de gava ku dehhejmarên 20 – 90 li gel tilhejmaran (1 – 9) tên bikaranîn, pêşî dehhejmar tê, paşî peyvika "û" dikeve navberê û li dawiyê jî tilhejmar heye:

- 21: bîst û yek
- 46: çil û şeş
- 72: heftê û du

Ev peyvrêziya hejmarên hemû zarên kurdî û herwiha ya farisî ye jî. Anku di wan hemûyan de pêşî dehhejmar, paşî peyvika "û" (yan varyanteke wê li gor lehceyan) û li dawiyê tilhejmar cih digire.

Di gelek zimanên din de jî peyvrêziya dehhejmar û tilhejmaran bi hev re wiha ye anku dehhejmar pêşî û tilhejmar jî paşî tên lê di gelek zimanan de hevwateriya peyvika "û" nayê navbera wan. Bo nimûne:

- inglîzî: 21 twenty-one (ne "*twenty-and-one")
- tirkî: 21 yirmi bir (ne "*yirmi ve bir")

Di hin zimanên de hevwatera peyvika "û" tê bikaranîn lê îcar peyvrêzî berevajî ya kurdî ye anku tilhejmar berî dehhejmaran tîn. Bo nimûne:

- erebî: 21 waḥid we 'iṣrûn (peyv bi peyv: "yek û bîst")
- almanî: 21 einundzwanzig (< ein und zwanzig – peyv bi peyv: yek û bîst)

Di zimanên kevn yê îranî de (bo nimûne di avestayî de) jî peyvrêzî wek erebî û almanî bû:

- avestayî: 21 eêwe çe viseyti (peyv bi peyv: "yek û bîst")

Di hin zimanan de hem peyvrêzî berevajî ya kurdî ye û hem jî hevbera peyvika "û" nayê bikaranîn. Bo nimûne:

- hindî: 21 ikk-îs (peyv bi peyv: yek-bîst)

Ev heman peyvrêzî û tinebûna Û di navbera tilhejmar û dehhejmaran de ji xwe di navê hejmarên dehgir 11 – 19 yê kurdî de heye (li jortir li beşa li ser dehhejmaran binêrin).

7. SEDHEJMAR

7.1. Hejmara 100

Navê hejmara 100 di kurmancî, soranî, kurdiya başûrî û hewramî de **sed** e lê carinan D-ya li dawîya wê dikare wek T were bihîstin. Di zazakî de se ye anku bêyî D-ya dawiyê ye. Di hemû lehceyên kurdî de ew bi S-ya qelew (ص) tê gotin.

Hevrehên peyva "sed" di hemû zimanên îranî û di zimanên hindûewropî yê Hindistanê de dişibin "sed"ê: farisî û pehlewî "sed", avestayî "sete-", sanskrîtî "sete-", hindî û urdûyî "sew". Di zimanên balto-slavî de jî ew hê dişibe "sed" a kurdî: rûsî û piraniya zimanên din yê slavî "sto", latviyayî "simts", lîtwanî "šimtas".

Di zimanên romî yê niha de jî adeten wek kurdî bi dengê S dest pê dike: fransî "cent" (bixwînin [sant, san]), spanî "ciento, cien" (bixwînin: siyênto, siyên), portugâlî "cem" (bixwînin: sêm) lê îtalî "cento" (bixwînin: çênto).

Ev peyvên zimanên romî ji latîni "centum" peyda bûne ku wek "kêntûm" dihat gotin. Bi eslê xwe di makezimanê hindûewropî de di navê vê hejmarê de ne S lê K dengê destpêkê bû ku di zimanên îranî-hindî de di vê peyvê û gelek peyvên din de jî adeten bûye S.

Maka peyva "sed" û hevrehên wê di zimanên din jî yê hindûewropî de 100 bi proto-hindûewropî *k̑mtóm yan *d̑k̑mtóm bû ku ji peyva *dék̑m (deh, 10) hatiye çêkirin. Piştî gelek guherînên mezin, peyvên wisa pir ji hev cuda lê hevwate yê wek "sed" ya kurdî û "hundred" ya inglîzî jî jê peyda bûne (K-ya proto-hindûewropî di zimanên îranî de dibe S û di zimanên germeî de, ku inglîzî jî jê ye, dibe H).⁵⁴

Hêjayî gotinê ye ku navê hejmara 100 hê ji mêj ve ji zimanên hindûîranî (bo nimûne ji sanskrîtî yan avestayî) derbazî zimanên uralî bûye:

- estonî: sada
- fînlandî: sata
- mecarî/hungarî: száz (bixwînin: saz)

7.2. Sedhejmarên din

Navên sedhejmarên mezintir anku 200 – 900 ji navê tilhejmarên beramber û peyva "sed" tên çêkirin:

- dused, sêsed, çarsed, pêncsed, şeşsed, heftsed, heştсед, nehsed

Hêjayî gotinê ye ku peyvika "û" – ku wek din dikeve navbera gelek hejmaran – di çêkirina sedhejmaran de nayê bikaranîn:

- 300: sêsed (ne "sê û sed" – "sê û sed" dibe du hejmarên ji hev serbixwe anku "3 û 100").

Di gotina bi devkî de komên 3-konsonantî tên sivikkirin û konsonanta navîn tê avêtin:

- pêncsed > pênsed
- heftsed > hefsed
- heştсед > heşsed

Herwiha Ş-ya berî S di navê hejmara 600 de jî adeten nayê gotin yan jî dibe S:

⁵⁴ <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/%E1%B8%B1m%CC%A5%C3%B3m>

- şeşsed > şesed, şessed

Di hin devokan de (bi taybetî di kurmanciya navendî de lê ne di kurmanciya rojhilatî de) peyva "sed" wek paşgira sedhejmaran dikare bibe "-sid":

- dusid, sêsid, çarsid...

Ji bilî E-ya peyva "sed", herwiha E-ya hejmarên "heft" û "heşt" jî dikare di gotina sedhejmaran de bibe I:

- hifsed, hifsid
- hişsed, hişsid

Di kurdî de sedhejmarên 200 – 900 li gor qeyd û bendên giştî yê "tilhejmar + -sed / -sid" tên çêkirin û formên kevna yê hindûewropî nemane.

Di gelek zimanên din jî yê hindûewropî de rewş niha wisa ye lê di hin zimanan de hê jî navekî taybet bo hejmara 200 heye, bo nimûne farisî "divîst" û rûsî "dvêstî" lê kurdî "dused", fransî "deux cents" û inglîzî "two hundred". Anku di kurdî, farisî û inglîzî de navê hejmara 200 yekser ji navê hejmarên 2 û 100 tê çêkirin (di fransî de S-ya pirhejmariyê jî li peyva "cent" anku "sed" hatiye zêdekirin) lê di rûsî û farisî de navekî taybet bo hejmara 200 heye ku ne yekser ji navê hejmarên 2 û 100 hatiye çêkirin.

Di farisî û rûsî de heta navekî kevna yê bo hejmara 300 jî heye: rûsî "trîsta", farisî "tîrist"⁵⁵ lê ev peyv êdî di farisî de nayê bikaranîn û wê cih daye "sîsed" ya dîsa li gor qalibê "tilhejmar + sed".

Tevî navên taybet bo hejmarên 200 – 300 (di rûsî de herwiha 400) jî, dîsa farisî û rûsî jî bo çêkirina navên sedhejmarên mezintir dîsa formûla "tilhejmar + 100" bi kar tînin.

7.3. Sedhejmar li gel dehhejmar û/yan tilhejmaran

Gava ku hejmara "sed" yan jî sedhejmareke din (dused, sêsed, çarsed...) li gel dehhejmar û tilhejmaran yan jî yekê ji van herduyan tê bikaranîn, di kurdî de pêşî sedhejmar, paşî dehhejmar û li dawiyê jî tilhejmar tê. Di kurdî de "û" dikeve navbera her yekê ji van desteyên hejmaran:

⁵⁵ <http://parsî.wiki/dehkhodaworddetail-838b0008bf3546b6af2ec8e3d3c0cefd-fa.html>

- 101: sed û yek
- 110: sed û deh
- 120: sed û bîst
- 222: dused û bîst û du

Eger hejmarên dehgir li gel sedhejmaran werin bikaranîn, hingê "û" dikeve navbera sedhejmar û dehgiran lê di dehgiran bi xwe de "û" nayê bikaranîn:

- 214: dused û çarde(h) (ne "*çarsed û çar û deh")

Lê devokên ku hejmarên 11 – 19 bi awayê "deh + tilhejmar" bin av dikin, hingê jî "û" bi kar tînin:

- 111: sed û deh û yek [sed û dewyek]
- 214: dused û deh û çar [çarsed û dewçar]

Di hin zimanan de hevbera "û" di van rewşan de qet nayê bikaranîn. Bo nimûne:

- tirkî: 212: iki yüz yirmi dört (peyv bi peyv: "du sed bîst çar")

Di hin zimanan de hevbera "û" di navbera hin desteyan de tê bikaranîn lê ne di navbera hemûyan de. Bo nimûne:

- inglîzî: 214 two hundred and twenty-four (peyv bi peyv: "du sed û bîst-çar")

Di hin zimanan de peyvrêza desteyên hejmaran ji ya kurdî hinekî cuda ye. Bo nimûne, di erebî de jî wek di kurdî de sedhejmar berî dehhejmar û tilhejmaran tê lê – berevajî kurdî – di erebî de tilhejmar berî dehhejmarê tê:

- kurdî: 125 sed û bîst û pênc (sedhejmar û dehhejmar û tilhejmar)
- erebî: 125 mîe we xemse we 'işrûn (peyv bi peyv: "sed û pênc û bîst" anku "sedhejmar û tilhejmar û dehhejmar")

8. HEZARHEJMAR

8.1. Hezar

Navê hejmara 1000 di piraniya kurmançî û lehceyên din yê kurdî de "hezar" e. Di kurmançiya rojhilatî de ew bi awayê "hizar" tê gotin. Di zazakî de li gel forma serdest "hezar", herwiha varyantên "henzar, hazar" jî peyda dibin.

Di kurmançiya rojhilatî û herwiha di soranî û kurdiya başûrî û farisî de ew bi H-ya wek di peyva "heval" de tê gotin (هـ) lê di kurmançiya navendî de ew bi piranî bi H-ya wek di peyva "heft" yan navê "Hesen" (ح) de tê bilêvkirin.

Peyva "hezar" di zimanên din jî yê îranî de bi zelalî hevrehê "hezar" ya kurdî ye: farisî û pehlewî "hezar", avestayî "hezengre-". Lê hevrehên peyva "hezar" herwiha di zimanên hindûewropî yê Hindistanê de jî hene: sanskrîtî "sehesre", hindî û urdûyî "sehesr".⁵⁶

Li derveyî zimanên hindî-îranî, di zimanên din de peydakirina hevrehên peyva "hezar" be hêsan e û biguman e. "Sehesre" ya sanskrîtî û "hezengre" ya avestayî (û wisa be "hezar" ya kurdî û farisî jî) bi "mille" (hezar) ya latînî û "xîlîoi" (hezar) ya yûnaniya kevn ve girê didin û hemûyan vedigerînin peyveke proto-hindûewropî ya wek *smih₂ǵ^héslih₂ ya bi maneya "destê tijî" anku "deh tilî" (deh daran sed)⁵⁷ lê hin kes jî ji rastiya vê biguman in û dibêjin ku ihtimalen berî ku zimanên proto-hindûewropî ji hev veqetin, ti navek ji hejmara 1000 re di wan de peyda nebûbû yan jî çend navên deverkî hebûn loma di piraniya zimanên hindûewropî de navê hejmara 1000 ne ji peyveke proto-hindûewropî ya hevpar e.

Peyva îranî "hezar" bi rêya farisî ketiye piraniya zimanên Başûrê Asyayê û di hindî, urdûyî, bengalî û gelek zimanên din de cihê "sehesr" ya wan zimanan jî girtiye. Heman peyv bi rêya zimanekî îranî, ihtimalen pehlewî yan partî, ketiye ermeniya kevn û niha di ermeniya nû de jî li kar e.

8.2. Hezarhejmarên din

Navê hezarhejmarên ji 1000ê li gor qalibê "hejmar + hezar" tên çêkirin:

- du hezar
- sê hezar
- heft hezar

⁵⁶ Binêrin bo nimûne: <https://en.wiktionary.org/wiki/सहस्र>

⁵⁷ Bo nimûne: <https://en.wiktionary.org/wiki/mille#Latin>

- neh hezar
- bîst hezar
- sed hezar
- sêsed hezar

Di hezarhejmaran de komên konsontî carinan tên sivikkirin:

- "heft hezar / hizar > hef hezar / hizar"
- "bîst hezar / hizar > bîs hezar / hizar"

Lê bo nimûne hejmara "pênc" bi "hezar"ê re nayê sivikkirin:

- "pênc hezar" nabe "*pên hezar" (bidin ber "pêncsed > pênsed")

9. HEJMARÊN DIN

Navên hejmarên 1 – 1000 di kurdî, zimanên din yê îranî û piraniya zimanên din yê ewropî de jî peyvên xwemalî ne û bi hezaran salan e ku di wan zimanan de li gor şert û mercên her zimanî cihê xwe girtiye. Berevajî wan, navê hejmarên mezintir û herwiha navê hejmara 0 jî di kurdî û piraniya zimanên din yê dinyayê de bi rêjeyî û nisbî nû ne (ne gelek kevntir ji 1000 salan) û di piraniya zimanan de herwiha peyvên bi eslê xwe biyanî û wergirtî yan "deynkirî" ne. Sebebê vê ew e ku ne zêde demeke dûr û dirêj e ku li aliyekî behsa hejmarên mezin (bo nimûne "milyon, milyar") tê kirin û li aliyê din jî bikaranîna sîstema sifirê (0) di çêkirina hejmarên deharî de ne gelek kevn e.

Di vê beşa vekolîna xwe de em ê mijarê li ser sê beşan parve bikin:

- navê hejmara 0 û dîroka wê û dîroka wê
- navê hejmarên mezin: milyon, milyar...
- navê hejmarên nadir: bêwer, lek, korûr...

9.1. Navê(n) hejmara 0

Bi kêmi nêzîkî 4000 heta 5000 salan e ku di zimanên hindûewropî de nav bo hejmarên 1 – 100 û belkî herwiha hejmara 1000 jî hebûne. Lê ne demeke pir dirêj e ku mirovan fehm kiriye ku sîstema 0 bi kar bînin û bi wê hejmaran dehcarî, sedcarî, hezarcari û hwd. bikin:

- yek/1 û 0 = deh/10
- 10/deh û 0 = sed/100
- 100/sed û 0 = hezar...

Yekem car ev awayê bikêrhatî li Hindistanê hatiye fehmkirin û bikaranîn. Di heman demê de yekem car 0 wek hejmar hatiye hesibandin. Di zimanê zanistî yê wê demê yê Hindistanê de anku di sanskrîtî de navê "sûnye" li vê hejmarê hatiye kirin ku maneya wê ya bingehîn "vala, xalî, bêpar, tine" bû.⁵⁸

Paşî misilmanan li Serdema Navîn anku piştî destpêka îslamê ev sîstem ji Hindistanê anî Rojhilata Navîn û navê wek *şifr* صفر li erebî wergerand ku maneya wê jî ya eslî wek ya "sûnye" ya sanskrîtî "vala, xalî, bêpar, tine" ye.

Peyva "sifr, sifir" ne tenê di erebî de heta niha jî li kar e lê ew herwiha bûye navê hejmara 0 bi piraniya zimanên din jî yê misilmanan (bo nimûne kurdî, farisî, tirkî, azerî, swahîlî...)

Lê peyva "sifr, sifir" tenê bi zimanên misilmanan ve sinordar nemaye. Ew bi rêya latîniya Serdema Navîn wek "zephirum" derbazî piraniya zimanên serekî yê ewropî jî bûye: spanî "cero" (bixwînin "sêro"), inglîzî, îtalî û almanî "zero", fransî "zéro".⁵⁹ Bi rêya zimanên ewropî peyva "zero" ya ji peyva "sifr" di sedsala bîstem de gihiştiye heta Japonyayê jî. Wê heta xwe gihandiye zimanê hindî jî anku wê deverê ya ku fikra sîstema vê hejmarê jê derketiye û peyva "sifr" jî li ber peyveke wê deverê hatiye çêkirin.

Peyva "sifir" vê dawiyê ji zimanên ewropî dîsa li Rojhilata Navîn jî vegeriye: Peyva "şifre" (hejmar, kod, reqem, parola) niha di kurdî de jî tê bikaranîn. Ew bi rêya tirkî "şifre" ji fransî "chiffre" hatiye lê fransî bi xwe ew ji îtalî "cifra" û îtalî ew dîsa ji erebî *şifr* صفر wergirtiye.

Di kurdî de peyva serdest û standard ya bi maneya 0 "sifir" yan "sifr" e (herdu jî bi S-ya qelew, ص).

⁵⁸ <https://en.wiktionary.org/wiki/%E0%A4%B6%E0%A5%82%E0%A4%A8%E0%A5%8D%E0%A4%AF#Sanskrit>

⁵⁹ http://etymonline.com/index.php?term=zero&allowed_in_frame=0

Hêjayî gotinê ye ku navê hejmara 0 bi nivîsînê pir dişibe navê du tiştên din: madenê "sifir, sifr" anku "mis, paxir, baxir" (bi inglîzî "copper", bi tirkî "bakır") û "sifre" anku "mase, mêze, xwarina danayî" lê S-ya navê hejmara 0 qelew e (ص) wek di peyva "sed" yan "se, seg" de û S-ya van peyvên din di kurmançî de zirav e (س) wek di peyva "ser" yan "sê".

Ji ber eslê erebî yê vê peyvê, hin kurdan hewl daye ku navekî din li vê hejmarê bikin. Çend ji peyvên pêşkêşkirî "nîn, tine, çine, çune, ti, çu, hîç" ne lê ti ji van ne hejmar in. Ti ji wan nehatine qebûlîkirin û piraniya reha û mitleq ya kurdan – wek piraniya dinyayê – li ser peyva "sifir, sifr" ya bi eslê xwe erebî berdewam in û dê berdewam bin.

Li aliyekî din, vê dawiyê navê hejmarên mezin wek "milyon, milyar, trilyon..." ji zimanên ewropî hatine nav zimanên Rojhilata Navîn û Hindistanê jî. Bi gotineke din, van hemû medeniyetan hem rola wergirtinê û hem jî ya diyarîkirinê di navên hejmaran de hebûye.

9.2. Navên hejmarên mezin

Navên di kurdî de berbelav yê hejmarên ji "hezar"ê mezintir hemû yan bi piranî di sedsala bîstem de (hinek belkî ne berî sedsala bîst û yekem) ji zimanên ewropî (adeten bi rêya tirkî, erebî yan farisî) ketiye kurdî.

Di piraniya – eger ne hemû – zimanan de navên hejmarên ji hezarê mezintir nû ne û navneteweyî ye û vê dawiyê zimanan ew ji hev (bi piranî ji du-sê zimanên ewropî) wergirtine.

Navê hejmara 1 000 000 bi kurdî adeten wek "milyon" tê nivîsîn lê dikare herwiha bi forma "mîlyon" jî di nivîsan de were dîtin. Kêm caran ew li ber tesîra zimanê erebî dikare wek "milyûn, melyûn" jî were gotin û herwiha bi forma xwe ya pirhejmar ya erebîkirî "melayîn" (bi milyonan) jî tê bihîstin.

"Milyon" bi rêya fransî yan inglîzî ketiye kurdî û zimanên din yê Rojhilata Navîn. Eslê peyvê bi xwe îtalî "millione" (bi îtaliya niha "milione") ye ku forma mezinkirî (augmentatîv) ji peyva "mille" (hezar) e. Anku "milyon" bi eslê xwe maneya "hezara mezin" yan jî "hezzaaar" dide.⁶⁰

Navê hejmara din ya mezin ya berbelav "milyar" e ku di kurdî de herwiha bi şilkê "mîlyar, milyard, mîlyard" jî tê dîtin û bihîstin. Ew navê hejmara 1 000 000 000 e. Navê vê hejmarê wek "milliard" di

⁶⁰ http://etymonline.com/index.php?allowed_in_frame=0&search=million

fransî de li ber modela "milyon" ya esil-îtalî bi guherandina paşgira "-ione" ya îtalî bi "-ard" ya fransî hatiye çêkirin.⁶¹

Ji bilî "milyon" û "milyar"ên berbelav, di kurdî de herwiha bo nimûne "trilyon" wek navên hejmara 10^{12} anku 1 000 000 000 000 hatiye qeydkirin:

- "Yedega gaza Şahdenîz bi 1.2 trîlyon metre sêga tê texmînkirin."⁶²

"Trilyon" wek "trillion" di fransî de ji "tri-" (sê) ya latînî yan yûnanî û paşgira di peyva "mi-lyon"ê hatiye çêkirin û ji fransî belavî zimanên din jî bûye.

Peyva "bilyon" carinan bi wateya "milyar" û carinan jî bi maneya "trilyon" hatiye xebitandin:

- "Îranê tenê 3 bilyon dolar ji pereyên xwe vegerandiye."⁶³

Peyva "bilyon" ji latînî "bis" (dubare, ducarî – wek di "bi-siklêt" anku "du-çerxe" de) û paşgira "-lyon" ya ji peyva "milyon" hatiye çêkirin.

Di hin nûçeyên aborî de herwiha mirov pêrgî hejmara bi navê "katrilyon" yan "katrîlyon" jî tê ku bi maneya hejmara 10^{15} anku 1 000 000 000 000 000 tê bikaranîn. Ew bi rêya tirkî ji fransî "quadrillion, quatrillion" hatiye ku ji latînî "quattuor" (çar) û beşa dawiya ya peyva "m-ilyon" hatiye çêkirin.

Navê hejmarên mezintir kêr bi kurdî hatine bikaranîn an jî heta niha qet nehatine xebitandin lê eger pêwîst be, dikarin bi hêsanî navên navneteweyî bî wergirtin.⁶⁴

Bikaranîna hejmarên mezin yê ji zimanên ewropî wergirtî li gel hejmarên biçûktir yê xwemalî li gor heman sîstema hejmarsaziya kurdî ye:

- Ew dikarin bi tilhejmarên kurdî bî mezintirkin: *milyonek, du milyon, deh milyar, sed û çil û şeş trilyon...*
- Gava ku hejmarên biçûktir li pey wan tî, bi alîkariya peyvika "û" lê zêde dibin: *milyon û sed hezar, çar milyar û pêncsed milyon û dused hezar...*

⁶¹ http://etymonline.com/index.php?term=milliard&allowed_in_frame=0

⁶² <http://rudaw.net/kurmanci/business/16012014>

⁶³ <http://orient-news.net/ku/newsshow/109616/0/K%C3%AAr%C3%AE-%C3%8Eran-ten%C3%AA-%C3%AA-bilyon-dolar-ji-perey%C3%AAn-xwe-vegerandiye>

⁶⁴ Mirov dikare li ser navên hejmarên mezin li vê derê bibîne: https://en.wikipedia.org/wiki/Names_of_large_numbers

9.3. Hejmarnavên nadir

Berî ku navên hejmarên mezin yê bi eslê xwe ji hin zimanên ewropî (milyon, milyar, trilyon...) peyda û belav bibin, navên hin hejmarên mezin ji Hindistanê belav bûbûn û gihiştibûn Rojhilata Navîn jî. Navê çend hejmarên hindistanî di hin berhemên kurdî de jî tên dîtin:

Bo nimûne, Ismaîl Fettah di kitêba xwe ya rêzimana kurdiya başûrî bi fransî⁶⁵ de dibêje ku mirov li cihê navê "sed hezar" herwiha peyva "luk / lok" jî dibîne lê ew peyv "li ba piraniyê winda bûye".

Di ferhenga kurdî-kurdî ya Celadet Bedirxan de peyva "kirûr" bi maneya "jimara 500 000, nîv milyon" hatiye dan.⁶⁶

Ev herdu hejmarnav jî bi eslê xwe ji Hindistanê ne. "Lok/luk" di rastiyê de "lak" yan "lakh" e û – wek ku Fettah jî gotiye – maneya "sed hezar" dide.⁶⁷ Lê berevajî ku Fettah dibêje, ew ne ji devê yan bîra piraniya kurdan winda bûye lê bi ihtimaleke pir mezin ti caran ji aliyê piraniya kurdan ve nehatiye bikaranîn jî. Fettah idia dike ku mirov peyva "lok" dibihîze lê nabêje ka li kû derê ew di kurdî de tê bihîstin.

Herçi "kirûr" e, ew jî ji Hindistanê ye û bi hindî û urdûyî bi awayê "keror" e. Ew wek navê hejmareke sîstema hejmartinê ya hindistanî bi şiklê "crore" ketiye inglîzî û hin zimanên din jî yê ewropî.

Lê berevajî ku di ferhenga Celadet Bedirxan de tê gotin, "kiror" ne "nîv milyon" (500 000) lê "deh milyon" e (10 000 000).⁶⁸ C. Bedirxan ti agahiyên li ser bikaranîna wê nade. Di rastiyê de wek din jî ti delîlên bikaranîna wê di kurdî de nînin.

Ji bilî hejmarên hindî, herwiha navekî taybet di zimanên îranî bi xwe de jî ji hejmara 10 000 anku "deh hezar" re he(bû)ye:⁶⁹

- farisî: bîver
- pehlewî: bîwer
- avestayî: beêweri...

⁶⁵ Ismaîl Kamandar Fattah: Les Dialectes Kurdes Méridionaux, 2001, rûpel 301. Bo peydakirinê bo nimûne: <https://www.amazon.com/Dialectes-Kurdes-Meridionaux-Linguistique-Dialectologique/dp/9042909188>

⁶⁶ Celadet Bedirxan: Ferheng. Avesta 2009, rûpel 184.

⁶⁷ https://en.wikipedia.org/wiki/Indian_numbering_system

⁶⁸ Heman çavkanî.

⁶⁹ <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Iranian/baiwar->

Lê ji vê hejmarê jî ti şûn û şop di kurdî de naxuye: yan nemaye yan jî ti caran tine bûye jî.

9.4. Wergirtina hejmaran di peyvên din de

Ji bilî navê hejmarên mezin, hin hejmarên din jî (bi taybetî latînî û yûnanî) wek beşek ji hin peyvan yan jî bi xwerûyî hatine wergirtin lê ne wek hejmar lê bi maneyeke din tên bikaranîn:

- "Kîlo" wek peyveke serbixwe yan jî wek pêşgir bi maneya "hezar tişt" (kîlogram anku "hezar gram" yan "kîlometre" anku "hezar metre") bi eslê xwe ji yûnaniya kevn "xîlioi" anku "hezar" tê.
- "Santî-" wek di "santîmetre" de yan jî wek peyveke serbixwe "santîm, santîn" ji fransî "cent" anku "sed" hatiye.
- Pêşgira "unî-" di peyvên wek "unîform, unîter, unîversîte" û hwd. ji latînî "un-" anku "yek" tê.
- Pêşgira "bî-, bi-" wek di peyvên "bisiklêt, biskiwêt" de ji latînî "bis" anku "du, ducarî, dubare" tê.

Navê gelek hejmarên din jî latînî û yûnanî wisa di hin peyvên din de hatine nav zimanê kurdî û belav bûne nav piraniya zimanên nivîskî yên dinyayê.

10. HEJMARÊN RÊZÎ

Mebest ji hejmarên rêzî (bi inglîzî *ordinal number*) ew formên navên hejmaran in ku di rêzkirina, dorkirina an sirakirina hejmaran de tê bikaranîn. Bo nimûne:

- ew di pêşbirkê de bû *duyem / duyemîn*
- sala *çaran / çara / çarê* ye ku ez li vî karî me
- newroz *bîst û yekî* adarê ye

Wek ku ji nimûneyên li jor diyar dibe, di kurmancî de hejmarên rêzî bi çendîn paşgirên ji hev cuda dikarin bên çêkirin:

- **-(y)em**: yek-em, du-y-em, sê-y-em, deh-em, sed-em, hezar-em...
- **-(y)emîn**: yek-emîn, du-y-emîn, sê-y-emîn, deh-emîn, sed-emîn, hezar-emîn...
- **-(y)an**: du-y-an sê-y-an, deh-an, sed-an, hezar-an...
- **-(y)a**: du-y-a sê-y-a, deh-a, sed-a, hezar-a...
- **-(y)ê**: yek-ê, du-y-ê, sê-y-ê, deh-ê, sed-ê, hezar-ê...
- **-(y)î**: yek-î, du-y-î, sê-y-î, deh-î...

Niha jî em yek bi yek van bidin nasîn: bergeh û deverên bikaranîna wan û herwiha dîrok û etîmolojiya wan.

10.1. Bi paşgira **-em**

Bikaranîn û varyantên wê

Çêkirina hejmarên rêzî bi paşgira **“-em”** di kurmanciya nivîskî de niha berbelav e. **“-em”** herwiha paşgireke giştgir ya sazkirina hejmarên rêzî ye: wek prensîp her hejmara bingehîn dikare bi alîkariya wê bibe hejmareke rêzî.

Bo nimûne:

Hejmarên bingehîn	Hejmarên rêzî
yek	yekem

çar	çarem
pênc	pêncem
deh	dehem
bîst	bîstem
sed	sedem
hezar	hezarem
milyon	milyonem

Eger hejmara bingehîn bi vokalekê bi dawî were, hingê li cihê "-em", forma "-yem" li gel hejmarên "du, sê" dikare were bikaranîn:

- du > duyem
- sê > sêyem

Li şûna "-yem", li gel hejmarên "du, sê" herwiha forma "-hem" jî mimkin e:

- du > duhem
- sê > sêhem

Li gel hejmarên 11 – 19 yê bi "-de(h)" bi dawî dibin, bi piranî paşgira "-hem" tê xebitandin:

- yazde(h) > yazdehem
- diwazde(h) > diwazdehem
- sêzde(h) > sêzdehem
- çarde(h) > çardehem
- pazde(h) > pazdehem
- şazde(h) > şazdehem
- hevde(h) > hevdehem
- hejde(h) > hejdehem
- nozde(h) > nozdehem

Lê kêm caran ew dikarin bi paşgira "-yem" jî bin:

- yazde > yazdeyem
- diwazde > diwazdeyem

- sêzde > sêzdeyem
- çarde > çardeem
- pazde > pazdeyem
- şazde > şazdeyem
- hevde > hevdeyem
- hejde > hejdeyem
- nozde > nozdeyem

Forma "-wem" carinan bo sazkirina hejmara rêzî ji hejmara "du" tê bikaranîn:

- du > duwem (yan "diwem")

Dehhejmarên rêzîkî 30 – 90 di kurdî de ti formeke standard baş wernegirtiye (bi taybetî dehhejmarên bi vokalan bi dawî dibin anku 30, 50, 70 û 80) lê bi alîkariya paşgira "-em" û varyantên wê ew wiha tên an dikarin bê bikaranîn:

- bîst > bîstem
- sî > siyem, sîhem
- çil > çilem
- pêncî > pênciyem, pêncîhem
- şeşt > şeستم
- heftê > heftêyem
- heştê > heştêyem
- not > notem

Eger hejmara bingehîn bi xwe ji navê çend hejmaran pêk hatibe, paşgira "-em" û varyantên tenê dikevin dawîya hemû hejmarê, ne dawîya her hejmara sade:

- bîst û yek > bîst û yekem (ne "*bîstem û yekem")
- sed û çil û şeş > sed û çil û şeşem (ne "*sedem û çilem û şeşem")
- dused > dusedem (ne "*duyemsedem")
- sêsed hezar > sêsed hezareem (ne "*sêsedem hezareem")

Peyvrêziya hejmarên rêzî yên bi paşgira "-em"

Hejmarên bi paşgira "-em" yan jî varyanteke wê saz kirî di bingeh de rengdêr in:

- kesa yekem – bidin ber "kesa şîrîn", "kesa navdar"

Ew dikarin wek rengdêran bi navberiya ravekan bi navdêran ve bîr girêdan:

- roja duyem
- birayê sêyem

Bidin ber: "roja xweş, birayê mezin".

Lê hejmarên rêzî herwiha dikarin li berî navdêran bîr bikaranîn bêyî ti ravek anku izafeyan:

- yekem car
- duyem roj
- sêyem kes

Bi vê peyvrêziya xwe ew dişibin cînavên destnîşankirinê, bo nimûne:

- sêyem kes (sêyem = hejmara rêzî)
- ew kes (ew = cînavê destnîşankirinê)

Lê du cudahiyên cînavên destnîşankirinê û hejmarên rêzî hene:

- Hejmarên rêzî dikarin li pêş yan jî li paş navdêrê cih bigirin ("yekem kes" û "kesa/ê yekem") lê cînavên destnîşankirinê tenê li pêş navdêrê ("ew kes" lê ne "*kes ew" yan "*kesa/ê ew")⁷⁰
- Cînavên destnîşankirinê jî li gel navdêrê diçemin anku ditewin (ew roj > wê rojê, ew bira > wî birayî) lê hejmarên rêzî jî wek rengdêran li gor navdêran naçemin ("yekem roj > yekem rojê" – ne "*yekemê rojê")

Navdêrkirina hejmarên rêzî yên bi paşgira -em

Hejmarên rêzî yên bi paşgira "-em" dikarin herwiha wek navdêr jî bîr bikaranîn. Bo nimûne:

⁷⁰ Cînav jî dikarin li pey navdêrê cih bigirin eger mesele xwedîtî (genetîv) be: "hevala/ê wê/wî".

- yekemê pêşbirkê (li şûna "yekem kesê pêşbirkê" yan "kesê yekem yê pêşbirkê")
- duyema pêşbirkê (li cihê "duyem kesa pêşbirkê" yan "kesa duyem ya pêşbirkê")
- yekemên her welatî (kesên/komên yekem yên her welatî)

Wek ku tê dîtin, hejmarên rêzkirî di rewşa navdêrkirî de li gor cins û hejmara rêzimanî (yekhejmar an pirhejmar) ravekê (-a, -ê, -ên) werdigerin.

Peydabûna paşgira "-em" di kurmancî de û etîmolojiya wê

Paşgira "-em" û varyantên wê bi xwemalî di devokên kurmancî de li gel hejmarên bingehîn bo çêkirina hejmarên rêzî heta vê dawiyê peyda nedibû: yan ji mêj ve ew ji kurmancî winda bûbû yan jî ti caran tine bûbû.

Lê dawiyê paşgira "-em" û varyantên wê ji soranî yan jî bi rêya soranî ji farisî di kurmanciya nivîskî de belav bûne. Hê jî bikaranîna wê di zimanê rojane de pir nadir e.

Paşgira "-em" û varyantên wê kevnar di zimanên îranî û hindûewropî de kevnar in tevî ku ew di kurmanciya devkî de peyda nabin/nedibûn jî. Ew di farisî de bi şiklê "-om" e, di pehlewî de "-um", di avestayî û sanskrîtî de "-eme", latînî "-imus", fransî "-ième". Bo nimûne:

- kurdî: yek-em
- farisî: yekom
- avestayî: fret-eme
- sanskrîtî: pretheme
- latînî: pr-imus
- îtalî: pr-imo
- fransî: -uni-ème (tenê di hejmarên pêkhatî de, wek din "premier")
- lîtwanî: prî-mas
- latviyayî: pir-mais

Bi esehî nayê zanîn ka "-in" ya zazakî jî hevrehê "-em" e yan jî ji paşgira "-in" ya rengdêrsaz e.

10.2. Bi paşgira -emîn

Paşgira –**emîn** bi tamamî hevwatera paşgira -em e. Herdu dikarin herdem li cihê hev bîn bikaranîn:

- yekem – yekemîn
- çarem – çaremîn
- bîstem – bîstemîn
- sedem – sedemîn
- hezarem – hezaremîn

Heman varyant û guhertoyên paşgira ”-em” (-yem, -hem, -wem) li gel paşgira ”-emîn” jî hene: ”-**yemîn, -hemîn, -wemîn**:

- du-yem – duyemîn
- sê-hem – du-hemîn
- du-wem – du-wemîn

Ji aliyê peyvrêziyê ve jî herdu paşgir wek hev in: hejmarên rêzî yê bi wan çêkirî dikarin li pêş an jî paş navdêran bîn bikaranîn:

- roja yekemîn – yekemîn roj

Ji aliyê peydabûna xwe ya dîrokî ve jî herdu paşgir di kurmançî de nû ne: bi rêya zimanê nivîskî û medyayê ji soranî yan jî bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmançî. Paşgira ”-în” di ”-emîn” de heman paşgir e ku carinan rengdêran ji navdêran çêdike, bo nimûne ”agir > agirîn, reng > rengîn, zêrr > zêrrîn”.

Berevajî ku carinan tê gotin, paşgira ”-em” ne kurtkirina paşgira ”-emîn” e lê tarîxiyên ”-em” kevntir e û dûv re paşgira ”-în” lê hatiye zêdekirin.

Di ti haletan de ne zerûrî ye ku paşgira ”-emîn” were bikaranîn: mirov dikare herdem ”-em” û ”-emîn” li cihê hev bixebitîne.

10.3. Bi paşgira -an

Hejmarên rêzî di kurmancî de dikarin herwiha bi paşgira –an ji hejmarên bingehîn bên çêkirin:

- roja çar-an
- cara pênc-an

Ji bilî hejmara "yek", hemû hejmarên din dikarin bi vê paşgirê ji hejmarên bingehîn bibin hejmarên rêzî:

- cara deh-an
- roja bîst-an
- şeva bîst û yek-an
- kitêba sed-an
- hejmara hezar-an

Varyantên wê ev in: -yan, -han, -wan:

- cara sê-yan
- cara yazde-han (yan "yazdeh-an")
- cara du-wan

Ev bikaranîn di kurmancî de xwemalî ye. Ew di kurmanciya navendî û rojavayî de li kar e lê di kurmanciya rojhilatî de nayê bikaranîn. (*Di kurmanciya rojhilatî de forma xwemalî "-ê" ye – li jêrtir binêrin.*) Li derveyî kurmancî, ew di soranî û lehceyên din yên kurdî de jî ne li kar e.

Di kurmanciya nivîskî de hin caran hejmarên rêzî yên bi paşgira "-an" an varyantên wê tên bikaranîn lê roj bi roj paşgira "-em" û varyantên wê (û carinan jî "-emîn" û varyantên wê) serî ji paşgira "-an" di vê mijarê de distînin.

Di kurmanciya devkî de "-an" adeten sivik dibe û wek "-a" dimîne eger li pey wê vokalek neyê:

- cara deha (< cara dehan)

Lê:

- ev cara dehan e

Lê bi devkî herwisa wiha jî mimkin e:

- ev cara deha ye

Ji aliyê peyvrêziyê ve cihê hejmarên rêzî yê bi paşgira "-an" û varyantên wê sabit e: ew dikarin tenê li pey navdêra ku rave dikin cih bigirin. Ne mimkin e ku ew bikevin berî navdêra raveber:

- "cara çaran" lê ne "*çaran car" (bidin ber "cara çarem[în]" û "çarem[în] car")

10.4. Bi paşgira -a

Hejmarên bingehîn dikarin herwiha bi alîkariya paşgira "-a" bibin hejmarên rêzî:

- cara çar-a
- roja pênc-a

Varyantên wê "-ya, -ha, -wa" ne:

- cara sê-ya / sisi-ya
- roja du-wa / dudu-wa
- roja pazde-ha / pazd-a

Ji aliyê cografî ve bikaranîna paşgira "-a" jî wek ya "-an" e: Ew di kurmanciya navendî û rojavayî de tê bikaranîn lê di kurmanciya rojhilatî û zarên din yê kurdî de nayê emilandin.

Hejmarsaziya bi paşgira "-a" bi giranî devkî ye û di zimanê nivîskî de hema-hema nayê dîtin. Li cihê wê adeten forma "-an" tê nivîsîn û êdî roj bi roj zêdetir li cihê vê jî "-em, -emîn" tên xebitandin.

10.5. Bi paşgira -ê

Hejmarên rêzî di kurmancî de dikarin herwiha bi paşgira "-ê" jî bîn çêkirin:

- cara yek-ê
- birayê çar-ê
- roja şeş-ê

Wek prensîp, ev paşgir di sazkirina hejmarên rêzî ji hejmarên bingehîn de bêsinor e:

- cara dehê
- cara bîstê
- cara sedê
- cara hezarê
- cara milyonê

Di kurmanciya rojhilatî, bi taybetî li Behdînan, ev awayê serekî yê çêkirina hejmarên rêzî ye. Di kurmanciya navendî de ev paşgira bo çêkirina hejmara rêzî ji peyva "yek" were bikaranîn. Lê wek din, ne di kurmancî û ne jî di zarên din yên kurdî de ev awa nayê bikaranîn.

Bi nivîskî ev awa di kurmanciya bi alfabeya kurdî-latînî de kêmtê dîtî lê di kurmanciya bi alfabeya kurdî-erebî de berbelav e ji ber ku kurmanciya bi alfabeya kurdî-erebî bi piranî li Behdînan tê nivîsîn ku ev awa lê li rewacê ye.

Varyantên wê ya serekî ya li pey hejmarên bi vokalekê bi dawî tîna –yê ye:

- cara du-yê
- roja sê-yê / si-yê

Li gel hejmara "du" herwiha varyanta "-wê" jî mimkin e:

- cara du-wê / di-wê

Li gel hejmarên 11 – 19 dengê "e" yê dawiyê (yazd-e, diwazd-e, sêzd-e...) dikeve û paşgira "-ê" cihê wê digire:

- roja yazdê
- şeva sêzdê
- cara pazdê

Ji aliyê peyvrêziyê ve cihê hejmarên rêzî yên bi paşgira "-ê" û varyantên wê di komikên navdêrî de sabit e: ew dikare tenê li dûv navdêra raveber bê û ne mimkin e ku bikeve berî wê:

- cara yekê (ne "*yekê car")
- roja çarê (ne "*çarê roj")

Paşgira "-ê" wek sazkerê hejmarên rêzî ji aliyê etîmolojî ve ihtimalen ji paşgira "-ê" ya çemandinê ye. Lê herwiha mimkin e ku ew paşgireke sazkerê hejmarên rêzî ya kevna jî be û hevrehê "-iye" ya avestayî ya xwedî heman rol be. Bo nimûne, avestayî "thriye" (sêyem, sêyê). Bi demê re guherîna "-iye" bi "-ê" ji aliyê dengnasî ve guherîneke asayî û normal e.

10.6. Bi paşgira -î?

Di hejmartina rojên mehan de formeke bi paşgira -î ya hejmaran di kurmancî de heye:

- yekî gulanê
- dehî sibatê
- bîst û yekî adarê

Di hin devokan de li cihê -î dikare paşgira -ê di vê rewşê de hene:

- yekê gulanê
- dehê sibatê
- bîst û yekê adarê

Ev dişibe formeke hejmarên rêzî. Lê di rastiyê de ew ne paşgireke hejmarên rêzî ye lê "-î" (yan varyanta wê "-ê") li vê derê daçekek e ku cihê "li" digire wek ku "-î" li gel hin birrên din jî yê peyvan maneya "li" yan "ji" dide:

- nêzîkî wî bû (li wî nêzîk bû)
- dûrî min e (ji min dûr e)
- temaşeyî televizyonê dikin (li televizyonê temaşe dikin)

Bi gotineke din, bo nimûne "yekî gulanê" dibe "yek li gulanê".

Wek din, hejmarên bi paşgira "-î" wek hejmarên rêzî nayên bikaranîn. Anku mirov bikare bo nimûne li cihê "ew bû yekem" gotineke wek "*ew bû yekî" bi kar bîne.

10.7. Hejmara rêzî 1. bi navên din

Di kurdî de hemû hejmarên bingehîn dikarin li gor qeydên giştî bibin hejmarên rêzî bi zêdekirina yek ji paşgirên sazkirina hejmarên rêzî "-em(în), -a(n), -ê".

Di piraniya zimanan de bo çêkirina hejmarên rêzî ji hejmarên bingehîn yek an çend paşgir hene. Bo nimûne, di inglîzî ew paşgira "-th", di almanî de "-te" û di tirkî de paşgirên "-inci, -üncü":

- inglîzî: four (çar) > fourth (çarem), seven (heft) > seventh (heftem)
- almanî: vier (çar) > vierte (çarem), fünf (pênc) > fünfte (pêncem)
- tirkî: bir (yek) > birinci (yekem), üç (sê) > üçüncü (sêyem)

Lê di hin zimanan de yek an çend hejmarên pêşîn (1 – 3) ne li gor vê qeyd û benda giştî ne. Bo nimûne, mirov nikare di inglîzî de ji hejmara "one" (yek) û hejmara "two" (du) bi alîkariya paşgira "-th" çêke loma tiştêkî wiha di inglîzî de peyda nabe:

- one > *oneth
- two > *two

Di almanî de mimkin e ku mirov hejmara "zwei" (du) bi paşgira sazkirina hejmarên rêzî anku di almanî "-te" bike "zweite" (duyem) lê di almanî de jî ne mimkin e ku mirov "ein" (yek) bi alîkariya paşgira "-te" bike "*einte" anku peyveke wiha di almanî de nîne.

Loma di inglîzî de bo hejmarên "yekem" (bi inglîzî "first") û "duyem" (second) hin peyvên taybet hene ne ji peyvên "one" (yek) û "two" (second) hatine çêkirin. Di almanî de jî bi maneya "yekem" peyva "erste" heye ku ne yekser ji peyva "ein" (yek) hatiye avakirin.

Tevî ku di kurdî de mirov dikare van hejmarên pêşiyê jî bi alîkariya paşgirên sazkirina hejmarên rêzî ji hejmarên bingehîn çêke (yek > yekem, yekemîn, yekê...), dîsa di kurdî de çend navên din jî bo hejmara 1. ya rêzî hene ku ne ji peyva "yek" hatine çêkirin.

Pêşîn / pêşî / pêşiyê

Peyva "pêşîn", "pêşiyê" yan "pêşî" bi berfirehî di kurmancî de li hejmara rêzî "yekem, yekemîn, yekê" tê xebitandin:

- çiriya pêşîn / pêşî / pêşiyê
- Ew yê pêşîn / pêşiyê bû ku ew kar kir.
- Kitêba wê ya pêşîn / pêşî / pêşiyê berî 20 salan derket.

Dijwateyên peyva "pêşîn / pêşî / pêşiyê" jî peyvên "paşîn / paşî / paşiyê" ne. Bo nimûne:

- çiriya paşîn / paşiyê / paşî
- Ew yê paşîn / paşiyê bû ku ew kar kir.
- Kitêba wê ya paşîn piştî mirina wê derket.

Herwiha peyvên "dawî, dawîn, dawiyê" jî wek dijwateyên "pêşîn, pêşiyê / pêşî" tên xebitandin, bi taybetî di kurmanciya navendî de. Di kurmanciya rojhilatî de peyvên "dûmahî, dûmahiyê, dûmahîkê"

Ewil, ewilî, ewilîn

Peyva "ewil" û varyantên wê "ewilî, ewilîn" jî di kurdî de – bi taybetî di zimanê devkî de lê gelek caran di nivîsînê de jî – bi wateya "yekem, pêşîn" tê xebitandin. Ew ji erebî "ewwel" hatiye wergirtin û ji bilî kurdî, herwiha di farisî de jî bi awayên "evvel, evvelîn" hem di axiftinê û hem jî di nivîsînê de tê bikaranîn.

Di axfitina kurdî, bi taybetî ya kurmancî de, li destpêka vê peyvê adeten dengê "eyn"ê (ع) heye wek di navê "Elî, Emer, Arif" de tevî ku di zimanê erebî de di peyva "ewwel" de ev deng li destpêkê nîne. Anku ev dengê ku gelek kes wek dengê erebî û ji zimanê kurdî re xerîb dibînin, di kurdî de li vê peyva erebî hatiye zêdekirin tevî ku ew deng di zimanê erebî de di vê peyvê de peyda nabe.⁷¹

Dijwateyên peyvên "ewil, ewilî, ewilîn" jî peyvên "axir, axirî, axirîn" ku erebî "axer" ku ji bilî kurdî, herwiha ketiye farisî jî. Li Bakurê Kurdistanê di axiftina kurdî de vê dawiyê bi giranî peyva "son, sonê" ya ji tirkî cihê "axir" ya ji erebî girtiye.

Herwiha peyvên "talî, taliyê" jî carinan wek dijwateyên "ewil, ewilî, ewilîn" tên xebitandin. "Talî" jî wek "ewil" û "axir"ê ji erebî hatiye wergirtin.

Hêjayî gotinê ye ku di inglîzî de jî peyva "second" (duyem) bi eslê xwe ne inglîzî ye lê ji latînî hatiye wergirtin.

⁷¹ Bo zêdebûn û kêmbûna dengê "eyn"ê di kurdî de, binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/10/07/eyn-%D8%B9-di-kurdi-de/>

Berahiyê / berahîkê

Peyvên "berahiyê, berahîkê" jî bi maneya "yekem, pêşîn" li kar in. Ew bi taybetî di kurmanciya rojhilatî de tê gotin. Ew bi forma "berayî" herwiha li hin derên soranî jî hene. Ew ji peyva "ber" (pêş, pêşî) û paşgira "-ahî" (wek "ron-ahî, bilind-ahî") pêk hatiye.

- Ew bû yê berahiyê.
- Kitêba min ya berahîkê.

Dijwateya "berahiyê, berahîkê" peyvên "dûmahî, dûmahîk, dûmahiyê, dûmahîkê" ne ku ew jî bi taybetî di kurmanciya rojhilatî de tên gotin.

11. ÇEMANDIN Û RAVEKIRINA HEJMARNAVAN

Navên hejmarên bingehîn di kurdî û gelek zimanên din de jî ji aliyê bikaranîna xwe ve ji hemû birên peyvan zêdetir dişibin navdêran û wek wan diçemin / ditewin.

Bo nimûne, di kurdî de hem navdêran û hem jî hejmarnavan bi zelalî formên xwe yên yekhejmar û pirhejmar hene. Wek mînak:

Navdêr		Hejmarnav	
Yekhejmar ⁷²	Pirhejmar ⁷³	Yekhejmar ⁷⁴	Pirhejmar ⁷⁵
çav	çavan	çar	çaran
pîvaz	pîvazan	pênc	pêncan
sêv	sêvan	şeş	şeşan
dest	destan	deh	dehan
ser	seran	sed	sedan

11.1. Pirhejmariya hejmarnavan

Di tevahiya kurmancî de sazkirina formên pirhejmar yên hejmarnavan jî wek yên navdêran e:

Hejmarnavên pirhejmar bi forma xwe ya neçemandî wek navdêrên pirhejmar jî bi forma xwe ya neçemandî bêyî ti paşgir in:

- Heval hatin. (heval = navdêr)
- Heft hatin. (heft = hejmarnav)

⁷² Forma xwerû/neçemandî ya yekhejmar.

⁷³ Forma çemandî ya pirhejmar.

⁷⁴ Forma xwerû ya yekhejmar.

⁷⁵ Forma çemandî ya pirhejmar.

Hejmarên pirhejmar bi forma xwe ya çemandî anku tewandî wek navdêrên pirhejmar jî bi forma xwe ya çemandî paşgira "-an" werdigire:

- çar-an
- pênc-an
- deh-an
- bîst-an
- sed-an
- hezar-an
- milyon-an

Eger hejmar bi forma xwe ya xwerû bi vokalekê bi dawî were, hingê paşgir "-yan" e:

- du-yan
- sê-yan
- si-yan (sî + yan)
- pênciyan
- heftêyan
- heştêyan

Di zimanê devkî de N-ya dawiyê dikeve:

- çara, şeşa, deha, bîsta, seda, hezara...
- sêya, duya, heftêya...

Di hin devokan de Ê-Y dibe IY

- sêya(n) > siya(n)
- heftêya(n) > heftiya(n)
- heştêya(n) > heştiya(n)

Di hin devokan de Y-ya paşgira "-yan"ê jî nayê gotin:

- duyan > duya > dua (> duwa / diwa)
- sêyan > sêya > sêa
- heftêyan > heftêya > heftêa

Forma pirhejmar ya çemandî ya hejmarnavan hingê tê bikaranîn gava ku hejmarnav li cihê navdêrên pirhejmar yê çemandî bên xebitandin. Loma bo nimûne:

- Hevalan şîv dixwar. (heval = navdêr)
- Heftan şîv dixwar. (heftan = hejmarnav)

Lê gava ku hejmarnav berî navdêrên pirhejmar yê çemandî bên bikaranîn, hingê ne forma çemandî lê forma xwerû ya hejmaran tê emilandin:

- Heft hevalan şîv dixwar. (ne ”*heftan hevalan şîv dixwar” yan ”*heftan heval şîv dixwar.”)

Di kurdî de di halê pirhejmar yê navdêran û hejmarnavan jî bêcins e anku di rewşa pirhejmariyê de nêr û mê ji hev nayên cudakirin. Paşgira herdu cinsan ya pirhejmariya çemandî di kurmancî de ”-(y)an” (bi devkî ”-(y)a”) ye:

- Jin-an şîv dixwar > heft jin-an şîv di-xwar > heft-an şîv dixwar.
- Mêr-an şîv dixwar > heft mêr-an şîv dixwar > heft-an şîv dixwar.

Ji aliyê ravek û ravekirinê ve jî hejmarnav wek navdêran in. Di rewşa pirhejmar de ew jî wek navdêran di kurmanciya nivîskî de bi paşgira ”-(y)ên”⁷⁶ bi ravekerên xwe ve tîr girêdan:

- çav-ên şîn (çav = navdêr)
- çar-ên şîn (çar = hejmarnav)

Ji bilî peyva ”yek” û ya ”sifr”, hejmarên din yê tamam ji tebîetê xwe ve pirhejmar in. Bo nimûne, ”du, sê, deh, pêncî û çar, sed, hezar, milyon...” ji xwe ji yekê zêdetir in anku bi hêsaniyê pirhejmar in û wek pirhejmar tîr bikaranîn. Lê heta hejmarên ”yek” û ”sifr” jî dikarin wek pirhejmar bîr bikaranîn gava ku behsa çend ”yek”an yan jî çend ”sifran” tê kirin:

- Ez ê deh yekan binivîsim. (deh hejmar ”yek”)
- Her şeş sifrên li pey milyonê (1 000 000)

⁷⁶ Di hin devokan de ev paşgir bi awayê ”-(y)êt, -(y)êd, -(y)ê” ye: çarêt şîn, çavêd şîn, çarê şîn”.

11.2. Cinsê hejmarnavan û yekhejmariya çemandî ya hejmarnavan⁷⁷

Wek ku me li jor diyar kiriye, hemû hejmar dikarin di kurdî de bi formên xwe yên pirhejmar yên çemandî û neçemandî bîn bikaranîn. Lê hemû hejmarnav dikarin di kurdî de herwiha wek yekhejmar jî bîn xebitandin. Bo nimûne:

- sed-ek
- hezar-ek
- milyon-ek

Di rewşa neçemandî ya hejmarnavan de, wek di rewşa neçemandî yan navdêran de jî, di kurmandî de cinsê peyvan nediyar e. Bo nimûne, ji van peyvan bi xwe diyar nabe ka cinsê wan mê ye yan nêr e eger mirov cinsê wan nizane:

- navdêr: çav, gul, heval

⁷⁷ Heta niha li ser cinsê rêzimanî yê hejmaran û çemandin û ravekirina hejmarnavên kurmandî kêm hatiye nivîsîn. Yek ji kesên pêşîn yên li ser mijarê nivîsandî Celadet Bedirxan e ku idia dike cinsê hejmaran nêr e. Kesekî din ku li ser mijarê nivîsiye Arif Zêrevan e ku – berevajî – C. Bedirxanî – dibêje ku cinsê rêzimanî yê hejmarnavan mê ye. (http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/arif_zerevan_bingehen_rastnivisandine_02.pdf?NR:60) Li pey Arif Zêrevanî, îcar Zana Farqînî dest avêtiye mijarê û vegeriye ser texmîna Celadet Bedirxanî. (http://www.amidakurd.net/qunciknivis/zayend-tewanga-jimarnavan_6/2007) e. Mixabin Farqînî di mijarên hejmarnavan tevlihevkirin e: ravekirina/tewanga hejmaran û daçek. Bo nimûne, ew gotinên wek "Îroj yekê gulanê ye" wek isbata wê pêşkêş dike ku hejmarnav nêr in. Lê di rastiyê de di "yekê gulanê" yan jî hê rasttir "yekî gulan" de "yekê/yekî" ne forma ravekirî ya peyva "yek" e lê "yekî gulanê" yan "yekê gulan"ê kurtkirina daçekî ji forma "yek li gulanê" ye wek çawa ku "nêzîkî min" û "nêzîkê min" jî kurtkirinên forma "nêzîk li min" yan "li min nêzîk" in. Farqînî herwiha formên kurmandîya rojhilatî (behdînî) yên wek "sala 1996ê" wek isbata wê yekê pêşkêş dike ku hejmarnav di kurmandîya rojhilatî de mê ne. Lê paşgira "-ê" di kurmandîya rojhilatî de sazkerê hejmarên rêzî ye wek çawa ku di kurmandîya navendî de paşgira "-an" (bi devkî "-a") jî sazkerê hejmarên rêzî ye. "Sala 1996ê" ya kurmandîya rojhilatî û "sala 1996an" ya kurmandîya navendî di rastiyê de ji aliyê rêzimanî ve maneya "sala 1996em" dide (bi inglîzî heçku mirov bibêje "1996th year" yan jî heçku mirov bi tirkî bibêje "1996'ncı yıl"). Wek ku em ê li jêr aşkere bikin, bi qenaeta me, van her sê kesan hinek rast û hinek jî şaş kiriye. Berevajî wan alîgirên mênîyî yan nêrîtiya hejmarnavan, em ê hewl bidin isbat bikin ku hejmarnav bi xwe ne mê yan nêr in lê cinsê wan li gor amaje û referansa wan diyar dibe. Bi gotineke din, hejmarnav nêr tîn bikaranîn gava ku navdêrê ew qest jê dikin nêr e û mê tîn xebitandin gava ku navdêrê meqsed jê mê be.

- hejmarnav: deh, sed, hezar

Lê eger mirov van peyvan biçemîne yan jî rave bike, hingê cinsê wan diyar dibe.

Bo nimûne, peyva "çav" wiha tê bikaranîn:

- wî çavî, çavê min (ji van formên çemandî û ravekirî diyar dibe ku peyva "çav" nêr e ji ber ku ew wek peyva "wî mêrî" û "mêrê min" tê emilandin)

Peyva me ya duyem, "gul" jî wiha tê îstîmalkirin:

- "wê gulê, gula min" (ji van formên çemandî û ravekirî diyar dibe ku peyva "gul" mê ye ji ber ku ew wek peyva "wê jinê" û "jina min" tê xebitandin)

Herçi peyva me ya sêyem anku "heval" e, ew dikare bi van herdu awayan be:

- "wê hevalê, hevala min" (anku mê, wek "wê jinê, jina min")
- "wî hevalî, hevalê min" (anku nêr, wek "wî mêrî, mêrê min")

Bi gotineke din, di kurmançî de ji aliyê cinsî ve sê birrên navdêran hene:

- birrek herdem mê ye, bo nimûne "gul"
- birrek herdem nêr e, bo nimûne "çav"
- birrek ducinsî ye anku dikare mê yan jî nêr be û cinsê wê li gor kesa/ê yan heywana/ê amaje (referans) tê kirin diguhere, bo nimûne "heval"

Lê madem ku ji aliyê cinsî ve sê birrên wiha yê navdêran hene, gelo cinsê rêzimanî yê hejmaran çi û çawa ye?

Ji ber ku piraniya hejmarnavan ji ekseriyeta rewşan de bi pirhejmarî tîk bikaranîn, pirsê cinsê rêzimanî yê hejmaran kêman caran derdikeve pêş mirovî. Lê wek ku me li jor jî got, hemû hejmarên kurdî dikarin bi yekhejmarî jî biçemin û bîk ravekîrin û di çemandin û ravekirina wan ya bi yekhejmarî de, di kurmançî de bi zerûrî divê cinsê wan yê rêzimanî were diyarkirin.

Bo bersivdana vê pirsê, mirov dikare bi nimûneyan nêzîkî meseleyê bibe:

Hejmara "yek" bi tebîetê xwe yekhejmar e. Tevî ku ew dikare wek pirhejmar jî were xebitandin (li jortir binêrin), ew bi piranî wek yekhejmar bê emilandin:

- Yek dibêje. (Wek "heval dibêje". "Yek" neçemandî ye û jê ne diyar e ka kesa/ê ku dibêje jin e yan jî mêr e.)

- Yekê got. (Wek "jinik-ê got". "Yek-ê" çemandî ye û jê diyar e ku mebest ji "yekê" jinek/keçek e.)
- Yekî got. (Wek "mêrik-î got". "Yek-î" çemandî ye û jê diyar e ku mebest ji "yekî" mêrek/kurek e.)

Ji nimûneyên me diyar dibe ku peyva "yek" ji aliyê cinsê xwe yê rêzimanî ve ducinsî ye û cinsê ku tê bikaranîn li gor amaje û referansa cinsê kesa/ê yan heywana/ê mebest jê ye.

Hejmara din ya bi tebîî yekhejmar "sifr" e. Bo cinsê rêzimanî yê vê peyvê, kerem bikin li vê nimûneyê binêrin:

- Hewa sar bûye û ketiye bin sifrê. (bin sifrê = kêmtir ji 0 derece celsius)

Ji nimûneya me diyar dibe ku peyva "sifr" wek mê be hatiye xebitandin, bidin ber "bin jinê", ne wek nêr be, bidin ber "bin mêr".

Gelo çima peyva "sifr" wek mê lê ne wek nêr hatiye bikaranîn?

Sebeb ew e ku peyva "sifr" di nimûneya me de li cihê "sifr derece" hatiye emilandin. Ji ber ku "derece" (yan hevwateriya wê ya zimanê nivîskî "pile") di kurmancî de mê ye, cihê wê neqlî peyva "sifr" bûye:

- ketiye bin sifr dereceyê > ketiye bin sifrê.

Mirov dikare bi heman awayî behsa hejmarên din jî bike:

- hejmara pênc ya li ser dîwarî nivîsandî > pênc li ser dîwarî nivîsandî

Peyva "pênc" li vê derê wek peyveke mê hatiye ravekirin ji ber ku peyva cinsê rêzimanî yê peyva "hejmar" mê ye.

Hejmarên "deh, bîst, pêncî, sed, hezar" wek yekhejmar çemandî yan ravekirî bi taybetî di behskirina pareyên banknotî / kaxezî de tên kirin.

Li hin deveran ev hejmar wiha tên bikaranîn:

- dehê min, bîstê min, pênciyê min, sedê min, hezarê min

Li hin deveran jî wiha:

- deha min, bîsta min, pênciya min, seda min, hezara min

Ji ber van awayên ji hev cuda, hin caran hatiye texmînkirin ku di kurmanciya navendî de (desteya jortir) hejmarnav nêr in lê di kurmanciya rojhilatî de (desteya jêrtir) hejmarnav mê ne.

Rast e ku di nav komdevokan de ev awayên ji hev cuda hene. Lê sebeb ne cinsê rêzimanî yê hejmarnavan bi xwe lê cinsê rêzimanî yê peyvên "banknot" yan "kaxiz / kaxid" yên di van komdevokan de ye. Di kurmanciya navendî de bi piranî peyvên "banknot, kaxez" nêr in anku mirov wiha dibêje:

- banknotê min, kaxezê min

Loma di kurmanciya navendî de mirov herwiha dibêje:

- dehê min, sedê min, hezarê min...

Di kurmanciya rojhilatî de peyvên "banknot, kaxez/kaxed" mê ne anku mirov wiha dibêje:

- banknota min, kaxeza min

Loma mirov di kurmanciya rojhilatî de herwiha dibêje:

- deha min, seda min, hezara min...

Anku cinsê li hejmarnavê barkirî ji tesîra wê peyvê ye ku amaje û mexsed jê ye, ne cinsekî sabit yê hejmarnavê bi xwe ye.

Lê bi taybetî jî belkî xwandevevanên hêja yên qisekerên kurmanciya rojhilatî bipirsin: Madem ku cinsê hejmarnavê herdem li gor navdêra cinsê rêzimanî yê navdêra meqsed e, çima mirov li cihê formên wek "kesê çaran hat, barê pêncan hat" yên kurmanciya navendî, di kurmanciya rojhilatî de formên wek "kesê çarê hat, barê pêncê hat" dibîne ku "kesê" û "barê" nêr in lê peyvên "çarê" û "pêncê" wek ku mê bin hatine çemandin?

Lê li vê derê peyvên "çarê, pêncê" ne formên çemandî ji hejmarên bingehîn "çar, pênc" in lê ew hejmarên rêzî yên bi wateya "çarem, pêncem" in. Eger ew formên çemandî ji hejmarên "çar, pênc" bûna, ew dê di kurmanciya navendî de jî wisa bûna lê wek ku em dizanin, di kurmanciya navendî de ew bi awayê "kesê çaran, barê pêncan" in. Di kurmanciya navendî de jî "çaran, pêncan" li vê derê ne formên çemandî ji hejmarên bingehîn "çar, pênc" in lê hejmarên rêzî ne.

Bo ku em baş diyar bikin ku "çarê, pêncê" di "kesê çarê, barê pêncê" de bi rastî jî hejmarên rêzî ne, em dikarin wan li hin zimanên din jî wergerînin:

- kurmanciya rojhilatî: kesê çarê, barê pêncê
- kurmanciya navendî: kesê çara(n), barê pênc(n)
- kurmanciya nivîskî: kesê ca_rem(în), barê pêncem(în)
- soranî: kesî çwarem(în), barî pêncem(în)
- inglîzî: fourth person, fifth load
- tirkî: dördüncü kişi, beşinci yük

Anku li vê derê jî mesele ne ew e ku hejmarnav bi xwe bi awayekî sabit di kurmanciya rojhilatî de mê bin lê mesele li vê derê ew e ku di kurmanciya rojhilatî de hejmarên rêzî bi paşgira "-ê" tên çêkirin.

Li aliyekî din, hin kes dê bipirsim: Madem ku hejmarnav bi xwe ne nêr bin, çima em dibêjin "bîstê mehê, çarê gulanê, dehê sibatê" û hwd. wek ku ew nêr bin tevî ku peyva meqsed anku "roj" bi xwe mê ye?

Berî bersivdana vê pirsê divê were bibîranîn ku forma serdesttir ji "bîstê mehê, çarê gulanê, dehê sibatê" û hwd. anku awayê bi paşgira "-ê", awayê "bîstî gulanê, çarî gulanê, dehî sibatê" û hwd. anku awayê bi paşgira "-î" ye.

Li vê derê jî mesele ne ew e ku "-ê" raveka nêrîtiyê be lê "-ê" yan jî hê serdesttir "-î" li vê derê daçek e. Bo fehmkirina vê rastiyê, kerem bikin em li van nimûneyan binêrin:

- nêzîk-î min e, nêzîk-ê min e
- dûr-î min e, dûr-ê min e
- êrişî me kir, êrişê me kir
- temaşe-yî televizyonê dikin, temaşe-yê televizyonê dikin

Li vê derê paşgirên "-î" yan "-ê" ne ravek ku peyva raveber bi peyva raveker ve girê bidin lê ew daçekek in ku kêr-zêde hevwatera daçeka "li" (carinan jî daçeka "ji") ye. Kerem bikin em nimûneyên li jor bi awayekî din bibêjin:

- li nêzîk min e, li min nêzîk e
- ji min dûr e
- êriş li me kir
- li televizyonê temaşe kir

Wek çawa ku mirov "-î / -ê" di nimûneyên li jor de ne ravek lê daçek e, wisa "-î / -ê" di nimûneyên wek "bîstî / bîstê mehê, çarî / çarê gulanê, dehî / dehê sibatê" û hwd. de daçek e, heçku mirov bibêje "roja deh li wê mehê, roja çar li meha gulanê, roja deh li meha sibatê" û hwd.

Kurt û kurmancî: Gengeşe û duberiyên "hejmarnav nêr in" û "hejmarnav mê ne" bêwate ne ji ber ku hejmarnav ducinsî ne û cinsê wan di bikaranînê li gor navdêra ku meqsed jê ye lê tê barkirin.

12. HEJMARNAV DI DIYARKIRINA DEMAN DE

Yek ji mijarên ku hejmar gelek tê de tên bikaranîn diyarkirina deman e: sal, meh, hefte, roj, saet û hwd. Li vê derê em ê hewl bidin awayên bikaranîna hejmaran di mijara diyarkirina deman de pêşkêş bikin.

12.1. Hejmar di diyarkirina salan de

Di kurdî de çend peyvên taybet ji salên nêzîk re hene: "îsal" (ev sal; vê salê), par (sala berî vê, sala borî, sala çûyî), pêrar (du sal berî vê, du sal berî niha, sala berî par), sala bê(t) / were (sala piştî vê).

Wek din, diyarkirina salan bi alîkariya hejmaran e. Bo nimûne:

- pênc sal berî niha
- piştî deh salan
- sala 1995 / 1995an / 1995ê
- salên 60an / 60ê
- sedsala bîstem(în) / bîstan / bîstê

Wek ku tê dîtîn, hejmar dikare bikeve berî peyva "sal" ("pênc sal berî niha", "piştî deh salan") yan jî piştî peyva "sal" (sala 1995...).

Gava ku hejmar bikeve berî peyva "sal", hejmar bi xwe di rewşa neçemandî û bêravek de ye anku xwerû ye ("pênc sal berî niha", "piştî deh salan"). Lê peyva sal dikare xwerû be ("pênc sal berî niha") yan jî çemandî be ("piştî deh salan").

Eger peyva "sal" bikeve berî hejmarnavekê, ew bi raveka xwe ya yekhejmar "-a" yan jî ya pirhejmar "-ên" bi hejmarê ve tê girêdan:

- sala 1995 / 1995an / 1995ê
- salên 1980yan

Eger mebest tenê salek be, wek "sala 1995 / 1995an / 1995ê", ew dikare li gor devokan biguhere. Kurmanciya navendî paşgira "-(y)an" (bi devkî "-(y)a" dide dûv hejmara salê:

- sala 2010an (du hezar û dehan)

- sala 1993yan (hezar û neh sed û sêyan / sisiyan)

Kurmanciya rojhilatî di navên salên kit de ne paşgira "-(y)an" lê ya "-(y)ê" dixebitîne:

- sala 2010ê (du hizar⁷⁸ û dehê)
- sala 1993ê (hizar û neh sed û not û sêyê / sêê / sê)⁷⁹

Paşgirên "-(y)an" û "-(y)ê" di nivîsînê de bi çend awayên ji hev cuda tên dîtin, wek:

- sala 2010an / 2010ê
- sala 2010'an / 2010'ê
- sala 2010-an / 2010-ê

Em formên bêxalbend anku wek "sala 2010an / 2010ê" pêşniyaz dikin ji ber ku ti erkê 'yan - li vê derê di navbera van hejmaran û paşgirên wan de nîne anku ew ne zerûrî ne û tenê xwandin û nivîsînê dirêjtir û girantir dikin.

Ji bilî van herdu forman, herwiha formeke din jî di herdu komdevokên kurmancî de peyda dibe ku hejmar tê de bêyî paşgir tên bikaranîn:

- Sala 2010 (sala du hezar û deh) em çûn wê derê.
- Sala 1995 (sala hezar û neh sed û not û pênc) ew li vê derê bûn.

Dîsa di meseleyan salên ji yekê zêdetir de jî kurmanciya navendî paşgira "-(y)an" û kurmanciya rojhilatî jî paşgira "-(y)ê" bi kar tîne:

- navendî: salên 1960an / 60an (salên hezar û neh sed û şêstan / salên şêstan)
- rojhilatî: salên 1960ê (salên hizar û neh sed û şêstê / salên şêstê)

Wek ku me li jortir jî çend caran gotiye, ev paşgirên "-an" û "-ê" yên bi hejmarnavan ve ne paşgirên çemandin û tewandinê ne lê paşgirên dariştinê ne ku hejmarên rêzî ji hejmarên bingehîn saz dikin. Loma kurmanciya navendî li gel salekê jî (bo nimûne "sala 2005an") û komeke salan jî (bo nimûne "salên 60an") her heman paşgira "-an" bi kar tîne û kurmanciya rojhilatî jî li gel salekê jî (bo nimûne "sala 2005ê") û komeke salan jî (wek mînak "salên 60ê") dîsa heman paşgira "-ê" dixebitîne.

⁷⁸ Di kurmanciya rojhilatî de navê hejmara 1000 "hizar" e, ne wek kurmanciya navendî "hezar".

⁷⁹ Di kurmanciya rojhilatî de dengê Y yê kelijandinê di axiftinê de adeten nayê bihîstin loma bi devkî mirov forma çemandî ya peyva "sê" nabêje "sêyê" lê "sê-ê" yan jî tenê "sê".

Li gel peyvên nûçêkirî "dehsal, sedsal, hezarsal" yan jî formên wan yê bi rêya soranî ji farisî deynkirî "dehe, sede, hezare" (bi inglîzî "decade, century, millennium") yan hevwaterên wan yê ji erebî wergirtî "qirn⁸⁰, esr" dîsa di kurmançiya navendî de "-an" û di kurmançiya rojhilatî de jî "-ê" mimkin e:

- navendî: sedsala bîstan, esra bîstan, qirnê / qirna bîstan
- rojhilatî: sedsala bîstê, qirnê / qirna bîstê

Lê ji bilî van herdu forman, di zimanê nivîskî de herwiha forma bi paşgira "-em / -emîn" ya sazkirina hejmarên rêzî ji hejmarên bingehîn jî mimkin e:

- sedsala bîstem(în), esra bîstem(în), qirnê / qirna bîstem(în)

Bikaranîna paşgirên "-em / -emîn" herwiha li gel peyva "sala" hingê jî mimkin e gava ku mirov behsa hejmartina salên bûyerekê dike:

- sala çarem min xwandina xwe xilas kir (formên din: salan çaran / çarê)

Lê bikaranîna van paşgirên "-em / -emîn" li gel peyva "sala / salên" ne mimkin e eger mebest ji salên salnameyê bin anku formên wiha nînin yan şaş in:

- *sala 1995em
- *salên 1960em

12.2. Hejmar di diyarkirina mehan / heyvan de

Mehên (heyvên, hîvên, mangên) salê dikarin bi navên mehan an jî hejmarên mehan bînin diyarkirin.

Di kurdî de çend desteyên cuda yê navên mehan li kar in lê meseleya "rastiya wan" yan "şaşiyên wan" dûr û dirêj e û li vê derê ne mijara me ye. Li vê derê bes e em bibêjin ku mirov dikare bibêje ku, bo nimûne, mehên biharê dikarin bi navên "adar, nîsan, gulan" ji hev bînin cudakirin.

Awayekî din yê cudakirina mehên biharê bi hejmaran e:

- adar: meha sêyem(în), meha sêya(n), meha sisiya(n), heyva sêyê, heyva sê-ê, heyva sê

⁸⁰ "Qirn" ji erebî ketiye kurdî û farisî lê erebî bi xwe jî ew ji yûnaniya kevn "xronos" wergirtiye.

- nîsan: meha çarem(în), meha çaran, heyva çarê
- gulan: meha pêncem(în), meha pêncan(n), heyva pêncê

Ji van formên bi paşgirên "-em(în)" (sêyem / sêyemîn, çarem / çaremîn, pêncem / pêncemîn) tenê di zimanê nivîskî de hene û ji paşgira ji soranî wergirtî yan jî bi rêya soranî ji farisî wergirtî "-em(în)" hatine çêkirin.

Formên bi paşgira "-an / -a" yan "-yan / -ya" di zimanê nivîskî de jî hene û eslê wan devokên kurmanciya navendî ye. Formên bi "-ê / -yê" jî aidî kurmanciya rojhilatî ne û hin caran di zimanê nivîskî de jî tên dîtîn lê ne bi qasî formên kurmanciya navendî.

12.3. Hejmar di diyarkirina rojên mehê de

Di kurdî û piraniya zimanên din de jî rojên mehê tenê bi hejmaran tên diyarkirin û ji rojên mehan re ti navên taybet nînin (bidin ber navên rojên hefteyan li jêrtir). Her meha salê ya salnameya zayînî / mîladî ji 28 – 31 rojan pêk tê û bi hejmaran tê diyarkirin.

Di kurdî de navê hejmara rojê berî navê mehê tê. Di kurmançî de hejmara rojê bi raveka "-î" yan jî "-ê" bi hejmara mehê yan navê mehê ve tê girêdan. Navê mehê di kurmançî de bi paşgira "-ê" diçeme:

- 21î adarê (bîst û yekî adarê) / 21ê adarê (bîst û yekê adarê)
- 5î gulanê (pêncî gulanê) / 5ê gulanê (pêncî gulanê)

Eger li şûna navê mehê, hejmara mehê were xebitandin, hingê hejmara mehê xwerû dimîne anku naçeme:

- 21î 3 yan 21î sê (bîst û yekî sê) / 21ê 3 yan 21ê 3 (bîst û yekê sê)

Lê eger di navbera wan de peyva "meh / heyv / hîv / mang" hebe, hingê hejmara mehê dikare li gor devokan bi çend awayên ji hev cuda be:

- xwerû: 10î meha 4 (dehî meha çar)
- bi paşgira -a(n): 10î meha çara(n) – bi taybetî di kurmanciya navendî de
- bi paşgira -ê: 10î heyva çarê – xaseten di kurmanciya rojhilatî de

- bi paşgira -em(în): 10î meha çarem(în) – tenê bi nivîskî

12.4. Hejmar di diyarkirina rojên hefteyê de

Peyva "hefte" yan "heftî" bi xwe ji hejmara "heft" peyda bûne.⁸¹ Ne tenê hefte lê piraniya navên rojên hefteyê jî ji hejmaran peyda bûne:

- yek-şem, du-şem, sê-şem, çar-şem, pênc-şem

Ji bilî navên rojên hefteyê, rojên hefteyê dikarin herwiha bi hejmaran jî bînin diyarkirin, bo nimûne:

- roja çaran ya wê hefteyê
- roja şeşan a hefteya çaran

Nimûneyên li jor ji kurmanciya navendî ne û hevberên wan di kurmanciya rojhilatî de wiha ne:

- roja çarê ya wê heftiyê
- roja şeşê ya heftiya çarê

Di zimanê nivîskî de ew dikarin herwiha bi vî awayî jî bînin gotin:

- roja çarem(în) ya wê hefteyê
- roja şeşem(în) ya hefteya çarem(în)

Yan jî bi peyvrêziyeke din:

- çarem(în) roja wê hefteyê
- şeşem(în) roja çarem(în) hefteyê

12.5. Hejmar di diyarkirina demên saetê de

Di şevûrojê de 24 saet hene. Ti navên taybet ji saetên şevûrojê re di kurdî de (û piraniya zimanên din de jî) nînin loma diyarkirina wan bi hejmarnavan e. Gava ku mirov bixwaze bibêje ka saet çend e yan çend bû, hingê ew bi hejmarên neçemandî tînin diyarkirin:

⁸¹ Peyva "hefte, heftî" di farisiya niha de "heftê", di farisiya kevntir de jî "hefte" bû. "Hafta" ya tirkî ji zimanên îranî hatiye wergirtin.

- Saet du ye.
- Saet şeş bû.
- Saet hê nebûye çar.

Eger mirov bixwaze bibêje ku filan tişt li bêvan saetê qewimiye yan dê biqewime, hingê mimkin e ku ew bi forma xwerû were bikaranîn:

- Em saet çar hatin.

Lê herwiha mimkin e ku ew di kurmanciya rojhilatî de bi paşgira "-ê" û di kurmanciya navendî de jî bi paşgira "-an" (bi devkî "-a") were xebitandin:

- rojhilatî: Em seet çarê hatin.
- navendî: Em saet çara(n) hatin.

Hin caran mirov mirov daçeka "li" yan jî dordaçeka "di ... de" li gel wan dibîne lê bi taybetî "di ... de" li vê derê ji kurdî zêdetir ji tesîra paşgira rewşa tê de "-da, -de, -ta, -te" ya tirkî ye:

- Em li saet çarê hatin.
- Em di saet çaran de hatin. (bidin ber tirkî: biz saat dörtte geldik)

Lê paşgira "-em(în)" ya vê dawiyê ji soranî wergirtî yan jî bi rêya soranî ji farisî wergirtî belavî vê nebûye û di soranî û farisî bi xwe de jî bo diyarkirina saetan nayê bikaranîn.

Beşên zêdetir ji saeta tamam bi alîkariya peyvika "û" tên diyarkirin:

- Saet çar û deh e (yan: Saet çar û deh deqe/deqîqe/xulek e)
- Saet pênc û çarêkek e (yan: Saet pênc û pazde deqe/deqîqe/xulek ye)
- Saet sê û nîv e

Beşên ji saetekê kêmtir lê ji nîv saetê zêdetir dikarin bi du awayan bînin gotin:

Yan wek nîv saetê û beşên ji nîv saetê kêmtir anku bi alîkariya peyvika "û". Bo nimûne:

- Saet du û çil e (yan: Saet du û çil deqe/deqîqe/xulek e)
- Saet şeş û pêncî û çar e (yan: Saet du û pêncî û çar deqe/deqîqe/xulek e)

Yan jî (bi zêdetir bi giştî) bi diyarkirina beşa ji saeta were kêmtir. Ew bi piranî bi peyvika "kêm" tê diyarkirin:

- 2:45: Saet sê kêm çarêkek e

- 2:40: Saet sê kê m bîst e
- 4:55 Saet pênc kê m pênc e

Ji bilî vî awayê serdest, herwiha awayekî din bi taybetî li Bakurê Kurdistanê heye ku kê m-zêde wergera formula tirkî ye:

- 4:50 Ji pênc(n) re 10 heye (yan: Ji pêncan re 10 deqe/deqîqe/xulek heye) – bidin ber tirkî "beşe 10 dakika var"

Ji bilî lêkera "heye", herwiha lêkerên "maye", "divê", "kê m e" jî li hin deran tên bikaranîn. Bo nimûne dîsa 4:50:

- Ji pênc(n) re 10 (deqe/deqîqe/xulek) maye
- Ji pênc(n) re 10 (deqe/deqîqe/xulek) divê
- Ji pênc(n) re 10 (deqe/deqîqe/xulek) kê m e

Peyva serdest û xwemalî ya bi maneya "15 deqe/deqîqe/xulek" gotina "çarêk" (li hin deveran "çarîk") anku "yek ji çarê/çaran" e.⁸² Lê li hin deveran herwiha peyva ji erebî wergirtî rib' / rub' jî tê xebitandin.

Bo ku mirov diyar bike ku filan tişt di bêvan saet û deqeyê de qewimiye yan dê biqewime, herdu komdevokên kurmanciya navendî û rojhilatî dikarin van heman formên neçemandî anku xwerû jî bi kar bînin:

- Bername dê saet deh û pênc (deqe) dest pê bike
- Bernameyê saet deh û pênc (deqe) dest pê kir

Lê herdu komdevok dikarin hejmara dawiyê yan jî navdêra li pey hejmara dawiyê biçemînin, devokên navendî bi paşgira "-a(n)", devokên rojhilatî bi paşgira "-ê":

Navendî:

- Bername dê saet deh û pêncan (yan: pênc deqeyan) dest pê bike
- Bernameyê saet deh û pêncan (yan: pênc deqeyan) dest pê kir

Rojhilatî:

- Bername dê saet deh û pêncê (yan: pênc deqeyê) dest pê bike

⁸² Hevwateya wê ya tirkî "çeyrek" ji zimanên îranî hatiye wergirtin.

- Bernameyê saet deh û pêncê (yan: pênc deqeyê) dest pê kir

Gava ku mirov behsa vekişîna / xayandina demê bike û di demê de nîv saet hebe, hingê hejmara saetan dikeve berî peyva "saet" lê peyva "nîv" dikeve dûv wê:

- du saet û nîv (ne "*du û nîv saet" – bidin ber tirkî "iki buçuk saat" yan inglîzî "two and a half hours" – lê di inglîzî de forma "two hours and a half" ya nêzîktirî forma kurdî jî li kar e.)

12.6. Çend caran?

Di hin zimanan de li şûna peyvên kurdî "carekê, du caran, sê caran" û hin "carên din" yê destpêkî navên xwe yê taybet hene ku ne ji peyva bi nameya "car" û hejmara wê carê hatine çêkirin.

Bo nimûne, di inglîzî "once" tê maneya "carekê", "twice" dibe "du caran" û "thrice" wateya "sê caran" dide. "Once" bi zelaî têkilî peyva "one" (yek), "twice" hevrehê peyva "two" (du) û "thrice" jî eleqedarî peyva "three" (sê) ye lê di ti ji van gotinan de peyva inglîzî ya bi wateya "car" ya kurdî anku "time" nehatiye bikaranîn.

Di zimanên kevn yê îranî de jî peyvên wisa hebûn. Bo nimûne, bi avestayî avestayî peyva "hekirit" wateya "carekê", "biş" maneya "du caran" û "thriş" jî raman "sê caran" dida.

Di kurdî û zimanên din yê îranî yê niha de peyvên wiha serbixwe nemane. Li cihê wan hejmarên bingehîn li gel peyva "car" yan hevwaterke wê ya din, bo nimûne di farisî de "bar", tê bikaranîn. Ev "bar" a farisî ya bi wateya "car" di kurdî de jî bo nimûne di peyva "dubare" de cih girtiye.

Tek peyva ku mirov dikare texmîn bike ya bi maneya "du caran" yan "cara duyem" peyva "dîsa(n)" e. Lê ew jî ji hejmara "du" zêdetir têkilî peyva "(ya/yê/yên) dî/din" e.

13. PARHEJMAR

Mebest ji **parhejmaran** (herwiha "parjimar, ker, kert, fraksiyon", bi inglîzî "fraction") hejmarên netemam in ku yek yan çend beşên ji tevahiyekê diyar dikin, bo nimûne:

- $1/2, 1/3, 1/4, 1/5...$
- $2/3, 2/5, 3/7...$

Di kurdî û piraniya zimanên din jî navekî xwerû bo $\frac{1}{2}$ yan $1/2$ heye ku bi kurmancî "nîv" e, bi soranî "nîw", bi farisî "nîm", erebî "nisf", tirkî "yarî", bi inglîzî "half" e û hwd. Ew maneya beşek ji herdu beşên ku tevahiyê pêk tînin dide. Bo nimûne "nîv saet" anku "30 deqe / deqîqe" anku beşek ji herdu beşên ku dibin saetek anku 60 deqîqe.

Wek din binavkirina parhejmaran bi piranî ji navên hejmarên bingehîn hatiye çêkirin. Peyva herî berbelav ya wiha çêkirî di kurdî de "çarêk" (yan "çarek") ku maneya $\frac{1}{4}$ anku beşek ji her çar beşên tevahiyê pêk tînin dide. Bo nimûne "çarêkek" yan "çarêkeke saetê" anku "15 deqîqe" ku yek ji çar beşan e ku pêkve dibin 60 deqîqe anku saetek.

Peyva "çarêk" ji hejmarên "çar-yek" pêk hatiye. Hevwateya wê *rib', rub'* – ku carinan di kurdî de jî tê bikaranîn – ji erebî hatiye û ew jî têkilî peyva erebî *erbe'e* (çar) e. Hevwateya peyva "çarêk" di inglîzî de "quarter" e ku ew jî ji latînî hatiye û têkilî peyva "quattro" anku "çar" e. Hevwateya peyva "çarêk" di zimanê tirkî de "çeyrek" e ku ji zimanekî îranî hatiye wergirtin loma naşibe peyva tirkî "dört" (çar) lê peyva îranî "çar".

Wek prensîp, di kurdî de mimkin e ku beşek ji hemû hejmarên din jî bi heman awayî were diyarkirin anku bi qalibê "hejmara mezintir + yek / êk":

- $1/3$ sêyek / sêyêk (anku "ji sê beşan beşek" yan "beşek ji sê beşan")
- $1/5$ pêncyek / pêncêk
- $1/6$ şeşyek / şeşêk
- $1/10$ dehyek / dehêk
- $1/20$ bîstyek / bîstêk
- $1/100$ sedyek / sedêk
- $1/1000$ hezaryek / hezarêk

Lê di pratîkê de, ji bilî peyva "çarêk", ev awayên parhejmaran pir kêmtên bikaranîn. Li şûna wan, zêdetir yek ji van formên gotin (parhejmara 1/5 wek nimûne):

- yek ji pêncan / ji pêncan yek (kurmanciya navendî)
- yek ji pêncê / ji pêncê yek (kurmanciya rojhilatî)

Eger beş ji yekê zêdetir bin, hingê qalibê "hejmara mezintir + hejmara biçûktir" ne mimkin e anku formên wiha di kurdî de nayên gotin:

- *pêncdu (2/5)
- *heftsê (3/7)

Bo diyarkirina parhejmarên wiha, formên wek van tînan xebitandin:

- du ji pêncan / ji pêncan du (kurmanciya navendî)
- du ji pêncê / ji pêncê du (kurmanciya rojhilatî)
- sê ji dehan / ji dehan sê (kurmanciya navendî)
- sê ji dehê / ji dehê sê (kurmanciya rojhilatî)

Ji bilî paşgira "-an" (bi devkî "-a") kurmanciya navendî li gel çend hejmarên dehkî yan sedkî paşgira "-î" jî bi kar tîne:

- 1/20 yek ji bîstî / ji bîstî yek
- 3/100 sê ji sedî / ji sedî sê

Bo diyarkirina yek yan çend beşan ji sed beşên ku tevahiyê pêk tînin anku %, di kurmancî de bi alfakariya daçeka "ji" tînan bikaranîn. Kurmanciya rojhilatî bi piranî paşgira "-ê" dide pey peyva "sed", carinan paşgira "-a(n)". Kurmanciya navendî bi piranî paşgira "-î" bi peyva "sed" ve dike û carinan jî paşgira "-a(n)":

- 5/100 yan 5 %: "pênc ji sedî/sedan" yan "ji sedî/sedan pênc" (kurmanciya navendî)
- 5/100 yan 5 %: "pênc ji sedê/sedan" yan "ji sedê/sedan pênc" (kurmanciya rojhilatî)

Ji bilî daçeka "ji" ya kurmancî, carinan di bin tesîra soranî de di kurmancî de daçeka "li" di hin devokên ser sinorê soranî û di hin nivîsên ji soranî wergerandî de tînan xebitandin. Carinan jî hem di kurmancî û hem jî di soranî de daçeka "der" (tê de, li) ya farisî di diyarkirina % de tînan xebitandin:

- pênc der sed (5/100)

Bi taybetî jî gotina farisî "sed-der-sed" gelek caran di kurdî de jî bi maneya "bi esehî, bi piştrastî, bi dilniyayî" tê xebitandin.

14.2. Kêmkirin

Awayê herî berbelav yê bilêvkirina nîşana – di formûlayên matematîkê de bi kurmancî de bi peyva "kêm" e. Wek di zêdekirinê de jî, li cihê nîşana wekhevîyê (=) dîsa peyvên wek "dibe, dike, dibin, dîkin" tên gotin. Bo nimûne: $5 - 2 = 3$.

- pênc kêm du dibe sê
- pênc kêm du dike sê
- pênc kêm du dibin sê
- pênc kêm du dîkin sê

Dîsa gelek varyantên kêmtir tên bikaranîn jî di zimanê devkî de hene, wek nimûne:

- duyan ji pêncan kêm bikî, dibe sê
- duyan ji pêncan bixwî/rakî/biavêjî, dike sê

Herwiha çendîn awayên "zanistî" di vê meseleyê de jî hatine pêşniyazkirin⁸⁴ awayê jorîn yê devkî ji hemûyan zêdetir tê bikaranîn, ji hemû siviktir û hêsantir e û hêjayî bikaranînê ye.

14.3. Carkirin

Bilêvkirina nîşana x di formûlayên matematîkê de di piraniya – eger ne tevahiya – kurmancî de bi peyva "caran" (bi devkî "cara") ye. Bo nimûne $2 \times 3 = 6$:

- du caran sê dibe şeş
- du caran sê dike şeş

Carinan li cihê peyva "caran", forma wê ya neçemandî "car" tê xebitandin (di soranî de jî ew neçemandî di van formûlayan de tê bikaranîn):

⁸⁴ Bo varyantên devokî û pêşniyazên çêkirî, dîsa binêrin koma "Zimanê Kurdî":

<https://www.facebook.com/groups/zimanekurdi/search/?query=Spas%20bo%20bersiv%C3%AA%20we%20li%20ser%20pirs%C3%AA%20p%C3%AA%C5%9Ftir.%20Niha%20j%C3%AE%20kerem%20bikin%20v%C3%AA%20hesab%C3%AA%20bi%20peyvan%20fgotinan%20bib%C3%AAjin%3A>

- du car sê dibe/dike şeş

14.4. Parvekirin

Nîşana parvekirinê (lêvkekirinê, dabeşkirinê) anku ÷ yan / li gor devokan bi çend awayên ji hev cuda tê bilêvkirin. Di kurmançiya navendî de ew bi piranî bi lêkera "parve kirin", di kurmançiya rojhilatî de bi lêkera "lêkve kirin" e û di soranî de jî bi piranî wek "dabeş kirdin" e ku wek "dabeş kirin" ketiye kurmançiya nivîskî jî.

Hejmarnav dikarin bi pirhejmarî bên bikaranîn, wek:

- şeşan li duyan parve bikî, dibe/dike sê
- şeşan li duyan lêkve bikî, dibe/dike sê
- şeşan li duyan dabeş bikî, dibe/dike sê

Yan jî hejmarnav dikarin bi yekhejmar bên çemandin:

- şeşê li duyê parve bikî, dibe/dike sê
- şeşê li duyê lêkve bikî, dibe/dike sê
- şeşê li duyê dabeş bikî, dibe/dike sê

Di bilêvkirina formûlaya parvekirinê de jî hin varyantên ji van yên li jor diyarkirî piçekê cuda jî hene yan hatine pêşniyazkirin⁸⁵, bo nimûne:

- şeşê li duyê par bikî
- şeşan li ser duyan lêkve bikî

⁸⁵ Binêrin bo nimûne:

<https://www.facebook.com/groups/zimanekurdi/search/?query=D%C3%AEna%20gelek%20spas%20bo%20bersivdana%20pirs%C3%AA%20p%C3%AA%5%9Ftir.%20Niha%20kerem%20bikin%20v%C3%AA%20hesab%C3%AA%20j%C3%AEn%20bi%20peyvan%20gotinan%20bib%C3%AAjin>

15. DENGNASIYA HEJMARAN

Di dengnasiya hejmaran de bi kêmi ev her sê tişt giring in: peydabûna dangan di hejmaran de, guherîna dengên hejmaran û kirpandina anku girankirina kêteyên hejmaran.

Ji bilî navên hejmarên "sifir, milyon, milyar" û navên hejmarên mezintir (û herwiha hejmara rêzî "ewil" û varyantên wê), hemû hejmarên din yê di zimanê kurdî de bi eslê xwe xwemalî û ji rehên hindûewropî û/yan îranî ne. Loma dengnasiya wan hejmaran jî wek prensîp divê li gor dengnasiya giştî ya zimanê kurdî be. Lê dîsa jî hejmarnav bi dengnasiya xwe hin taybetmendiyên din hene ku di birrên din yê peyvan de yan peyda nabin yan jî nadir in. Em ê behsa van taybetmendiyên dengnasiya hejmarnavan di beşa "15.1. Peydabûna dangan di hejmaran de" bidin.

Di jêrbeşa "15.2. Guherîna dengên hejmaran" de em ê li xusûsiyetên giştî yê guherîna dengên hejmaran binêrin, bi taybetî gava ku hejmarên pêkhatî ji hejmarên sade tî çêkirin.

Di jêrbeşa dawiyê ya vê beşê de anku di "15.3. Kirpandina hejmaran" de em ê berê xwe bidinê ka di kurdî de kîjan kêteya yan hejmarê tê kirpandin an girankirin û ka kirpandina hejmaran li gel birrên din yê peyvan hevger e yan jî nakok e.

15.1. Peydabûna dangan di hejmaran de

Li pêştir li ber her navê her hejmarê bi dirêjahî hatiye behskirin ka ew peyv çawa tê nivîsîn û gotin. Loma li vê derê em ê yek bi yek ji

Ji ber ku piraniya hejmarnavên kurdî xwemalî ne û pir ji mêj ve ye ku di zimanê me de tî bikaranîn, mirov texmîn dike ku ew dê di gor qeyd û bendên giştî yê dengên kurdî bin. Ev bi piranî rast e. Lê eger mirov hinekî kûrtir lê binêre, dê bi hêsanî bibîne ku hejmareke ne kêmi ya diyarde û fenomenên dengnasî di hejmarnavan de hene ku di dengnasiya kurdî ya giştî de nadir û heta xerîb in jî.

Ji hejmaravên xwerû, bi kêmî di van hejmaran de ji aliyê dengnasiya zimanê kurdî de hin tiştên ecêb hene:

- yek, du, heft, sed

Herwiha di hemû varyantên navê hejmara 90 de jî (not, nod, newet, newed, nehwet, nehêd, nehêrt...) li gor şertên giştî yê dengnasiya kurdî tiştên seyr û sosret hene.

Kerem bikin em yek bi yek li van hejmaran binêrin û cudahiyên wan yê ji dengnasiya giştî ya kurdî diyar bikin.

Yek

Navê hejmara "yek" yek ji kêm peyvên kurdî ye ku bi dengê Y dest pê dike.

Ne tenê Y li destpêka peyvên xwemalî yê kurdî nadir e lê kurdî adeten kurdî dengê Y ji peyvên esil-biyani jî diavêje. Loma di kurmancî de "Yûsif, Ye'qûb" yê ji erebî wergirtî⁸⁶ bûne "Ûsiv, Aqob" û peyvên tirkî yê wek "yaprak, yol, yürüyüş" bûne "aprax/îprek, êriş"⁸⁷.

Di zimanên kevn yê îranî de dengê Y hinekî li destpêkê peyda dibû lê ew adeten di zimanên îranî yê nû de bûye C yan J. Loma bo nimûne "yesne-" ya avestayî niha di farisî de "ceşn" û di kurdî de "cejn" e. Peyva "yehûd" ya ji berê ve ji zimanên samî ketî zimanên îranî êdî di kurdî de bûye "cihû".⁸⁸

Herçi çend peyvên xwemalî yê bi Y dest pê dikin in, bo nimûne "yar" û "yarî", tarîxiyên li destpêka wan "e-" hebû ku paşî jê ketiye. Bo nimûne pehlewî "eyar" lê kurdî û farisî "yar".

Eger em ji aliyê dîrokî ve li peyva "yek" binêrin, bi eslê xwe dengê Y li destpêka wê tine bû. Bo nimûne, avestayî "eêwe", sanskrîtî "êke", latînî "unus", inglîzî "one", rûsî "odîn"...

Niha di piraniya devokên kurdî de û herwiha di farisî de jî Y li destpêka vê peyvê heye. Lê di kurdî de jî li hin deveran Y li destpêka wê peyda nabe. Bo nimûne, di kurmanciya rojhilatî de forma serdest "êk" e. Di zazakî de di hin devokan wek "jew, jû" tê gotin (li şûna forma "yew" ya hin devokên din yê zazakî). Anku Y-ya vê peyva zazakî wek Y-yê din yê destpêkê di zimanên îranî de bûye C/J.

⁸⁶ Erebi bi xwe jî ew ji îbrî/îbranî wergirtine.

⁸⁷ Di soranî de herwiha "yavaş, yonca" yê tirkî jî bûne "hêwaş, wence" (hêdî, nefel).

⁸⁸ Ketina D ji paş vokalan di kurdî de diyardeyeke giştî ye, bo nimûne farisî "bad, bûd" lê kurdî "ba, bû".

Anku dengê Y li destpêka peyva "yek" gelek ecêb e. Di peyvên din de Y yan ji destpêkê ketiye yan jî guheriye lê di "yek"ê de ew li peyvê zêde bûye! Sebebê zêdebûna wê li navê hejmara 1 nayê zanîn.

Du

Peyva "du" (2) yek ji kêm peyvan e ku dengê U li dawiya wê peyda dibe. Peyvên din "tu" ya cînavê duyem yê yekhejmar û peyvika "tu/çu" (hîç) e lê ev peyv jî di axiftinê de gelek caran dibin "ti/çi".

Di soranî de navê hejmara 2 adeten wek "dû" tê gotin û nivîsîn. Dengê Û ji dengê U zêdetir li dawiya peyvan peyda dibe, bo nimûne "bû, çû, dû(v), gû, kû (li kû?), mû, rû, sû (sûn, hesûn), şû (şû kirin), tû (dara tûyê)".

Lê navê hejmara 2 di kurmancî de zêdetir bi dengê U ye û standard jî wisa tê nivîsîn. Dengê sekunder yê hejmara 2 di kurmancî de "di" ye. Lê ne "u" û ne jî "i" bi berfirehî nayên dawiya peyvan – dengê "i" hinekî ji dengê "u" zêdetir ji ber ku ew di daçekên "bi, di, ji, li" de peyda dibe.

Heft

Dengê H wek di navên Hesên û Hisên de (bi alfabeya erebî ح) bi texmîna hin kesan dengê erebî ye ku di peyvên kurdî yê xwemalî de peyda nabe. Lê hemû kurmancîaxiv û soranîaxiv⁸⁹ vî dengî di navê hejmara "heft" (7) de dibêjin. Bi gotineke din, navê hejmara "heft" bi H-ya wek di navê Hesênî de tê gotin, ne wek H-ya di peyva "heval" de⁹⁰ tevî ku "heft" peyveke esil-kurdî ye û ti têkiliya wê bi erebî ve nîne (di erebî de navê hejmara 7 "seb'e" ye).

Di kurmanciya navendî de gelek peyvên din jî yê xwemalî anku xwerû kurdî bi H-ya wek di navê Hesênî de tên gotin, bo nimûne "hemû, hezar, hirç, heşt / heşt". Lê di kurmanciya rojhilatî û soranî de ev hemû bi H-ya wek "heval" tên bilêvkirin û tenê "heft" bi H-ya wek di navê Hesênî de tê gotin.

Kurmancî û soranî bi piranî H-ya wek di navê Hesênî de di peyvên ji erebî wergirtî de diparêzin, bo nimûne "hîle, helal, heram, hewz, hefs" lê di peyvên xwemalî de di kurmanciya rojhilatî û di soranî de tenê di peyva "heft" de H-ya Hesênî heye.

⁸⁹ Lê ne zazakîaxiv û farisîaxiv.

⁹⁰ Bi alfabeya kurdî-erebî mirov navê vê hejmarê wek حهفت dinivîse (H-ya wek "Hesên"), ne wek ههفت (H-ya wek "heval").

Ev ji aliyê dengnasî ve tiştê ecêb e ji ber ku di eslê navê hejmara 7 de H-ya wek di navê Hesenî tine bû û wek din jî di zimanên îranî û zimanên hindûewropî de ev deng nadir an nedîtî ye. Tiştê hê jî ecêb ew e ku peyvên ji "heft"ê çêkirî yên wek "hefte/heftî (7 roj), heftê (70), heftsed (700)" bi heman H-ya wek "heft" (H-ya Hesenî) ne lê "hevde/hivde" (17) di kurmanciya rojhilatî de dîsa bûye H-ya wek di peyva "heval" de.

Sed

Navê hejmara "sed" bi awayan ji aliyê dengnasî ve ecêb e. S-ya wê di nav zarên kurdî de qet nebe di kurmancî û soranî de bi S-ya qelew e (bi alfabeya erebî ص) wek "se(g)" anku "kûçik". Di farisî de niha ew bi S-ya zirav tê gotin lê ji awayê nivîsîna wê (صد) diyar e ku demekê ew di farisî de jî bi S-ya qelew dihat gotin.

S-ya qelew di kurdî de di gelek peyvên din de jî heye, bo nimûne "sal, sar, sond" lê adeten ew tenê li berî vokalên A, O peyda dibe û li pêş vokala E di peyvên xwemalî de hema-hema nedîtî ye, ji bilî peyva "sed" bi xwe û herwiha peyva "se(g)" anku "kûçik".

Tiştê din yê ji aliyê dengnasî ve ecêb di peyva "sed" de D-ya li dawîya wê ye. Adeten di kurdî de di peyvên xwemalî de D ji pey vokalan ketiye. Loma bo nimûne di farisî de mirov dibêje "bad, bûd" lê di kurmancî û soranî de "ba, bû" û di zazakî de "va, bî".

Di nav peyvên xwemalî yên kurdî de ti peyveke din nabînim ku D li pey vokalê nabe ji bilî peyva "sed". Di rastiyê de di zazakî de D di vê peyvê de nîne û loma mirov bi wî zarî dibêje "se" (pirhejmar "sey"). Lê kurmancî û soranî forma "sed" ya D li dawiyê bi kar tînin ku li gor dengnasiya giştî ya kurdî ecêb e. Sebebê parastina D li dawîya peyva "sed" (yan jî vegerandina D-ya ji dawîya wê ketî) mimkin e ku bi mebesta rêgirtina li ber şaşkirina hejmara 100 li gel hejmarên 3 û 30 be çunkî eger 100 "se" bûya, dê di axiftin û bihîstinê de şaşbihîstina wê li gel "sê" û "sî" hêsan bûya. Yan jî mimkin e – û belkî ihtimal e – jî ku kurmancî û soranî bi çavkirina li farisî forma "sed" parastibe yan jî forma "sed" dîsa li cihê "se" bi cih kiribe.

15.2. DENGGUHERÎN DI HEJMARSZIYA KURDÎ DE

Gava ku navên hin hejmarên mezintir ji hejmarên biçûktir tê çêkirin, hin guherînên dengî di hejmaran de peyda dibin. Bo nimûne, li van hejmaran binêrin:

- heft / hevde, hivde / hef(t)sed, hef(t)sid
- heşt / hejde, hijde / heş(t)sed, heş(t)sid
- pênc / pênc(c)sed, pênc(c)sid
- deh / çarde(h)

Guherînên dengî yê navbera hejmarên 1 – 9 û hejmarên 11 – 19 li gel nasandina hejmarên 11 – 19 yek bi yek hatine behskirin û sebebên wan dengguherînan yê dîrokî li wê derê hatine pêşkêşkirin.

Ji bilî sebebên dîrokî yê cudahiyên van dangan, wek din dengguherîn li gor dengnasiya giştî ya zimanê kurdî ne.

Sivikbûna koma konsonantî

Yek dengguherînên serekî ketina yek ji sê konsonantan e gava ku ew tîr ber hev. Loma “heft + sed” di gotinê de dibe “hefsed” anku T ji komkonsonantên FTS dikeve. Herwiha “heşt + sed” dibe di axiftinê de dibe “heşsed” anku T ji koma ŞTS dikeve. Herwiha “pênc + sed” di gotinê de dibe “pênsed” anku C ji koma NCS dikeve.

Ev diyarde ne tenê di hejmaran de lê herwiha di birrên din jî yê peyvan de diyar dibe. Bo nimûne:

- dest + -mal → destmal → desmal
- dest + -pêk → destpêk → despêk
- pênc + şem → pêncşem → pêşem (herwiha → pêşem)

Dengguherîn ji ber tesîra lertzê

Guherîna din ya giştî veguhastina dengên bilerz F / Ş bi hevberên wan yên bilerz V / J ye ji ber peyva li pey tê ku “-deh” e anku bi dengê D dest pê dike ku ew jî wek V / J dengekî bilerz e:

- heft + deh → *heftdeh → *hefdeh → hevdeh
- heşt + deh → *heştdeh → *heşdeh → hejdeh

Ketina H ji dawîya hejmarnavan

Ketina yan peydabûna dengê H di gelek zimanên din de jî di hin peyvan de ne sabit e. Ew dikare ji peyvên heyî bikeve yan li peyvên ku berê tê de tine bû zêde bibe. Di soranî de ew qet li dawîya peyvê nemaye. Di kurmançî de ew wek prensîp li her dera peyvê peyda dibe. Lê ew dikare di hin peyvên ji eynî rehî de hebe û zerûrî be û din yên din yên dîsa ji heman rehî de peyda nebe.

Bo nimûne, piraniya kurmançîaxivan hejmara 10 bi navê “deh” dinasin ku H tê de heye. Di kurmançî de herwiha li dawîya navên hejmarên 11 – 19 li piraniya deverên kurmançîaxiv peyva “deh” heye (yazdeh, diwazdeh, sêzdeh, çardeh...) lê piraniya kurmançîaxivan wê bêyî H-ya dawiyê dibêjin (yazde, diwazde, sêzde, çarde...)

Guherîna E bi I

Tarîxiyên piraniya E-yên peyvên hindûewropî yan îranî di kurmançî de (û bi rêjeyê mezîna lê ne bi qasî kurmançî herwiha di soranî de jî lê ne di zazakî yan farisî de) bûne I. Loma bo nimûne zazakî

“keredene, berdene, merdene, wesar” û farisî “kerden, borden, morden, behar” lê soranî “kirdin, birdin, mirdin, behar” û kurmancî “kirin, birin, mirin, bihar”.⁹¹

Guherîna E bi I di kurmancî de bihêz e lê tiştê ecêb ew e ku em vê dengguherînê li gel navên hejmarên 1 – 9 nabînin. Loma em dibêjin “yek, şeş, heft, heşt, neh”, ne “*yik, *şış, *hif, *hişt, *nih”. Anku dengnasiya hejmarnavên 1 – 9 li gor dengnasiya giştî ya kurmancî hinekî surprîz e.

Lê gava ku em li hejmarên mezintir binêrin, em dikarin bi hêsanî bibînin ku li hinek deveran hewl tê da ku di hejmaran de jî E bikin I. Bo nimûne:

- “hivde(h)” li şûna “hevde(h)” (di peyva “heft” de E heye lê di “hivde” de bûye I)
- “hijde(h)” li şûna “hejde(h)” (di peyva “heşt” de E heye lê di “hijde” de bûye I)

Hemû kurmancîaxiv navê hejmara 100 ya serbixwe wek “sed” anku bi dengê E dibêjin. Lê gava ku behsa ji yekê sêdetir sedan tê kirin, hinek dever (lê ne hemû) dengê E di peyva “sed” de bi I vediguhêzin:

- “dusid” li şûna “dused”
- “sêsid” li cihê “sêsed”
- “nehsid” ji dêlva “nehsed”

15.3. Kirpandin di hejmarnavan de

Di dengnasiyê de mebest ji kirp an kirpandinê (bi inglîzî “stress”) ew e ku kîteyek an beşek ji peyvê ji kîteyên din girantir an xurttir tê gotin. Li gor qeyd û benda giştî kîteya dawiyê ya navdêr, rengdêr û lêkerên (lê ne hokerên) neçemandî û bêravek tê kirpandin anku girankirin an xurtkirin.⁹² Bo nimûne (kîteya kirpandî hatiye **qelew** hatiye nivîsîn):

⁹¹ Di soranî de guherîna E bi I ne hindî kurmancî bihêz e loma daçekên soranî E parastiyê “be, de, le” lê kurmancî E di wan de jî kiriye I “bi, di, li, ji” – hevrehê “ji” ya kurmancî di soranî de nemaye.

⁹² Bo giranî û kirpê di dengnasiya kurdî de bi berfirehî binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/12/04/girani-di-dengnasiya-kurdi-de/>

- navdêr: **havîn**, **zivistan**, **welat**
- rengdêr: **mezin**, **biçûk**, **qelew**
- lêker: **kirin**, **gotin**

Eger peyv yekkîteyî be, hingê ew kîte tê kirpandin anku hemû peyv kirpandî ye.

Di meseleya kirpandin û girankirina dengî de hejmarnav bi piranî (bo istisnayan li jêrtir binêrin) jî wek navdêr, rengdêr û lêkerên neçemandî û bêravek in anku kirpandina li dawiya peyva neçemandî û bêravek e.

Kirpa hejmarên bingehîn

Ji ber ku hemû navên hejmarên 1 – 9 yekkîteyî ne, ew nav bi tevahiya xwe ve kirpandî anku xurtkirî tîr gotin. Anku:

- **yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh**

Ji hejmarên mezintir jî ev yekkîteyî ne:

- **deh, bîst, sî/sih, çil, şêst, not, sed**

Piraniya hejmarên din yên kurdî dukîteyî yan dirêjtir in.

Navên hejmarên 11 – 19 di kurmançî de xwedî du desteyên ji hev cuda ne lê navên herdu destan jî bi piranî dukîteyî ne û kîteya dawiyê (anku kîteya duyem) kirpandî an girankirî ye (di nimûneyan de beşa kirpandî hatiye **qelew**kirin):

- desteya yekem (kurmançiya rojhilatî û kurmançiya navendî): yaz-**de**, sêz-**de**, çar-**de**, paz-**de**, şaz-**de**, hev-**de**, hej-**de**, noz-**de**⁹³

⁹³ Li vê derê me tenê varyanteke navên nav hejmaran daye lê ji aliyê kirpandinê ve varyantên din jî (bo nimûne “yazdeh, yanzde, yanzdeh” yan “yanze” ya soranî) bi eynî awayî ne anku dukîteyî ne û kîteyam dawiyê/duyem kirpandî anku girankirî ye.

- desteya duyem (kurmanciya rojavayî): dew-**yek**, dew-**du**, dew-**sê**, dew-**çar**, dew-**pênc**, dew-**şeş**, dew-**heft**, dew-**heşt**, dew-**ne(h)**

Di desteya yekem de navê hejmarê 12 wek “di-waz-de(h), du-waz-de(h), di-wanz-de(h)” tê nivîsîn anku wek ku sêkîteyî be. Lê di rastiye de “diwaz- / duwaz- / diwanz- / duwanz-“ wek “dwaz- / dwanz-“ anku wek yekkîteyî tên gotin.

Hejmarên desteya duyem gelek caran di zimanê nivîskî de bi awayê “de-hû-yek-, de-hû-du, de-hû-sê...” tê nivîsîn heçku sêkîteyî bin lê di axiftinê de tenê dukîteyî ne û wek “dew-yek, dew-du, dew-sê...” tên gotin. Lê di vê desteyê de navê hejmarên 12 û 13 herwiha varyantên “dew-di-**du**” û “dew-si-**sê**” jî hene ku bi rastî jî sêkîteyî ne û kîteya sêyem jê kirpandî ye.

Ji dehhejmaran navên hejmarên 50, 70, 80 dukîteyî ne:

- pênc-**cî**, hef-**tê**, heştê

Navê hejmarê 90 bi formên xwe yê serdest “not, nod” yekkîteyî ye lê di hin devokan de bi van forman e dukîteyî ne û kîteya wan ya duyem/dawiyê kirpandî ye:

- neh**wed** / neh**wet** / neh**wêt** / neh**wêd** / neh**wêrt**...

Navê hejmarên sedhejmarên 200 – 900 dukîteyî ne û dîsa kîteya duyem

- dused, sêsed, çarsed...

Navê hejmarên 1 000, 1 000 000 û 1 000 000 000 dukîteyî ne û dîsa kîteya duyem/dawiyê kirpandî ye:

- he-**zar**, mil-**yon**, mil-**yar**

Herwiha “bil-**yon**” û “tril-**yon**” jî dukîteyî ne lê “kat-ril-**yon**” û hin hejmarên mezintir sêkîteyî yan dirêjtir in. Lê dîsa jî kîteya dawiyê kirpandî ye.

Navê hejmarê 0 carinan wek “sifr” û carinan jî wek “sifir” tê nivîsîn. Ji aliyê dengnasî ve ew “sifr” anku yekkîteyî ye. Eger ew wek dukîteyî were hesibandin, hingê kîteya yekem kirpandî ye anku “sifir”. Ev ne li gor dengnasiya hejmarên kurdî ye û loma çêtir e ku mirov wê wek yekkîteyî bihesibîne û wek “sifr” binivîse.

Kirpa hejmarên rêzî

Kirp an giraniya peyvê di hejmarên rêzî de ne li ser paşgira “-em, -emîn, -a(n), -ê” lê li ser kîteya dawiyê ya wê hejmara bingehîn e ku hejmara rêzî jê hatiye dariştin:

- **yekem, yekemîn, yekê**
- **duyem, duyemîn, duyan / diduyan, duyê**
- **dehem, dehemîn, dehan, dehê**
- **bîstem, bîstemîn, bîstan, bîstê**

Di vê diyardeyê de paşgirên sazkirina hejmarên rêzî ji wek paşgirên çemandin û ravekkirinê ne, ne wek paşgirên peyvsaz in.⁹⁴

Hejmarên hevniwîs lê ne hevkirp

Peyvên “heftê” û “heştê” hem navên hejmarên bingehîn yên 70 û 80 ne û hem jî formên çemandî yên hejmarên 7 û 8 in û herwiha di kurmanciya rojhilatî de navên hejmarên rêzî yên 7 û 8 in:

- Heftê kes li wê derê bûn. (70 kes)
- Destê min li heftê ket. (Li hejmara 7).
- Ew di pêşbirkê de bû yê heftê. (yê heftem – piştî şeşên din)

Lê gava ku mebest hejmarên 70 û 80 be, hingê giraniya peyvê li ser kîteya dawiyê ye:

- **heftê, heştê** (wek pêncî, newet/nehwêt...)

Lê gava ku mebest ji “heftê” û “heştê” hejmarên rêzî yên 7 û 8 an jî formeke çemandî ji hejmarên 7 û 8 be, hingê kîteya yekem kirpandî ye ji ber ku paşgirên çemandin û girêdanê nekirpandî ne û giranî li ser kîteya dawiyê ya beşa neçemandî ya peyvê ye:

- **heftê, heştê** (wek “**yekê, duyê, sêyê, çarê, pêncê...**”)

⁹⁴ Bo paşgirên peyvsaz, binêrin: <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/08/peyvsazi-kiteb1.pdf>

16. RASTNIVÎSÎNA HEJMARNAVAN

Mebest rastnivîsîna hejmarnavan bi dîtina me çend pirsan dihewîne ku em ê li vê derê rêz bikin û dû re li ser her yekê ji wan rawestin:

- çawaniya nivîsîna navê her hejmarê (bo nimûne navê her yek ji 1, 2, 8, 12, 30, 90, 1000...)
- nivîsîna bi hev re yan ji hev cuda ya hejmarên pêkhatî (bo nimûne 21 bi awayê "bîst û yek", "bîstûyek" yan "bîst-û-yek" yan jî 200 bi awayê "dused" yan "du sed" yan "du-sed"...)
- diyarkirina hejmarnavan bi hejmaran (1, 14, 243, 2 000) yan jî bi navên hejmaran (yek, çarde, du hezar...) yan jî beşek bi hejmaran û beşek jî navên hejmaran ("2 hezar")
- nivîsîna paşgiran bi hejmaran ve (bo nimûne "sala 2000an", "sala 2000'an" yan jî "sala 2000-an")

16.1. Nivîsîna navên hejmaran

Rastnivîna tilhejmaran

Awayên serdest û standard yên tilhejmaran di kurmanciya nivîskî de wiha ne:

- **yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh**

Ti cudahiyeke mezin ya di nivîsîna tilhejmaran de di zimanê nivîskî de nîne tevî ku 1 carinan bi awayên "êk, yêk", 2 bi şeweyên "di, dû" û 8 jî carinan bi şiklê "heyşt" tê dîtin. Tilhejmar gelek caran di nivîsan de bi navên xwe (yek, du, sê...), ne bi nîşanên xwe (1, 2, 3...), tîna nivîsîn û loma standardiyeke baş peyda bûye.

Di devokên navendî de hejmarên 2 û 3 di rewşa serbixwe de (gava ku ew nakevin berî ti navdêrekî) formên xwe yên dubare hene ku awayên wan yên serdest wiha ne:

- didu, sisê

Hejmarên dehgir

Hejmarên dehgir çendîn awayên cuda hene. Ew hinekî li gor devokan ji hev cuda ne. Di nivîsan de ew bi piranî bi nîşanên xwe (11, 12, 13...) – ne bi navên xwe (yazde, diwazde, sêzde...) tên nivîsîn. Loma ti standardiyeke bêguman peyda nebûye. Hinek nivîskar formên wan yên giran û dirêj tercîh dikin (wek "diwanzdeh") ji ber ku bi qenaeta wan ew form "orijîntir" in. Hinek nivîskar jî formên kurttir dinivîsin (wek "dozde") ji ber ku bi dîtina wan ew zimanî "hêsantir" yan "xweştir" dikin.

Piraniyar reha û mutleq ya devokên kurmançî (û herwiha tevahiya soranî jî), formên bi "-de" bi kar tînin, ne formên bi "-deh":

- yazde, diwazde, sêzde (ne "yazdeh, diwazdeh, sêzdeh...)

Herwiha hejmara devok an deverên ku dengê N di hinek ji hejmarên dehgir de bi kar bînin pir kême û dîsa piraniya reha û mutleq alîgira formên bêyî N ye:

- yazde, diwaz, pazde... (ne "yanzde, diwanzde, panzde...)

Herwiha gava ku hejmarên dehgir paşgiran digirin, "-de/-deh" dibe "-da(h), -dê" (ne "-deha(n), -dehê"):

- kurmançiya navendî: cara pazda(n) (ne "cara pazdehan")
- kurmançiya rojhilatî: cara pazdê (ne "cara pazdehê")

Ev jî delîla wê yekê ye ku piraniya devokên kurmançî – eger ne hemû dengê H li dawiya hejmarên dehgir (11 – 19) qebûl nake. Divê zimanê nivîskî jî qedrê vê rastiyê bigire. Loma divê tercîha hejmarên dehgir wiha be:

- **yazde, diwazde, sêzde, çarde, pazde, şazde, hevde, hejde, nozde**

Di hin devokan de navê hejmarên 17 û 18 wek "hivde, hijde" tê nivîsîn lê ji hejmarên 7 û 8 diyar e ku dengê orijîntir E ye (hevde, hejde) û madem ku ev form bi berfirehî di devokan de jî hene, divê tercîha standardkirinê wiha be:

- hevde, hejde

Rastnivîsîna dehhejmaran

Navên dehhejmaran (10, 20, 30... 90) di kurmancî de kurt in û loma gelek caran di nivîsan de jî bi navên xwe (wek "deh, bîst, sî, çil...") tê nivîsîn li gel ku carinan bi nîşanên xwe jî (10, 20, 30, 40...).

Ji ber ku ew di nivîsan de gelek caran bi navên xwe tînin nivîsîn, standardiyêke têra xwe baş peyda bûye. Li gel çend formên cuda yê devokî jî, formên serdest û standard di zimanê nivîskî de wiha ne:

- **deh, bîst, sî, çil, pêncî, şeş, heftê, heştê, not**

Rastnivîsîna hejmarên mezintir

Forma tekane ya navê hejmara 100 di tevahiya kurmancî û soranî de "sed" e. Bo hejmarên 1 000, 1 000 000, 1 000 000 000 çendî formên cuda hene lê formên serdest û standard wiha ne:

- hezar, milyon, milyar (ne "hizar, mîlyon, mîlyar")

Bo sedhejmaran di hin devokan de "-sid" tê bikaranîn (du sid, sê sid) lê forma serdest û standard bi "sed" e:

- **du sed, sê sed, çar sed...**

Çend sedhejmar di axiftinê de tînin sivikkirin (wek "pênsed, şesed, hefsed, heşsed/hesed, nesed") lê di nivîsînê de formên serdest û standard yê nesivikkirî ne:

- **pênc sed, şeş sed, heft sed, heşt sed, neh sed**

16.2. Bi hev ve yan ji hev cuda?

Yek ji pirsên serekî yê rastnivîsîna hejmarnavan meseleya nivîsîna hejmarên pêkhatî bi hev ve yan jî ji hev cuda ye. Bo nimûne, gelo 21, 300, 12 000 û 1997 çawa binivîsin binivîsin:

- "bîst û yek", "bîst-û-yek" yan "bîstûyek"?
- "sê sed", "sê-sed" yan "sêsed"?
- "diwazde hezar", "diwazde-hezar" yan "diwazdehezar"?
- "hezar û neh sed û not û heft", "hezar-û-ne-seh-sed-û-not-û-heft" yan "hezarûnehsedûnotûheft"?

Ji ber ku hejmarên dirêj, bo nimûne 1997, kêman caran bi navên xwe tên nivîsîn, ti standardiyê berçav di zimanê kurdî de li ser meseleya bi hev ve yan jî ji hev cuda nivîsîna navên hejmarên pêkhatî peyda nebûye. Hin kes her peyvê ji hev cuda dinivîse, wek "hezar û neh sed û not û heft". Hin kes hin hejmaran bi hev ve dinivîsin, bo nimûne wek "hezar û nehsed û not û heft" yan "hezar û nehsed û notûheft". Lê pir bi degmen û nadîrî hemû rêza hejmaran bi hev ve tê nivîsîn, wek "hezarûnehsedûnotûheft".

Di piraniya zimanên din de jî ti standardiya reha û mutleq di nivîsîna bi hev ve yan jî nivîsîna ji hev cuda ya rêzehejmaran peyda nabe. Hem zimanên cuda li ser meseleyê li hev nakin û hem jî di nivîsîna bi heman zimanî de nivîser li hev nakin.

Lê mirov dikare bo rastnivîsînê argumenteke wiha pêşkêş bike:

Nivîsîna hemû rêzehejmarê bi hev ve xwandina wê pir dijwar dike. Loma xwandin û fehmkirina merema rêzehejmareke wek "hezarûnehsedûnotûheft" gelek dijwar e. Loma ne baş e ku hemû rêzehejmar bi hev ve were nivîsîn.

Li aliyekî din, nivîsîna hin beşên rêzehejmarê û cudakirina hin beşên din ji wê dibe sebebê keyfîyet û dûvdiliyê û ti lojîk û mantiq tê de namîne. Bo nimûne, eger em 1997 wek "hezar û nehsed û not û heft" (hevgihandina "neh" û "sed"ê) yan "hezar û nehsed û notûheft" (hevgihandina "neh-sed" û "not-û-heft"ê), çima em "hezar" û "nehsed"ê yan "nehsed" û "notûheft"ê negihînin hev? Anku ev rêbaz jî nabe.

Li ber me hê jî du alternatîv dimînin. Bo nimûne, em dikarin hejmara 1997 bi van awayan binivîsin:

- du hezar û neh sed û not û heft
- duhezar û nehsed û not û heft

Di forma jortir de her peyv ji hev cuda hatiye nivîsîn. Di forma duyem de hejmarên ku "û" di navbera wan de heye ji hev cuda hatine rêzkirin lê hejmarên ku "û" di navbera wan de nîne bi hev ve hatine nivîsîn.

Bi texmîna min ev herdu awa jî baş in lê madem ku ti zerûrî nîne ku illeh em "du" û "hezar" yan "neh" û "sed" bi hev ve binivîsin, bo hêskirina rê û rêbaza rastnivîsînê, baştir e ku mirov wek qeyd û bendeke giştî bibêje:

- **hejmarnavên rêzehejmarê û herwiha peyvika "û" hemû ji hev cuda tên nivîsîn.**

Lê hêjayî gotinê ye ku navên hejmarên 11 – 19 bi desteya xwe ya "yazde, diwazde, sêzde, çarde, pazde, şazde, hevde, hejde, nozde" bi zerûrî bi hev ve tên nivîsîn anku nivîsîna wan wek "yaz de, diwaz de, sêz de..." ne mimkin e ji ber ku "yaz, diwaz, sêz..." ne peyvên serbixwe ne.

Lê navên heman hejmarên 11 – 19 bi desteya xwe ya "deh û yek, deh û du, deh û sê" (ku di kurmanciya rojavayî de tên bikaranîn) dikarin – û divê – ji hev cuda bên nivîsîn.

16.3. Nivîsîna bi hejmaran an hejmarnavan?

Yek ji mijarên rastnivîsîna hejmaran jî ew e ka mirov di nivîsînê de kengî wan bi hejmaran (bo nimûne wek "1, 14, 243, 2 000") û kengî jî bi navên hejmaran (wek "yek, çarde, du sed û çil û sê, du hezar") binivîse?

Wek prensîp, herdu awa jî rast in. Lê bo parastina kurtiya nivîsînê û herwiha bo hêskirina têgihîştinê, rêzehejmar bi navên xwe nayên nivîsîn eger ji gelek peyvan pêk bên. Loma bo nimûne nayê tercîhkirin ku mirov binivîse "du sed û çil û sê" yan "hezar û neh sed û not û heft" lê baştir e ku ev rêzehejmar bi hejmaran wek "243" û "1997" werin nivîsîn.

Lê rêzehejmarên ku bi navên xwe kurt bin, dikarin di nivîsan de bi navên xwe bên nivîsîn, bo nimûne "yek, heft, bîst, heftê, sed, hezar". Ne tenê rêzehejmarên yekpeyvî lê yên dupeyvî jî gelek caran di nivîsan de bi navên xwe tên diyarkirin, bo nimûne "çar sed", "sê hezar", "şeş milyon".

16.4. Nivîsîna paşgiran bi hejmaran ve

Carinan di hevokan de nîşanên hejmaran (1, 2, 40, 132, 1 000...) herwiha hin paşgir jî (bo nimûne "a, -an, -em, -emîn, -ê, -ên, -î...") jî tên nivîsîn gava ku ew (bi rastî yan jî bi texmîna nivîserên wan) ew paşgir pêdivî û lazim bin.

Hin caran paşgir yekser bêyî ti tiştêkî din bi hev ve tên zeliqandin, bo nimûne:

- sala 2017an (kurmanciya navendî), sala 2017ê (kurmanciya rojhilatî)
- kesê 3yem

Carinan jî îşareteke xalbenîyê (bo nimûne - yan ' yan jî :) di navbera hejmarê û paşgirê de tê bicihkirin. Wek mînak:

- sala 2017-an, kesê 3-yem
- sala 2017'an, kesê 3'yem
- sala 2017:an, kesê 3:yem

Kurdînivîsên alîgirên bikaranîna yek ji van îşaretan li hev nakin ka divê kîjan îşaret were bikaranîn. Li aliyekî din, alîgirên ti ji van îşaretan jî nikarin isbat bikin ka çima bikaranîna îşaretê pêdivî û zerûrî ye. Loma bi qenaeta me ti ji van nîşanan neyên bikaranîn çêtir e. Anku em ya herî baş ew e ku em wiha binivîsin:

- **sala 2017an, sala 2017ê**
- **kesê 3yem**

Li aliyekî din, mirov dikare bipirse ka gelo bikaranîna paşgiran bi xwe jî bi rastî zerûrî ye? Di rastiyê de mirov dikare van hejmaran bêyî paşgir jî binivîse û ji tekst û kontekstê diyar e ku eger wek "sala 2017" hatibe nivîsîn jî, mirov her wê wek "sala 2017an" (li gor kurmanciya navendî) yan jî wek "sala 2017ê" (li gor kurmanciya rojhilatî) dixwîne.

Dîsa "kesê 4" jî heta eger paşgir li pey nehatibe nivîsîn jî, mirov fehm dike ku ew bi kurmanciya nivîskî wek "kesê çarem", bi kurmanciya rojhilatî wek "kesê çarê" û bi kurmanciya navendî jî wek "kesê çara(n)" tê gotin.

Anku nenivîsîna paşgiran hem nivîsê kurttir û xweştir dike û hem jî rê dide xwandevanî ku hejmara bêpaşgir bi paşgira devoka xwe bixwîne.

Hejmarên rêzî di piraniya zimanan de herwiha dikarin bi nuqteyekê (.) jî bîn diyarkirin. Hingê "5" tê maneya "pênc" û "5." jî tê wateya "pêncem, pêncemîn, ya/yê/yên pêncê (kurmanciya rojhilatî), ya/yê/yên pêncan (kurmanciya navendî)".

17. PEYVSAZIYA DIN JI HEJMARAN

Li pêştir me bi berfirehî behsa hejmarsaziyê ji hejmaran kiriye anku çawa hejmarên mezintir ji hejmarên biçûktir tên yan hatine çêkirin, bo nimûne:

- çar + deh → çarde(h), deh û yek
- pênc + deh → pa(n)zde(h), deh û pênc

Herwiha me diyar kiriye ku hinek ji hejmarên ku sade yan xwerû dixuyin – bo nimûne "sî" û "çil" – di rastiye de ji hevberên xwe yê tilhejmar in, "sê" û "çar". Heta hejmara "bîst" jî ji hejmara "du" hatiye çêkirin.⁹⁵

Herwiha hinek idiyên pesindnekirî yan ne-esehî yê li ser hindê jî hene ku heta hinek ji tilhejmaran jî ji hin navdêran (ji navê hin tiştan) hatine çêkirin. Lê ev peyvsazî di dema makezimanê proto-hindûewropî de bûye. Di kurdiya niha de û di piraniya zimanên din jî yê niha de êdî adeten hejmarnav ji peyvên ji birrên din (navdêr, rengdêr, lêker...) nayên çêkirin.

Berevajî wê, hejmarnav bi xwe di sazkirina hinek peyvên ji birrên din de beşdar dibin. Li jêr em ê vê peyvsaziya bi hejmarnavan binasînin.

17.1. Hejmarnav di pêkanîna peyvên ne-hejmar de

Mebest ji "pêkanîn"ê li vê derê sazkirina peyvan bi hevghandina du yan zêdetir peyvên serbixwe ye bo çêkirina peyveke nû. Pêkanîn dikare xwerû be anku ji du peyvên serbixwe yê hevghandî be (bo nimûne "du-dil") yan jî bi alîkariya navgirekê be (bo nimûne "hevûdu" ji "hev-û-du").

⁹⁵ Li beşa li ser nasandina dehhejmaran binêrin bo dîtina çawa peydabûna van dehhejmaran.

Navdêr û hejmarnav

Navdêr û çend hejmar jî dikarin peyvên nû pêk bînin. Bi taybetî jî hejmarên “yek” û “du” di van peyvên de cih digire. Endam dikare navdêr, rengdêr an hoker be. Bo nimûne:

- dudil (ji du = hejmar, dil = navdêr) anku kesa/ê bêbiryar, kesa/ê ku nikare yan newêre biryara xwe li ser tiştêkê bide
- ducan / dugiyan: bihemle, girane, bizarr, zarok di zikê de
- çarriyan / duriyan (çar / du + rê + yan): cihê ku du rê di ser hev re derbaz dibin anku mirov dikare bi çar aliyan ve biçê
- dupê (bo nimûne mirov), çarpê (gelek heywan), sêpê (maseya / mêzeya agir li bin hilkirî)
- yekser (dîrekt, rasterast)
- dusibe (kêmtir herwiha: sêsibe, çarsibe, pêncsibe...)

Nîşander û hejmarnav

Nîşander û hejmarnav jî dikarin bi hev re peyvên pêk bînin. Ji nîşanderan axlebe peyva “her” beşdar dibe:

- heryek, herdu, hersê, herçar...

Cînav û hejmarnav

Hejmarnav “du” li gel cînavê “hev” peyvekê pêk tînin:

- hevdu

Ew herwiha bi alîkariya peyvika “û” jî dibe:

- hevûdu

Cînav û hejmarnav

Bi du hejmarnavan di kurmanciya rojhilatî de cînavêk tê çêkirin:

- "yek(û)du, êk(û)du" (anku "hevdu, hevûdu, hevûdin")

Peyvika "û" bi piranî di "yekûdu, êkûdu" de tê bikaranîn lê herwiha formên "yekdu, êkdu" anku bêyî "û" jî hene.

17.2. Hejmarnav di dariştina peyvên ne-hejmar de

Mebest ji "dariştin"ê li vê derê sazkirina peyvan ji yek an çend peyvên serbixwe û bi zêdekirina yek an çend pêşgir an paşgiran e. Bi taybetî ji hejmara "yek" (an varyanta wê "êk") li gel paşgiran komeke peyvên navdêr tên dariştin:

- yekîti (hevgirî, tifaq, ittifaq), yekîne / yeke (unît, wehdet; kom, firqe), yekane (tek zaroka/ê dêbabên xwe)

Hemû hejmarên yek – pênc di sazkirina navên rojên hefteyê de beşdar dibin:

- yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem

Bi henekî herwiha: "şeşşem" (în, eynî, cume) û "heftşem" (şemî, sebt).

17.2. Hejmarên biyanî di peyvên ne-hejmar de

Bi taybetî di gelek peyvên ji zimanên ewropî wergirtî de hejmarnav hene. Bo nimûne:

- unîversal, unîversîte, unîversûm, unît (ji "un-" ya latînî ya bi maneya "yek")
- bisiklêt, biskiwêt (ji "bi-" ya latînî bi wateya "du")
- triyatlon (ji latînî yan yûnanî "trî-" anku "sê")
- kadro, kadir (ji latînî "quottor" anku "çar")
- Pentagon (ji yûnanî "pêntê-" anku "pênc")
- dekatlon (lîstika dehcûreyî, ji yûnanî "dêka-" anku "deh")
- sent, sentîmetre (ji fransî "cent" ji latînî "centum" anku "sed")
- kîlo(gram), kîlometre (ji yûnanî "xîlfoi" anku hezar)

Gotina devkî "fiftî-fiftî" (nîv bi nîv yan 50 % bo her yekê ji herduyan) ji inglîzî "fifty-fifty" anku "pêncî-pêncî (ji sedê)" hatiye.

Ji bilî van peyvên ji zimanên ewropî, herwiha hin peyvên ji hejmarnavan çêkirî ji zimanên Rojhilata Navîn, bi taybetî ji erebî jî ketine kurdî. Bo nimûne:

- itihad, tewhîd, wehdet, Wehîd, Wehîda (ku hemû ji erebî ji rehê "w-h-d-" anku "yek" hatine çêkirin)

Peyva *rib'*, *rub'* bi maneya "çarêk, ¼" li Başûr, Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê li kar in ku ji erebî hatiye wergirtin û hevrehên peyva erebî *erbe'e* (çar, 4) in.

Ji tirkî jî du-sê peyvên argoyî (kolankî, tabûyî) yê hejmarnav tê de derbazî axiftina kurdî (qet nebe li Bakurê Kurdistanê) bûne:

- ûçkaxitçî (hîlebaz, fêlbaz – ji tirkî "ûçkağitçî" ji "ûç" anku "sê")
- otuzbîr, otizbîr (lîstikeke bi kaxizan yan jî "destperkê, masturbasyon, onanîzm" ji tirkî "otuz bir = 31)

Ev peyv û yê li jortir yê ji zimanên ewropî bi xwe di wan zimanan de hatine çêkirin û ji wan hatine wergirtin, ne di kurdî bi xwe de hatine pêkanîn an dariştin.

Carinan jî hin hejmarên biyanî di axiftina kurdî de li cihê hejmarên kurdî tên gotin. Bo nimûne, tişteki normal e ku mirov li Bakurê Kurdistanê ji devê gelek kesan niha gotina "sala iki bin on yedi" anku "sala 2017" bibihîze. Di nav kurdên Başûr û Rojavayê Kurdistanê de mirov gelek caran gotina "miye-bil-miye" (sed ji sedê, 100 %) dibihîze ku ji peyva erebî "miye" (sed) e. Li Rojhilatê Kurdistanê mirov gotinên wek "hezareha, sedeha" (hezaran, sedan) yê farisî dibihîze.

18. PEYVRÊZIYA HEJMARNAVAN

Mebesta me ji "peyvrêziya hejmarnavan" li vê derê hem peyvrêziya anku dora hejmarnavan di nav rêzehejmarê de û hem jî dora hejmarnavan li gel birrên din yê peyvên heman komikê (frazê) ye.

18.1. Peyvrêziya hejmaran di rêzehejmaran de

Qeyd û benda giştî ew e ku di kurdî û piraniya zimanên din de jî di rêzehejmarê de hejmara mezintir berî hejmara biçûktir tê:

- bîst û yek
- sed û bîst
- sed û bîst û yek
- hezar û sed û bîst û yek

Lê eger mebest ji dubarekirina heman hejmarê be û paşgira "û" nekeve navberê, hingê hejmara dubareker berî hejmara dubarekirî tê:

- 200: du sed (ne "*sed du")
- 4 000: çar hezar (ne "*hezar çar")

Di navên hejmarên 11 – 19 de di desteya "yazde(h), diwazde(h), sêzde(h)..." de hejmara biçûktir li berî hejmara mezintir e (bo nimûne "çar-deh", ne "*deh-çar"). Lê di navên heman hejmaran de di desteya kurmanciya rojavayî "deh û yek, deh û du, deh û sê..." de dîsa hejmara mezintir berî hejmara biçûktir tê.

18.2. Peyvrêziya hejmaran di komikên navdêrî de

Di komikan anku frazan de hejmarên bingehîn adeten berî hemû endamên din yê komikê tên û bi ti ravekan (izafeyan, qertafan) bi wan ve nayên girêdan. Bo nimûne:

- du xanî
- du xaniyên kevn
- du xaniyên pir kevn
- du xaniyên pir kevn yê li nav bajarî

Eger navdêr di komikê de tine be lê cînavên xwedîtiyê hebin, hingê hejmar bi ravekê bi cînavî ve tê girêdan:

- duyên min (li cihê "du xaniyên min")
- yekî min (li şûna "yek xaniyê min" yan "xaniyekî min")

Hejmara "yek" bi piranî diçe dîv navdêran û pê ve tê girêdan û li pey konsonantan sivik dibe û wek "-ek" tê:

- mal-ek (li cihê "yek mal")
- mal-ek-ê (li şûna "yek mal-ê")

Hejmarên rêzî yên bi paşgirên "-em" û "-emîn" dikarin bikevin berî navdêran yan jî dîv wan. Eger berî navdêran bin, naçemin û ravekê nagirin. Lê eger piştî navdêran bên, navdêr bi ravekê bi wan ve tên girêdan:

- duyem(în) kes
- kesa/kesê duyem(în)

Hejmarên rêzî yên bi paşgirên "-a(n), -ê" tenê dikarin li dîv navdêran bên û bi ravekê bi wan ve tên girêdan. Ew nikarin bikevin pêşiya navdêran:

- mala çaran / çara / çarê (ne "*çaran mal, çara mal, çarê mal")

Ji hejmarên rêzî yên din yên bi wateya "yekem", hemû dikarin li dîv navdêran bên:

- kesa/ê ewil / ewilî / ewilîn
- kesa/ê pêşî / pêşîn / pêşiyê
- kesa/ê berahîkê

Peyva "pêşîn" û varyantên wê "pêşî, pêşiyê" nikarin bikevin pêşiya navdêran loma tiştêkî wek "*pêşîn kes" yan "*pêşî kes" şaş in. Herwiha "berahîkê, berahiyê" jî nikare li berî navdêran be.

Peyvên "ewil, ewilîn" – lê ne forma "ewilî" – dikarin herwiha bikevin berî navdêran jî:

- ewil(în) kes (= kesa/ê ewil / ewilî / ewilîn)